# ZIMANÊ KURDÎ

## NAVÎN
## 1

# AMADEKARÊN PIRTÛKÊ

## Qomisyona Ziman ya berê pirtûk amade kirîn

M. Şîrîn ÇETİN, M. Mazlûm TEKİN, Merwan YAMAN

Ji aliyê Qomîteya Ziman û Perwerdeya KCK'ê ve qomîsyonek teybet ji bo nûkirin û sererastkirina van pirtûkan hatiye damezrandin:

## Qomîsyona nûkirin û sererastkirina pirtûkan

Mazlum TEKİN, Mizgîn EGÎD, M. Şîrîn ÇETİN, Dijwar BOTAN, Kewzer KAÇAN

## *Redaksiyon:*

**Qomisyona nûkirin û sererastkirina pirtûkan**

Mazlûm TEKİN, Mizgîn EGÎD, M. Şîrîn ÇETİN, Dijwar BOTAN, Kewzer KAÇAN

## Mîzanpaj, rûpelsazî, sererastkirin û berhevkirina wêneyan

M. Bedredîn OY

M. Merwan YAMAN


*Çapa pêşîn: 1999*

*Çapa Nû: 2013*

**Ev pirtûk; ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

**Email: s.m.kurdi2014@gmail.com**





***“Zimanê me bingehê netewa me pêktîne, divê em biparêzîn û pêş bêxîn.”***

# NAVEROK

**BEŞA I.** .......... **9**

BÊHNDANA HAVÎNÊ .......... 10
ZIMANÊ DAYÎKÊ .......... 13
XWENDEKAR .......... 19
DEMOKRASÎ .......... 21
AY LÊ GULÊ .......... 26
KELHA FINIK .......... 31
ÇÛK Û PÎRÊ .......... 38
CÛDIYÊ MIRADA .......... 44
MIN ÇI DÎT Û ÇI NEDÎT .......... 48
DELAL Û XOŞEWÎSTÊN MIN! .......... 51
PENABERIYA DI ŞEVA TIRSNAK DE .......... 58
AWAZA MIN .......... 64

**TESTA 1.......... 66**

**BEŞA II** .......... **69**

EKOLOJIYA CIVAKÎ .......... 70
FERHAT Û ŞÎRÎN .......... 75
BEHLÛL .......... 80
ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ .......... 85
XABÛRÊ .......... 88
JÎNAMA RÊBER APO .......... 94
ÇAND .......... 99
KÊVROŞKA XAPÎNOK .......... 103
WELAT .......... 108
*MIJARA SETBEST .......... 111*
ZANIST Û TEKNOLOJÎ .......... 111
XANÊ DIMDIM .......... 113
ŞIVANIYA MIN .......... 118
NAME .......... 123
BIHAR .......... 128


**TESTA 2.......... 132**

**BEŞA III** .......... **135**

ŞANO .......... 136
NEWROZ .......... 142
*MIJARA SERBEST .......... 142*
GOLA QULINGA .......... 143
GIRÎNGIYA 4’Ê NÎSANÊ .......... 148
BÊRIYA BOTAN .......... 153
KELHA HEWLÊRÊ .......... 158
KÊVROŞK Û KÎSO .......... 163
JÎNAMEYA LEYLA QASIM .......... 167
BINIVE LOLO .......... 171
BÊHNDANA HAVÎNÊ .......... 176
AŞÛT .......... 182

QAZÎ MIHEMED ....187
AXÎN JI BO KURDISTANÊ ....192
PÊHESÎNA DAYÎKÊ ....195
DAPÎRA BELENGAZ ....199
DI CIVAKÊ DE ZAROK ....202
SITÎ Û FERXÎ ....204
**TESTA 3....206**

# BEŞA I.




# BÊHNDANA HAVÎNÊ

Di bêhndana havînê de em çûn gund, ji bo serdana mala xalê min. Mayîna me li wir, zorxweş û pir şadî bû. Çiyayên bejin bilind, asîmanê şînê zelal, darên spîndar, çinar û bîşengan; dilê me pir xweş dikirin. Mirov ji ava kaniyên wê yên zelal û bayê wê yê hênik têr nedibû.

Ew xaniyê biçûk yê xalê min tê de dijiya, ji ber xweza û rengîniya derdor, li ber çavê me dibû hêlîna aramî û tenahiyê. Bêhna me wisan tê de dihat, me nediviya bihêlin û bizivirin mala xwe.

Ji bo destpêkirina xwendinê, hîn heftiyek mabû. Em vegeriyan û me amedakiriyên çûyîna dibistanê dikir. Roja destpêkirina xwendinê, em spêdê zû ji xew rabûn û çûn dibistanê.

Carek din liv û tevger li kolanên me dest pêdikir. Xwendekarên kur û keç ber bi dibistanan ve diçûn. Dema em gihiştin dibistanê, me rojbaş li rêveberî û mamosteyên xwe da û wan jî sala me ya nû pîroz kirin. Paşê em birêz rawestiyan û me guh da gotara rêveberiya dibistanê ya li ser sala nû.



Dilê me hemûyan bi hev xweş bû, me tevan bêriya hev kiribûn, hemuyan daxwaza serkeftinê ji hev re dikirin. Me dixwest zû pirtûkên xwe yên nû bigirin, waneyan bibînin, guh li dengê mamosteyên xwe bibin û kêrhatinên xwe nîşa wan bikin.

## PEYV

**Rêveberî:** Kesên dibistanê rêve **dibin**
**Hênik:** Navîna serma û germahiyê
**Bêhndana havînê:** Betlane ya havînê

## PIRS

1- Te li ku bêhndana havînê derbaz kir?
2- Çima dema xwendekar vedigerin dibistanê, dilşad dibin?
3- Yekem roja xwendinê, xwendekar li dibistanê çi dikin?
4- Kengê xwendekar bêriya dibistanê dikin?

## ÇALEKIYÊN PEYVÎNÊ

Her yek ji we peyvîna rêvberiyê ya ku di roja vebûna dibistanê de kirî; bînin bîra xwe û ji hevalên xwe re bêjin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **Li gor we tişta netewê dike netew çi ye?**
- **Ger kesek dev ji zimanê xwe berde û bi zimanê biyanî ve xerîk bibe, wê çi encam derkeve holê?**
- **Gelo ji peyv yan jî rêzepeyvên hestekî, ramanekî, daxwazekê, nûçeyekê û bûyerekê têdigihînin re çi tê gotin?**

# ZIMANÊ DAYÎKÊ

Di pêşveçûna jiyan û kesayeta mirov de, cihekî pir girîng yê hînkariya bi zimanê dayîkê heye. Kesên di ziman de têr, bigiştî dikarin peywendiyên hîn bi tendirust ava bikin. Ev, di jiyanê de serketîne.




Fêrbûna zimanê dayîkê, fêrbûna zimanekê biyanî jî hêsan dike. Ziman endamekî herî bingehîn yê çanda gelan e. Gelên ku girîngiyê nadin ziman; nûbûnan di ziman de çênakin û perwerda xwe bi zimanê biyanî dibînin, nikarin ramaneke afrêner û binirx derbixin holê. Dûrketina ji zimanê dayîkê, dûrketina ji hemû nirxên çanda civakê ye. Perwerdeya bi zimanê biyanî her çiqas baş be jî, lê divê zimanê dayîkê nedin jibîrkirin. Ji ber ku girêdana bi zimanê biyanî ve, rêbazeke herî bi bandor ya dagirkirina gelan e. Di vê mijarê de bişaftina dewletên dagirker ya li ser Kurdistanê rastiyek dîroki ye.

Mixabin ji ber vê sedemê heya niha di nav Kurdan de perwerde û hînkariya bi zimanê dayîkê bi awayek rast û sazûmankirî pêşneketiye. Gelo îro li gel mirovên me, di derbarê hezkirina Kurdî û zanista ziman de baldariyek têr heye? Divê ev pirs baş bê hizirandin û nirxandin.

Hînkariya ziman, mejî û raman diguherîne û herwiha bi şêwe dike. Ziman bingehê avahîsaziya civakî dide çêkirin. Lê belê di sedsala dawî de her çiqas zimanê me hinek pêşketibe jî, ji aliyê şiyarî û zanista ziman ve kêmaniyên tên dîtin, ji bo pêşeroja zimanê Kurdî metirsiyek mezin û ji dil e.

Armanca bingehîn ya perwerdeya ziman, pêşxistina hûner, ragihandin û ramanên civakan e. Ziman di civakê de hem ragihandinê hem jî têgihiştinê dide çêkirin. Ji ber vê sedemê di sazûmaniya perwerdeya hemû welatan de, di serî de girîngiyek mezin didin perwerda bi zimanê dayîkê. Kesên ku di qonaxa pêşketinê de ne; bi awayekî pir baş hewl didin ku wan bi ziman fêr bikin. Ji ber ku ziman endamekî herî bingehîn yê çanda gelan e. Sazûmaniyeke herî bihêz ya ku mirovan nêzîkî hev dike ye.

Armanca bingehîn ya perwerdeya ziman; guhdarkirin, axaftin, xwendin, pêşxistin û qezençkirina hûnerê nivîsandinê ye.

## PEYV

**Hînkarî:** Hînbûn yan jî fêrbûn
**Tendirust:** Saxlemî
**Şêwe:** Awa
**Ast:** Pile
**Çand:** Hemû nirxên heyberî û rawanî
**Sazûmanî:** Rêkûpêkî
**Peywendî:** Têkîlî
**Zanist:** Zanîn
**Sûd:** Qezenc
**Şiyarî:** Baldarî, haydar

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Di gotara we xwendî de hinek tîp mezin, hinek biçûk hatine nivîsîn û hêmayên cûr be cûr hatine bikaranîn.

*Ji nivîsînên bi destûrên diyar yên zimanekî derbazî nivîsînê bûyî re,* ***nivîsîna rast*** *tê gotin.*

*Ji tevayî hêmayên bi armanca sererastkirina nivisînê tên karanîn re* ***hêmadanîn*** *tê gotin.*

*Ji karanîna peyvên di axaftinê de,* ***peyvîn*** *tê gotin.*

PIRS

1- Hebûna ziman bandoriyek çawa li hebûna civakê dike?
2- Zimanê me yê dayîkê çi ye?
3- Nivîskar çima girîngî daye fêrbûna zimanê dayîkê?
4- Ger ziman nebe; çand, dîrok û hûner ji nifşekê derbazî nifşeke din dibe? Vekin.

## CÛR Û AWÊN

Nivîsîna bi navê “Zimanê Dayîkê” ji ber ku ji bend û hevokan pêkhatiye pexşan e.

*Agahî dayîna di mijarekê de, alîkarîkirina nêrînekê yan jî nivîsînê bi armanca daxuyaniyekî hatine nivîsandin re* ***gotar*** *tê gotin.*

Gotar ji sê beşan pêktê; “destpêk, naverok û encam”

Ji cûre nivîsînên li ser hizir hatine nivîsîn ya herî girîng gotar e.

Di gotarê de ramana bingehîn, hizrekî bi xwendekaran dayîna pejirandin e. Ji ber vê sedemê pêwîst e gotar bawerker be. Ji bo ku bê bawerkirin riya yekane têgihandina rast, xwerû û bê xaze ye.

## RÊZIMAN

Hevokên hezkirinê diyar dikin, **hestekê**
Yên têgihandinekî xweş têdigihînin, **ramanekî**
Yên xwestekekê radigihînin, **xwestekekê**
Yên bûyerekê radigihînin jî **nûçeyekê** diyar dikin.

Weke di mijarê de jî tê dîtin, ji peyv yan jî rêze peyvên hest, raman, daxwaz, nûçe û bûyerekê têdigihînin re **hevok** tê gotin.

Hevok bi tîpa mezin dest pê dike û bi hêmayekê li gor wateya wê bi dawî dibe.

Ji vê mijarê, hûn jî hin peyv hilbijêrin û li lênûsa xwe binivîsin.

Dema em temaşeyî mijarê dikin, dibînin ku peyva “Kurd” her çiqas ne di destpêka hevokê de ye jî, bi tîpa mezin hatiye destpêkirin.

Ji pêla bayê ya kû di guh de, bi riya recifînê, bihîstinê çêdîke re deng tê gotîn. ji awênên dengan nîşa dikin re **tîp** tê gotin.

| | |
|---|---|
| Ez hatim dibistanê. | Hevok |
| hatim | **Peyv** |
| im | **kite** |
| m | **tîp** |

Di hevoka pêşdariyê de çend tîp hene?

Di zimanê me de **31** dengên bi kêrî axaftinê tên hene. Ji van **8** dengdêr û **23** dengdarin.

Rewşa tîpên dengdêr di aliyê rast û girovir, dirêj û kurtiyê de.

Tîpên dengdêr yên di pêşdariya jor de cih digirin bînin ziman.

| Rast | | Girovir | |
|---|---|---|---|
| Dirêj | **Kurt** | **Dirêj** | **Kurt** |
| A | **I** | **O** | **U** |
| Î | **E** | **Û** | |
| Ê | | | |

## HÎNDARÎ

Li ser mijarekê diyar gotarekê binivîsin û piştre vê gotara xwe li pêşberî xwendekaran bixwînin.


**1-** We ji mijara “zimanê Dayîkê” hes kir? Çima?

**2-** Hûn dikarin li ser mijarekî jê ne agahdar nirxandinekê bikin? Ger hûn nikarin çima?

**PÊKANÎN**

Bi Riya Çavnêriyê Têgihiştin

Li ser heyînên di wêneyên jêr de heyî hevokan saz bikin. Van hevokan li lênûsa xwe binivîsin. Di nav van hevokan de kîjan peyv navê taybet e, kîjan peyv navê giştiye diyar bikin.



# XWENDEKAR

Bo nîştiman awatim
Xunçe gulî wulatim

Newey duwa rojî hozim
Weku Newroz pîrozim

Têdekoşim bê wuçan
Bo serbestî nîştiman

Amancim diyar û rûne
Hewlim bo lûtke çûne

Mandû nabim çalakim
Jîr û xawên û pakin



## PEYV

**Awat:** Hîvî
**Xunçe:** Bişkuj
**Newe:** Nevî
**Duwaroj:** Pêşeroj
**Hoz:** Êl, eşîr
**Lûtke:** Gupik

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- Li gorî we demokrasî tê çi wateyê?
- Gelo her tişta li gor keyfa we dibe demokrasî?
- Ji bo hûn mafê xwe yê mirovî bi dest bixin, hûn çi dihizirin?



# DEMOKRASÎ

Demokrasî peyvek Yuyanî ye. **Demos,** tê wateya gel, **krasî** jî tê wateya rêveberiyê. Dema ev herdu peyv tên gel hev, dibe demokrasî. Ev jî tê wateya xwe bi xwe rêveberina civakê. Têgihîna demokrasiyê ji aliyê serdest, dewlet û bi giştî zihniyeta şaristaniyê ve hatiye berevajî kirin. Ji bo vê, mirov dikare demokrasiyê bi dû awayan; 'fireh' û 'teng' bide diyarkirin.

Belê; bi awayê fireh, di dîrokê de xwerêveberina civakên ku sazûmaniya dewlet û desthilatdariyê nas nekirine, dide nasîn. Bi awayekî xwezayî xwerêvebirina qlan, qabîle û eşîretan di vî beşî de cih digirin. Ji vî awayê xwe rêveberinê re demokrasiya rasterast tê gotin. Demokrasî bi awayê teng, di nav wan civakên diyardeya dewlet û desthilatdariyê zêde û diyardeya demokrasiyê kêm de tê dîtin. Di van civakan de xwe rêveberiyên ji derveyî rêveberiyên dewlet û desthilatdariyê dimînin, dikevin vê çerçoveyê.

Lê belê; çiqas dewlet û desthilatdarî zêde be, ew qas demokrasî kêm dibe, çiqas demokrasî zêde be ew qas dewlet û desthilatdarî kêm dibe.



Demokrasî; Xwe dispêre nirxên civaka xwezayî. Pergala Şaristaniya Demokratîk, Civaka exlaqî û politîke. Dijberî civaka girtî, civaka vekirî û sade ye. Civaka herî azad, civaka xwe bi xwe rêvedibe ye. Wekhevî û hevsengiya di navbera kes û civakê, jin û zilam de diparêze. Di nav cudahiyên civakan de rêgeza yêkîtiyê bingeh digire. Li şûna huquqê, xwe dispêre rêgezên exlaqî yên civakê. Raste rast xwe rêveberin û azadiya civak û kesan e. Yanî bi awayekî giştî hemû nirxên mirovahiyê digire nava xwe.

Erê, mirov dikare endamên civaka demokratîk, bi vî awayî bide diyarkirin: Klan, malbat (ger bê demokratîk kirin), qabîle, eşîret, qewm û netew in. Endamên gund û bajar, endamên zîhniyet û aborî, endamên siyaseta demokratîk û parastina cewherî dikevin vî beşî.

Demokrasî; ji bo çareserkirina hemû pirsgirêkên civakî yên ji dîrokê ta roja me, rêbaza herî baş e. Pergala demokrasî, pergala hemdem e.

## PEYV

**Demokrasî:** Rêvebirina civakî ye.
**Zihniyet:** Kombûna hizir û raman.
**Exlaq:** Sinc,hoy
**Desthilatdarî:** Hûkûmdarî
**Pergal:** Sîstem

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Di zimanê Kurdî de, dema tîpên dengdêrên dengdirêj “**î**, **ê**, dikevin pêşiya tîpa siwar "**y**" yê cihê xwe ji tîpa "**i**" re dihêlin. Her wiha dema tîpa "**û**,  " dikeve pêşiya tîpa siwar "**w**" yê cihê xwe ji tîpa "**u**" yê re dihêle.

## PIRS

1- Li gor mijarê çi taybetmendiyên demokrasiyê hene?
2- Cudahiya di navbera demokrasiya teng û demokrasiya fireh de çi ye?
3- Demokrasî xwe dispêre çi?

## CÛR Û AWÊN

Di mijara we xwendî de, dema nivîskar di derbarê demokrasiyê de zanînan dide, ji xwendekarên xwe re weke bi axive vedike.

Em ji van cûrenivîsînan re dibêjîn **nivîsînên civatî.** Nivîskar di nivîsîna civatî de bêyî bikeve nav kûrahiya dîtin û ramanên xwe, bêy kû xwendekaran bêzar bike, dîtin û ramanên xwe vedike

## RÊZIMAN

Di zimanê Kurdî de ji tîpên **“ç, k, p, r, t”** re dibêjin tîpên cêwî.

Ji ber, her yek ji van tîpan bi dû dengan tên xwendin. Di aliyê wateyê de guhartina dengên wan bandorê li ser wateya peyvê dike. Dema dengê peyvan têguhertin, bi wan re wateya wan jî têguhartin.

**Mînak:**

| **Nerm** | **Hişk** |
|---|---|
| **Çala avê kur e.** | **Ç**alekiyên hevalan baş in. |
| **Keriyê pez boş e.** | **K**arxane vedibin. |
| **Pîvaz tûj in.** | **P**ira Mala Badê kevnar e. |
| **Tûrê me rengîn e.** | **R**ovî di deştê de **r**evî. |
| **Tiriyê teyfî ciwan e.** | **T**iliyên gewrê zirav in. |

## HÎNDARÎ

Di welatê me de mafê mirov nayê dayîn, gelê me ji tevayî mafan bê par tê hiştin.

Ji bo em bikarin di pêşerojê de mafê xwe bi dest bixin, pêwîste çibikin?

## NIRXANDIN

Bûyerekê we çavnêr kirî û jê bandorbûyîn, têbigihînin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- ❖ **Mijara bi navê "demokrasî" civatî ye. Ji ber ku nivîskar nêrîna xwe ya kesî, ji hundir bê ku bikeve nav vekirinekî, bi têgihandinekî xwezayî, her wekî bi xwendekarê xwe re gotûbêj dike, aniye ziman.**
- ❖ **Hûn helbesta li jêr bixwînin, gelo xwendina vê helbestê bandorek çawa li hestê we dike?**

# AY LÊ GULÊ

Ay lê Gulê Gula minê
Şîrîna l' ber dilê minê
Gulê nadim b' malê dinê
Li ser Gulê têm kuştinê

Zordar dibê ez Gul nadim
Ezê zend û bendan badim
Ezê li kelh û seradim
Azad be b' şoreşa minê

Gulê kesk û sor  û zer e
Nîşana alê li ser e
Êdî reng spî û gewher e
Şîrîn û peymana minê

Xudê ez pismamê te me
Bi sond pesindarê te me
Ser ceng û hewarê te me
Qelenê te  j' xwîna minê

Rengê te yê pir delalî
Bibil li ser te dinalî
Te nebînim bi vî halî
Armanc û kedera minê

Ay lê Gulê Gula minê
Şîrîna l' ber dilê minê
Gulê nadim b' malê dinê
Li ser Gulê têm kuştinê

***Gotin: Omerê Leilê***
***Stran:Mihemed Şêxo***





## PEYV

**Gewher:** Cewher
**Qelen:** Next
**Peyman:** Hevhatina li ser bûyerekê
**Keder:** Êş û xem
**Zend û bend:** Çeng û Bask
**Ceng:** Şerên giran

## EM HOZANÊ XWE NAS BIKIN

Mihemed Şêxo di sala 1948’an de li Qamişloyê ji dayîk bûye. Xwendina xwe ya seretayî li wê derê temam dike. Di navbera salên 1962-1972’an de ji bo xebatên hûnerî li Lubnanê dimîne. Di vê derê de bi dengê xwe yê zelal navdar dibe. Li sala 1973’an derbazî Başûr dibe û xebatên xwe li wê derê didomîne. Piştî têkçûna şerê Başûr, derbazî Rojhilatê Kurdistanê dibe û di sala 1983’an de dizivire Qamişlo.

Mihemed Şêxo li sala 1989'ê li Qamîşlo çûye ber dilovaniya Yezdan.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Li navên taybet yên di mijarê de hişyar bin. **“Gulê”** weke di vê mijarê de hatiye nivîsandin navê taybet e. Ji ber vê bi tîpa mezin hatiye destpêkirin.

## PIRS

1- Mihemed Şêxo kîjan salê ji dayîk bûye?
2- Dengbêj bingehê xebatên xwe yên muzikê di navbera kîjan salan de û li kû birêvebiriye?
3- Dengbêj di helbestê de “Gulê” ji bo çi kiriye sembol?
4- Di rêzika “li ser Gulê têm kuştinê” de çima dengbêj xwe ji bo “Gulê” dide kuştin?

## CÛR Û AWÊN

Mijara me li jor dayî diyarkirin, ji ber ku ji malik û rêzikan pêktê nivîsînek hûnandî ye.

*Ji cûre nivîsînên hûnandî yên ku hestekî bi me didin şiyarkirin û ji pîvana kite û wekheviya kafiyan pêkhatî re* ***helbest*** *tê gotin.*

## RÊZIMAN

Lêkolîn bikin ka di peyvên “***kesk, pir***” *de* tîpên cêwî hene yan na? Vekin.

Valehiyên li jêr dagirin.

Li ser Gulê têm ...............
Zordar dibê ez Gul ...........
Ezê zend û bendan ..........

Van cûre peyvên hûn di valehiyê de bikartînin bêxin kite.

Tîpên dengdêr ji peyvên li jêr derbixin. Hûn dikarin yên mayî bixwînin?

Dîcle, wêne, Feqê Teyran

Tîpên dengdar; ew tîp in ku bêyî tîpên dengdêr nikarin deng derbixin.

Di rêzimanê me de **23** tîpên dengdar hene. Di rêzimanê me de **8** tîpên dengdêr hene.

**HÎNDARÎ**

Li ser mijara li jor şiyar bin. Hûn jî hewl bidin helbestekê binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **Mijara derbazbûyî "Aylê Gulê" ji ber bi hevsengiya kite û kafiyan hatiye sazkirin hûnandî ye.**
- **Hûnê mijara li jêr bixwînin û li ser bihizirin da ku hûn jî mijarekê bi vî awayî binivîsin.**

## KELHA FINIK



Kelha Finikê, bermayekî dîrokî yê Kurdistanê ye. Li pêşiya wê Dîcle, li pişta wê çiyayên bilind, serê xwe bi ser Dicle de xul dikin. Dengê av, kew, şalûl û bilbilan, rengê xwezayê ya ji darên fêkî, bedewiya Kelha Finikê zêdetir dike.

Dema mirov ji cihê Mem û Zînê, ji Cizîra Botan li ser pirê re ber bi Şirnex ve derdikeve rê digihîje Qesirika Gelî. Li milê çepê dizivire di nav Dîcle û Çiyayê Dêran re dikeve rê, li ber keva rê bermayê Berqertalê ya ji Kurdan re paytextî kiriye tê dîtin. Ji wir jî dibore, dikeve binê Dêran, dema tu li ser xwe re li Dêran dinêrî, di rewşa wê de mirov dikare qirkirina Xiristiyanan bi awên bike.

Lê rêwîtî dewam dike, piştî çend hurdeyan, dikevin nav dehlan, ji nav dehlan derdikevin ser Kelha Finik. Dema tu li ser kelhê dirûnî, li jora xwe li cihê Egîdan, Gabarê temaşe dikî, li jêra te Dîcle wêneyê Feqê Teyran dema helbesta xwe ya bi navê “**Hey Av Û Av**” dibêjê tê berçavê te. Li rexê te cihê lêdana mencenîqan li ser Tehta Şayîk, berxwedaniya vê kelhê radixe berçavan. Li hemberî te, dîtina Xendekê, êrîşên neyaran yên li ser vê kelha pîroz rave dike. Li ser Dîcle hatina kelekan jî rengê bazirganiya kevnar, ji me re şîrove dike. Li milê rastê li ser serê Binerdê, zilamekî rûniştî peyîzoka bi navê Seydiko dibêje; peyîzoka wî wêneyê Melayê Cizîrî dema helbesta xwe ya li ser vê kelhê gotî ya bi navê "**Ey Mela Namê Te Ye Xemse Eşer”** dibêjê tîne bîra me.

Dema tu li nav kelhê digerî, li bermayiyê wê temaşe dikî, awayê rêvebirina Kurdan dikarî baş têbigihîjî.

## PEYV

**Xûl:** Tewandin, çemandin
**Dehl:** Cihê bi dar û av
**Mencenîq:** Amûrek ya şer e
**Kelek:** Amûrek ji eyar(meşk) û daran pêkhatî û li ser avê tê bikaranîn
**Berqertal:** Gundekê kevnar yê Kurdistanê ye

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**1-** Balê bikişînin li ser hêmaya bêhnokê yên di mijarê de hatine bikaranîn.

Weke di mijarê de jî tê dîtin hêmaya ji bo bêhndaneke kurt tê bi karanîn jê re **bêhnok** tê gotin.

Di mijara jêr de bêhnokên pêwîst bikarbînin.

*Li pêşiya wê Dîcle li pişta wê çiyayên bilind serê xwe bi ser Dîcle de xûl dikin dengê av kew şalûl û bilbilan rengê xwezayê ya ji darên fêkî bedewiya Kelha Finikê zêdetir dike.*

**2-** Peyvên li jêr di nava hevokê de bikarbînin.

**Mînak:**

Kev, Dîcle, Gabar, Pir

## PIRS

1- Çima nivîskar dibêje Melayê Cizirî tê bîra min?
2- Çi dihêli ku em bizanibin êrişên neyaran çawa pêkhatine?
3- Hatina Kelekan hesteke çawa bi me re çêdike?

## CÛR Û AWÊN

Dema em temaşeyî mijara jor dikin, dibînin ku nivîskar agahiyên ji cihê geryayî û pêhesên xwe bi awayekî balkêş şîrove dike.

*Ji wan cûre nivîsînên cihê geryayî û dîtî, agahiyên komkirî, tiştê pêhesiyayî, radigihînê re* ***geryaname*** *tê gotin.*

**Nivîskarê hosta**, agahî û hestên di derbarê cihê geryayî û dîtî de, bi zimanekî balkêş têdigihîne.

## RÊZIMAN

**Peyv li gor destûrên wate kirinê wiha rêz dibin:**

**a-** Peyvên hevwate
**b-** Peyvên dijwate
**c-** Peyvên hevdeng
**d-** Peyvên hevtîp

### a- Peyvên hevwate:

Peyvên di nivîsandinê de ji hev cûda; lê di watekirinê de wekhev û li cihê hevdû tên bikaranîn re **peyvên hevwate** tê gotin.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| **Mijar** | **babet** |
| **Ber** | **Kevir** |
| **Mêjû** | **Dîrok** |
| **Sot** | **şewitî** |

**b- Peyvên dijwate (dijber)**

Ew peyvên ku di watekirinê de dijberî hev yan jî berevajî hevin ji wan re **peyvên dijwate** tê gotin.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| **Teng** | **Fireh** |
| **Stûr** | **Zirav** |
| **Reş** | **Spî** |
| **Tirsonek** | **Wêrek** |

**c- Peyvên hevdeng:**

Ew peyvên ku xwendin û nivîsandina wan wek hev; li gor ferhengê yek di wateya yekemîn de hatiye bikaranîn ya din jî di wateya dûwemîn de hatiye bikaranîn ji peyvên wiha re **peyvên hevdeng** tê gotin.

**Mînak:**

Azad **bîr** kola.
**Bîr**ên wî hevalî pir kûr bûn.
**Teng**a hespê me pir **teng** hatibû girêdan.
**Gur**ên xanî pir stûr bûn.
**Gur** lawirek pir bihêz e.
**Ger** pir xweş e.
**Ger**a avê pir kûr bû.

| | |
|---|---|
| **Bîr** | **Bîr** |
| **Teng** | **Teng** |
| **Gur** | **Gur** |
| **Ger** | **Ger** |

**d- Peyvên hevtîp:**

Peyvên hevtîp di zimanê Kurdî de ji tîpên cêwî çêdibin. Peyvên hevtîp di watekirin û xwendinê de ji hev cûda; lê ji heman tîpan pêktên re **peyvên hevtîp** tên gotin.

**Mînak:**
**Ker:** Lawirek e.
**Ker:** Kesên ku dengan nabihîzin.
**Ta:** Bilinbûna germahiya laş.
**Ta:** Dezî
**Çal:** Kurahî
**Çal:** Kesê beş (bizinên reşên navçav spî)
**Par:** Sala derbazbûyî
**Par:** Behr,
**Gir:** Cihekî jiderdorê xwe bilindtir.
**Gir:** Curekî nexweşiyê

| | |
|---|---|
| **Ker** | **Ker** |
| **Ta** | **Ta** |
| **Çal** | **Çal** |
| **Par** | **Par** |
| **Gir** | **Gir** |

**Peyv li gorî çêbûna xwe dibin sê beş:**
**1-** Peyva xwerû
**2-** Peyva tûredayî (darişţî)
**3-** Peyva hevgirtî
**1- Peyvên xwerû:**

Ew peyvên bêy ku wateya wan xirab bibe nayên kurtkirin û tenê wateyekê pêşwazî dikin re **peyvên xwerû** tên gotin.

**Mînak:**
Çû, dar, ber, mar, ma, ket û hwd.

**2- Peyvêntûredayî (darişţî):**

Ew peyvn xwerû yên ku pêvekên sazker digirin, li ser bingehê peyva xwerû wateyek nû didin peyvê jê re **peyvên tûredayî** tên gotin.

**Mînak:**

| Pêveka sazker | Peyva xwerû | Pêveka sazker | Peyva t |
|---|---|---|---|
| **Hil** | **ket** | | **Hilket** |
| | **gul** | **dank** | **Guldank** |
| **Ra** | **xist** | | **Raxist** |

**3- Peyvên hevgirtî**

Ew peyvên ku ji dû peyvên serbixwe pêktên û ji bo wateyekê tên bikaranîn jê re **peyvên hevgirtî** tên gotin.

**Mînak:**

| Peyva Yekem | Peyva Duwem | Peyva Hevgirtî |
|---|---|---|
| **Dil** | **şad** | **Dilşad** |
| **Rû** | **ken** | **Rûken** |
| **Welat** | **perwer** | **Welatperwer** |

**HÎNDARÎ**

Tevayî beşên darişţinan; ji "destpêk, naverok û encamê" pêktên.

Di darişţinan de rastnivîsîn li ber çavan tê girtin. Sergotara darişţinê bi awayekî bi mijarê re lihevhatî tê dayîn.

Benda herî biçûk di darişţinê de encam e. Benda herî mezin jî naveroke.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **Mijara me ya binavê "Çûk û Pîrê" ya bûyer û hebûna awarte têdigihîne, mînakek ya cûrê çîrokê ye.**
- **Çîrok bi bûyer û hebûnên awarte bi cih û demê nediyar ji serpêhatiyan cûda dibe.**
- **Hûn fêr bûbûn ku bêhnok; peyv yan birepeyvan ji hevdu cûda dikin.**
- **Gelo cotxal li kûderê tê bikaranîn?**

# ÇÛK Û PÎRÊ

Pîrek bejin kin, mîna cina, kitan li serê wê û pêşmala nan li ber bû. Hevîrê xwe tev kiribû girik û di binê teşta xwe de rast kiri bû. Piştre çû deştê dar anîn, çiqas dixist tenûrê, kir û nekir tenûra wê neşara, heya hin darên din danî yên din dibûn xwelî. Çûka beytik hat, li Pîrê ma şaş! Bi dengê xwe, daxwaza xwe anî ziman: “Pîrê! Temaşeyî lingê min bike, stiriyek têde heye, derbêxe û bixe tenûra xwe, tenûra te wê pê bişare û wê nanê te xweş çêbibe.” Pîrê bawer nekir lê dîsa stiriyê lingê wê derxist û avêt tenûrê. Agirê tenûrê gûr bû. Pîrê şaş ma! Çûk jî dilşad bû. Çûkê perê xwe li hev dida, daxwaza stiriyê xwe dikir.

Got: “Nirxê stiriyê min heft nan in, ger tu nedî, ezê te bikujim yan tu wê min bikujî.” Pîrê neçar ma, heft nan danê. Wê nanên xwe girtin û çû. Piştî demekê çûk rastî şivanekî hat, silav lê kir, rûnişt, pêre axivî û got: “Tu çima şîr bê nan vedixwî”?

Şivan: “Ji ber ku nanê min nîne û ez birçîme.”

Çûkê: “Fermo eve nan, weke camêran nan û şîrê xwe bixwe.”

Dema şivan nan û şîrê xwe xwar, ji çûkê re spasî kir. Çûk xeyîdî, tengbû, çavê wê lehîstin û got: “Te heft nanê min xwarin, nirxê nanên min heft berx in, ger tu nedî; ez li cîhanê pir digerim; ezê ji her kesî re bêjim, şivan danî min û nanên min ji min stand. Ezê nanê te li cîhanê reş bikim û qewlê te betal bikim.”

Şivan pir jê tirsiya heft berx danê, çûkê berxê xwe birin û çû. Piştî demekî giha gundekî gurm gurma diholê û dengê zirnê jî tê. Govenda kurê keyayê gund bû. Gundiyan ji bo xwarina xêliya mirîşk serjê dikirin. Çûkê silav kir û mafê axaftinê ji wan xwest: “Çima hûn mirîşkan ji bo xwarina xêlî serjêdikin? Goştê wan hindike, fermo berxên min serjê bikin.” Wan bê ku daxwaza wê jê bipirsin, berx serjêkirin û xwarin. Piştî şahiyê her kes çû mala xwe, çûk girî, çû cem keya û got: “Ezê herim ka nirxê berxên min.”

Keya got: “Nirxê çi? Me berxên te gurandin û xwarin, ji nû ve ji zikê me dernakevin û najîn.” Çûkê dest bi zirta kir. Binêrin! Ezê herim cem şêrê kevnar, ezê giliyê xwe li wir bikim û dilê we bêşînim. Gundî tirsiyan û li çareseriyê geriyan. Kir û nekirin çûkê ji derveyî bûkê tiştek din nepejirand. Çûkê bûk ji gundiyan stand, bir û çû. Çû di nav giyayek şîn de, dît ku xortek çeltikê wî li milê wî li ser kevirekî rûniştiye û li bilûrê dide. Çûk çû silav kir li ser bilûrvanî û got: “Were emê bûk û bilûrê bi hev biguherin.”

Çûkê bûka xwe da bilûrvan û bilûrvan jî bilûra xwe da çûkê. Çûkê bilûr girt û firî, piştî demekî westiya û bilûr ji devê wê ket û şkest. Çûk jî zivirî li cem bilûrvan, xwest weke rewşa nan bîne serê bilûrvan, got: “Bilûrvan ev bilûr xirabûye, kêr min nayê, ka bûka min bide min.” Xortê bilûrvan rahişt du beran danî çûkê, çûk ji tirsa ji wê derê dûr ket. Ji ber ku xortê bilûrvan li berxweda bû xwediyê bûkê.

Çîroka min ji we re xweş
Dendikê zebeşê we reş.



## PEYV

**Girik:** Dema hevîr ji bo bikin nan ji hevdû cûda dikin û girover dikin.
**Bilûr:** Amûrek ya mûzikê ye.
**Stirî: kelem.** Dara bi sîx

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Di hevoka li jêr de dibînin ku cotxal hatiye bikaranîn.

Keya got: "Nirxê çi? Me berxên te gurandin û xwarin, ji nû ve ji zikê me dernakevin û najîn."

**a-** Dema tu dabaşa kesekê dikî û bixwazî gotinên wê weke heyî bikarbînî, beriya axaftinên wê cotxal tê bikaranîn.

**b-** Dema tu dabaşa heyînan bikî, piştre bixwazî van heyînan yek bi yek vekî, cotxal tê bikaranîn.

**Mînak:**

Mamosteyên me: Egîd, Hogir û Sosin.

Ziman: Saziyek ya civakî ye.

Piştî cotxalê ger hevok be bi tîpa mezin tê destpêkirin, ger ne hevok be bi tîpa biçûk tê destpêkirin.

## PIRS

1- Çûkê çi da Pîrê û çi ji Pîrê stand?
2- Çûkê çi ji nan kir?
3- Dema gundiyan mirîşk serjê dikirin çûkê çi da wan?
4- Bilûrvan çawa bû xwediyê bûkê?

## CÛR Û AWÊN

Di serpêhatiyê de cih û dem diyar in, di çîrokê de cih û dem nediyar in. Di vê çîrokê de tiştên awarte yên weke axaftina çûk û pêkanîna daxwaza wê peyda dibin. Li gel van xalên derbazbûyî, taybetiyên ziman û têgihandinê yên ku çîrokan ji cûrên din cûda dikin, evin:

- Di çîrokê de bûyer pir in.
- Di çîrokê de cih nayên diyarkirin, dem zû derbaz dibe.
- Di çîrokê de bûyerên çêdibin awarte ne.

## RÊZIMAN

Peyv li gor karanîna xwe dibe sê beş:
**1-** Peyva dibe nav
**2-** Peyva dibe kar
**3-** Peyva dibe alav

**1- Peyva dibe nav:**

Nav peyva ku heyînekê bi me dide nasîn e.

Ji derveyî peyva dibin kar û alav, tevayî peyvên din di-kevin vê beşê.

**Mînak:**
Mêze, pênûs, îro, sor û hwd

**2- Peyva dibe kar:**

Kar, ew peyv in ku kirina karekî, tevgerekî, bûyerekî bi me dide nasîn û demê bûyeran didin diyarkirin.

**Mînak:**
**Çûn, dihat, xwaribû, birin, vexwarin**

**3- Peyva dibe alav:**

Ew peyvên ku bê wate lê di nav hevokê de dibin xwedî wate, em dibêjin alav.

**Mînak:** Me <u>**di**</u> dibistanê <u>**de**</u> pirtûk xwend.
<u>**Ax**</u>**!** We dît.

## HÎNDARÎ

Çîroka derbazbûyî ji destpêkê ta dawî bi hizirînek kûr binivîsin.

Piştî çîrok bi dawî bû, sergotarek din di cihê ya heyî de bikar bînîn û ji hevalê xwe re bixwînin.

- Hûn jî çîrokekî binivîsin.

## NIRXANDIN

Di çîroka derbazbûyî de dibêjin:

"Ji ber ku xortê bilûrvan li berxweda, bû xwediyê bûkê."

Di çîrokê de ji ber gundiyan berx gurandin û xwarin. (sedem), çûkê bûka wan ji wan stand û bir. (encam)

Bûyerên din yên di çîrokê de derbazbûyî li gor mînaka li jor têkîliyên sedem û encamê binirxînin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **Mijara we beriya niha xwendî ji ber tê de rewşên awarte yên nayên bawerkirin hene çîroke.**
- **Gelo cûdabûna efsaneyê ji çîrokê çiye?**

# CÛDIYÊ MIRADA

Dibêjin di demekê de li Cîhanê yan li Rojhilata Navîn tofanek rabûye. Vê tofanê ji gundê Daderê ji tenûrekê avek reş derdikeve av ji rewşa lehî û robaran derbaz dibe. Li her derê erdê re av tavêje, ji esmanan jî bi heman rengî tê xwarê. Tevayî dar, ber û çiyan têxi bin xwe û her tiştê heyî wêran dike.

Lewra tofan dirabe her tişt dibin avê de dimîne. Lê kesek bi navê Nuh, Pêxemberê Gotiya ji beriya tofan rabe, amedekariyên xwe kiriye. Ji bo xwe û kesên bawerî pê heyî keştiyekê çêkiriye. Kesê bawerî pê anîn û ji hemû cûrên lawiran yek nêr, yek mê li keştiya xwe siwar kiriye. Ev keştî bi rojan li ser avê geriyaye. Ta her giyandarekî di bejahiyê de jiyan dikin, jiyana xwe ji dest didin, heya serê çiyan xuya dikin, keştî nêzîkî gelek çiyan dibe, lê baweriya xwe pê naynin. Hindek dibêjin ev navên çiyayên efsanewî; Bêxêr, Nizmû, Zêrînger û Cûdî di wî demî de hatine lêkirin. Demê dixwaze biçe li ser çiyayê Bêxêr, av rê nadi, ew ji xwe baş diyar nake. Jêre dibêje Bêxêr, navî wî dibe Bêxêr. Dixwazi biçe li ser Nizmû, Nizmû xwe nizm dike. Ji wî re jî dibêje hey Nizmû. Dixwazi biçe li ser Zêrînger, Zêrînger xwe bilind diyar dike. Lê gelek asêye, ji wî re jî dibêje bi Yezdan! Tû çiyayekî Zêrînî lê cih û warê min li ser te nîne. Ji wê rojê û pêde navê wî jî bûye Zêrînger. Di encam de tê, li ser çiyayê Cûdî diraweste û kesên tê de tên xwar, gundê bi navê Heştan ava dikin û Cîhan ji wê derê zêde dibe. Ji wê rojê ve dibe ziyaretgeha gelan.





## PEYV

**Tofan:** Lêhiya mezin, karesata bi avê çêdibe.
**Qub:** Avahiyên biçûk yên li ser goran tên çêkirin.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Bala xwe bidinê ka di demê xwendinê de hêmayên di mijarê de hatine karanîn, hêsanbûnekê çawa didin çêkirin?

## PIRS

1- Bûyera Tofanê li kuderê despêdike?
2- Nuh kiye?
3- Di Tofanê de Nuh çi dike?

## CÛR Û AWÊN

Ev nivîsîna me xwendî, efsaneyekê têdigihîne.

**Efsane**; bûyer û çalakiyên awarte, yên ji demê kevin heya niha qala wan tê kirin, dike mijara xwe. Taybetmendiya wê ya serekî, weke rastî çêbûyî tê pejirandin.

## RÊZIMAN

**Peyvên dibin navdêr, dibin çar beş:**

**1-** Nav
**2-** Cînav
**3-** Hevalnav
**4-** Hevalkar

**1- Nav:**

Ji peyvên ku heyinekê bi me didin nasîn re nav tê gotin.

Nav li gor heyîna xwe dibin dû beş:

**a-** Navê taybet
**b-** Navê Giştî

**a-** Ji navên ku heyînekê tenê bi me didin naskirin re, **navên taybet** tê gotin.

**Mînak:**

Egîd, Kurdistan, Çirav, Bedirxanî û hwd.

**b-** Ji navên ji heman nifşan heyînan didin naskirin re, **navên giştî** tê gotin.

**Mînak:**

Çiya, kevir, dibistan, pênûs, dar, bizin û hwd.

## HÎNDARÎ


Mirovên li derdora we yên ji efsaneyan hez dikin, hûn çawa dibînin?

Plana bûyerekê we çavnêr kirî û hûn jê bandor bûyîn, binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **Mijara derbazbûyî ji ber bi peyv û hevokên serbest hatiye nivîsîn pexşan e.**
- **Gelo hûn çi cudahiyê di navbera hûnandî û pexşanê de dibînin?**
- **Çima ji cînavan re dibêjin cînav?**

# MIN ÇI DÎT Û ÇI NEDÎT



Min çi dît û çi nedît, di vî emrê xwe yê kin.
Eskerê qehr û xeman, her dem hucûmate li min.
Ger belak winda bibe, nav alemê  lê bigerin.
Bila bên cem vî feqîrî, raste rê serve dibin.
Çi ku ez kelha belam e, sed hezar hemd û sena,
Ji Xudê re ku quwet daye, li nik min cih dibin.
Em ketine wextekê xêr û xweşî bûye xela,
Lew xilasî bi silamet, tê de zor e pir çetîn.
Derheqa ehlê zemîn, gotiye Şêxê Cizerî;
Xalibê ehlê zemanî ma mela ademiyin.
Emniyet nîne, li ser dostaniya ehlê zemîn.
Pir ecîb bû pir xerîb e, rêz û risma ew dikin.
Îro dost in ew ji hev re, tû dibêjî canfida.
Roja paşî tu dinêrî, erz û hala lev diden.
Tu dinêrî ew kesê, muteber û nav û bideng,
Xatirê qevdek ji pûşê bê kemal, hev dikujin.
Tên nik şêx û melayan, koya ku ew silhê bikin,
Halbûkî kengê bi ya şêx û melayên xwe, dikin.
Tecrûbe gelekî me kir, her me dîtiye wuha.
Lê belê paşahiyê re, gelekî pûşman dibin

***Seyîd Elî yê Findikî***



## PEYV

**Hemd û sena:** Meznahî û paqijî
**Xela:** Bêxwarînî
**Çetîn:** Zor
**Pûş:** Giyayê hişkbûyî
**Bê kemal:** Bê biha
**Muteber:** Rêzdar
**Erz û hala:** Daxwazname
**Emniyet:** Bawarî
**Ademiyin:** Mirov in
**Xalib:** Piranî
**Ehl:** Xelk

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Peyvên li jêr rast bikin û di nav hevokê de bikarbînin.
Pûş:
Ger belak:
Roja paşî:

## PIRS

1- Di helbestê de rewşek çawa tê têgihandin?
2- Diyar bikin di helbestê de pirsgirêkên civakê çi ne?

## CÛR Û AWÊN

We helbestek ya ku her beşekî wê ji çar rêzikan pêkhatî xwend. Ji van beşan re **malik** tê gotin.

Em kiteyên her rêzikekê bijimêrin.

**Î ro dos tin ew ji hev re tu di bê jî can fi da**

Dema em temaşeyî helbestê dikin, dibînin ku di malikan de jimara kiteyên her rêzikekê pazdeh in. Em ji vê re dibêjîn pîvana kiteyan. Helbestên bi pîvana kiteyan tên, bi giştî di rewşa malikan de tên nivîsîn. Di dawiya rêzikan de wekheviya deng heye.

*Ji van dengên li dawiya rêzikan tên dubarekirin re **qafiye** tê gotin.*

**Qafiye di navbera xwe de dibe çar beş:**

**1-** Qafiya lewaz (Qafiya nîvî)
**2-** Qafiya Tam
**3-** Qafiya Dewlemend
**4-** Qafiya Hevdeng (Cînas)

## RÊZIMAN

Ew peyvên ku cihê nav tên bi karanîn, erkê nav digire ser xwe jê re **cînav** tê gotin.

**Cînav ev in:**


**1-** Cînavên kesî
**2-** Cînavên nîşandanê
**3-** Cînavên pirsyarî
**4-** Cînavên jimarî
**5-** Cînavên vegerok
**6-** Cînavên nediyar

## HÎNDARÎ

Hûn bi riya xwendina vê helbestê rewşa gelê Kurd ya kevin têdigihin? Ger hûn têbigihin şîrove bikin.

# DELAL Û XOŞEWÎSTÊN MIN!



Kurdistan mala hemû Kurdan e. Çawa ku her endamê malê ji bo parastina wê berpirsyar e û yek ji yekê çavnebarî nake, Kurdistan jî wisa ne. Eger we dît hinekan berpirsyariyek hilda ser xwe bihêlin, bila encam bide. Kevir navêjin karê wan. Bila ji bo vî karî serperiştiyê bikin. Bizanin ku birayê we yê Kurd ji her kesî dilsojtirê we ye. Eger min berpirsyariya mezin hilnedaba ser xwe, ezê niha ne li ber piyê sêdarê bûma. Ji bo vê yekê divê ez teng nebim. Ew kesên ku bi gotina me nekirin û li hemberê me rabûyîn, niha li mala xwe û di nav nivînên xwe yên germ de, bi hêsanî radizin. Lê em ji bo xizmeta gel niha li ber piyê sêdarê ne. Eger min jî ev berpirsyariya giran nedaba ser xwe, ez jî niha wek wan di xewa şîrîn de bûm. Ev şîreta ku ez niha ji we re bêjim, ji ber xwe berpirsyar dîtina min ya ji bo mayîndebûna we ye. Eger hevalek din, ev berpirsyarî daba ser milê xwe, niha di cihê min de, ewê li ber piyê sêdarê bûya. Ji ber hindê ez bextewar û dilşa me.

Niha, ezê wek Kurdekî dilsoj û xizmetbexşê gel, çend amojgariyan bo we bêjim. Li hemû gotinên min baş guhdar bin. Hêvîdar im ku di pêşerojê de ev gotinên min, pêşiya we rewşen bike û hûn serbikevin.

Baweriyê bi Xudê, bi pêxember û bi pirtûkên wî bînin. Hem ji bo peywirên olî têbikoşin û paydar bin.

Yekîtî û hevkariya xwe biparêzin. Karên ne şayanê we ye nekin. Li hember hev teng nebin. Nemaze li hember berpirsiyarî û xizmeta gel.

Radeya zanist û têgihîna xwe zêdetir bikin, da hûn ji aliyê dijminan ve kêmtir bên xapandin.

Qîma xwe li dijmin neyînin. Ji ber dîrok diyar dike ku ew bi gelek delîl û burhanan dijminê, ol, gel û welatê we ne. Ew li hember we li pey hêceta ne û bi kêmtirîn gunehbariyan dikarin cezayên mezintirîn li ser we biryar bidin.

Ji bo çend rojan jiyana vê cîhana bêdom, nebin patexwerên dijminan. Ji ber ku dijmin her dijmin e, cihê baweriyê lê nîne.

Li hember hevdû, di hêla siyaset, can û mal de xiyanetê nekin. Ji ber ku xiyanetkar li ba Xudê û gelek kirêt û bênirx e. Bizanin ku xiyaneta xayinî vedigere ser xwediyê xwe.

Eger kesekê bêxiyanet alîkariya we kir ji wî re bibin alîkar. Nebê hûn bibin asteng û sîxurên biyaniyan.

Hûn tucarî ji serhildan û têkoşînê paş nemînin! Ta wek hemû gelên din, hûn jî ji koletî û dîlîtiyê rizgar bibin. Malê dinê bênirx e. Ger hûn bikaribin welatekî serbixwe û azad bêxin destê xwe û mal û axa wî bibe yê we, hingê wê her tiştê we hebe.

Ez ji bilî mafê Xudê ji tu kesî re qerdar nînim. Lê eger kesekê doz kir ku mafek yê wî kêm yan zêde di stûyê min de maye, min têra vê yekê li pey xwe serwetî hiştiye, bila ji mîratxwerên min wergire.

Ta hûn nebin yek, hûn serkeftî û pîroz nabin. Li hember hevdû zordarî û zorê rewa nebînin! Xudê gelek zû zordarî û zordaran tine dike. Ev mizginiya ku Xudê gotî: “Xudê tolê ji zalim û zordaran werdigire.”

Ez hêvîdar im ku hûnê van xalan bidin berçavan, Xudê we li hember dijminan bi hêz û serkeftî bike.

Her wekî Şêx Seîd gotî:

"Muradî ma nesîhet bûd û guftim

Hewalet bo Xuda kerdim û reftim."

**Qazî Mihemed**

## PEYV

**Serperiştî:** Pêşengtî, çavdêr
**Dilsoj:** Dilşewat
**Amojgarî:** Şîret
**Rade:** Ast
**Qerdar:** Deyndar
**Patexwer:** Kutxwer, Parîxwer

## RÊZIMAN

**1-Cînavên kesî:**

Ew cînavên ku cihê navê kesan digirin, jê re cînavên kesî tê gotin.

Cînavên kesî, di hêla karanînê de dibin du beş:

**Cînavên kesî yên netewandî:** “Ez, tu, ew, em, hûn, ew”

**Cînavên kesî yên tewandî:** “Min, te, wî/wê, me, we, wan”

Cînavên kesî li gor yekjimar û pirjimariya xwe dibin du beş.

**a- Cînavên yekjimar:**
**Mînak:**
<u>**Tu**</u> Karên pir baş dikî.
<u>**Min**</u> xwendina xwe nîvçe hêla.

**b- Cînavên pirjimar**
**Mînak:**
<u>**Hûn**</u> jî ji gulan hez dikin?
<u>**Me**</u> bi hev re gok lîst.

Em dikarin pêşdariya cînavên kesî bi vî awayî nîşabidin.

| **Cînavên yekjimar** | **Cînavên pirjimar** |
|---|---|
| **Ez - min** | **Em - me** |
| **Tu - te** | **Hûn - we** |
| **Ew - wî/wê** | **Ew - wan** |

**2-Cînavên nîşandanê:**

Ew cînavên ku şûna nav digirin û heyînan bi nîşandanê nîşa me dikin re dibêjin **cînavên nîşandanê.**

**Mînak:**

<u>**Van**</u> baş biparêzin.

<u>**Wan**</u> bîne.

Balê bikşînin ser pêşdariya cînavên nîşandanê.

| | **Cînavên Nîşandanê Nêzîk nêr û mê** | **Cînavên Nîşandanê Dûr Nêr û mê** | **Cînavên Nîşandanê Zayenda Nêr** | | **Cînavên Nîşandanê Zayenda M** | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | **Nêzîk** | **Dûr** | **Nêzîk** | **Dû** |
| **Yj** | **Ev** | **Ew** | **Vî** | **Wî** | **Vê** | **W** |
| **Pj** | **Van** | **Wan** | | | | |

**3- Cînavên pirsyarî:**

Ew peyvên ku li şûna nav pirsekê çêdikin, jê re **cînavên pirsyarî** tê gotin.

**Mînak:**

**Kîjan** nehatiye?
**Çend** ji wan yên te ne?
**Kê** di ezmûna Ziman de pileya zorbaş girt?

Cînavên pirsyarî evin: “Kîjan, kî, kê û çend.”

**4- Cînavên jimarî:**

Ew jimara bi nivîskî weku peyv tê nivîsîn û şûna navan tên karanîn, jê re **cînavên jimarî** tê gotin.

**Mînak:**

**Çaran** name xwend.
Îro **duwemînî** kar kir.

**5- Cînavên Vegerok (vegerandinê):**

Ew cînavên ku bi awayê vegerandinê li cihê navan tên bikaranîn, jê re **cînavên vegerok** tê gotin.

**Mînak:**

**Bixwe** çû dibistanê.
**Xwe bi xwe** nan xwar

Cînavên vegerok evin “xwe bi xwe”

**6- Cînavên nediyar:**

Ew peyvên ku di hevokê de li şûna nav tên bi karanîn, lê zelalbûna wî navî diyar nakin, jê re **cînavên nediyar** tê gotin.

**Mînak:**

**Kesekê** îro kar kir.
**Hindekan** nivîsandin nivîsîn.

Cînavên nediyar evin: **“**kesek, hin, hindek, hemû, çendan, giş, filan, bêvan û wkd.”

## BI RIYA GUHDARKIRINÊ TÊGIHANDIN

- Yek ji kilîlên serkeftinê, guhdarkirin e.
- Guhên guhdarek baş, weke masulkeyên xebatkarekê ye, her ku dixebite pêş ve diçe.
- Yê ji xwe re rêzdar, guhdarkirina kesên din ji xwe re erk dipejirîne.
- Pêwîst e bi guhdarkirinê, hînbûnekê bi tiştên em

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- Gelo cûdabûna di navbera vê mijarê û mijara beriya wê de heye?
- Li gor we bîranîn çi ye? Pîranî hevokên di bîranînê de tên bikaranîn, ji çi cûrê hevokan e?

# PENABERIYA DI ŞEVA TIRSNAK DE

15’ê Sibatê bû, ewrê tarî esmanê wargeha me tarî kiribû. Bayekê pir cemidî dihat. Gelê wargehê di nav hewldanên barkirinê de bûn. Tevgerekê berçav di wargehê de xuya dikir. Her we ku zarok xatirê xwe dixwazin, ser robarê di nav wargehê re diherîkî de, dilîstin. Rojê cihê xwe ji şevê re dihêla. Tevger bi lez dibû. Gel li ser saçan û bi amûrên ku bi destê xwe çêkirîn, bi pişta xwe, bi bizin û dewaran, li riya Laleşê re ber bi sînorê desthilatdariya Sedam ve tiştê xwe dikişandin.

Vê rêwîtiyê hîn nû destpêkiribû; her kes neçarî kirina karekê bibû. Li ser pişta her zarokekê hinek tişt hatibûn girêdan. Tevayî tebayan neçarî hilgirtina baran bibûn. Kal û pîran jî dixwestin bi milê xwe hinek tişt ji zarokên xwe re rizgar bikin. Xire xira dengê saç û tirempêlokên bi dest hatîn çêkirin, rengekê cûda didan afirandin. Bi vî dengî, gelek tebayên neçarî bar hilgirtinê bûyîn, ji tirsan dest bi revê dikirin. Kesên nekar û nexweş, di nav bêçaretiyê de li benda derfetekê, ji jor de li milê desthilatiya Sedam temaşe dikirin. Qêrîna zarokên biçûk xemgîniyek zêdetir dafirand. Ha! Di vê demê de dengê çekên leşkerên Sedam şeva tarî, tarîtir dikirin. Lê belê, ciwanên serkêş ne ji şeva tarî ne jî ji dengê çekên leşkerên Sedam bandor dibûn. Her ku diçû hêza leşkerên Sedam zêdetir dibû. Lê dîsa jî van ciwanan bi vînbûna xwe nîşa didan. Li aliyê din, ji milê çiya ve ji bo bermayên wan ji neyaran re nemîne, birek ciwan dest bi şewitandina çadiran kiribûn. Li aliyekê ronahiya şewata çadiran, li aliyê din guleyên serhildêran esmanên wargeha me ji tarîtiya şevê rizgar dikirin. Ji derveyî saziyên fermî, tevayî wargeh dihat şewitandin.






Gelê ji nav wargehê xwe berdidan, neçar dibûn ku bikevin nav zeviyên mayînkirî û di xeta tixûb de bicih bibin. Li gel ev qas nexweşiyan, ji nişka ve berfeke dijwar dibariya. Her kesê derfetê naylonê heyî, ji bo zarokên xwe ji berfê rizgar bikin, dibin naylonan de bicih dikirin. Yên derfetê wan tine jî, zarokên wan derbazî bin naylonên cîranên xwe dibûn. Her ku diçû bêhêvîbûn zêde dibû. Alîkariya hukumeta Iraqê dihat hizirîn ku bike, nekiribû. Li aliyê din cihê wargehê yê ku gel jê derketî, ji aliyê hêzên xêrnexwaz ve hatibû dorpêç kirin. Li aliyê din tirsa mayînan xemgînî zêdetir dikir.









## PEYV

**Vîn:** Îrade
**Tûxub:** Sînor
**Mayîn:** Teqemeniyên di bin axê de tên bi cih kirin.
**Gule:** Fîşek

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**1-** Peyvên jêr rast bixwînin û rast binivîsin.
Lê belê, çadir, vîn, zarok

**2-** Vê rêwîtiyê hîn nû destpêkiribû; her kes neçarî kirina karekê bibû.

Hêmaya ku di hevoka jor de di navbera her dû hevokan de hatî karanîn, **xalbêhnok** e.

Hêmaya xalbêhnok **(;)**: Di navbera hevokên di aliyê wateyê de bi hev re di nav têkîliyan de ne de, tê bikaranîn.

## PIRS

1- Gel ji bo çi di nav tevgerê de bû?
2- Ji bo çi ciwanan bermayiyên xwe dişewitandin?
3- Gel çima ew qas li berxwe dida?

## CÛR Û AWÊN

Bîranîna ku di nav cûrenivîsînên wêjeyî de ya heya dawî belave, bûyerên balkêş yên demê borî, kes, rewş û têgihandina cih jî pêwîst dibîne.

*Ji nivîsînên tişta bi serê nivîskarek hatî yan jî nivîskar bixwe bûyî bînerê bûyerê, radigihînê re,* ***bîranîn*** *tê gotin.*

Bîranîn, pêwîst e xwe bi pesêre rastiyê. Zimanê wê sade, têgihandina wê ya bi bandor e. Bîranînên ku hêza kişandinê heyîn, ji aliyê gelek kesan ve bi zewq tên xwendin.

## RÊZIMAN

*Ew peyvên piranî piştî navan tên, reng, awa, rewş, jimar û hemû taybetmendiyên wan diyar dikin, jê re dibêjin **hevalnav**.*

**Hevalnav di nav xwe de dibin sê beş:**

**1-** Hevalnavên wesfî
**2-** Hevalnavên diyarkirinê
**3-** Hevalnavên nediyar

**1- Hevalnavên wesfî:**

Di mînakên jêr de peyvên binê wan hatine xîzikdan, çawabûna navan dane diyarkirin. Van peyvan bi baldarî bixwînin.

**Mînak:**

Gula **sor** xweş e.
Serdarê **ciwan** çû.

Di mînakên jor de peyva **sor** çawabûna rengê **gulê** û peyva **ciwan** jî çawabûna rengê **Serdar** dane diyarkirin. Ji ber vê çendê **hevalnavên wesfî** ne.

**1- Hevalnavên diyarkirinê:**

*Ew hevalnavên ku navan di hêla nîşandan, jimar û pirsyarî de diyar dikin jê re **hevalnavên diyarkirinê** tê gotin.*

**Mînak:**

**Vî** hevalî pirtûk xwend.
**Çar** xwendekaran di ezmûna ziman de pileyek baş girtin.
**Kîjan** zarok nexweş ket?

**2- Hevalnavên Nediyar:**

*Ew hevalnavên ku navan bi awayekê nediyar diyar dikin jê re **hevalnavên nediyar** tên gotin.*

**Mînak:**

**Hindek** xwendekar dereng hatin.
**Kêmek** ji pirtûka min maye.

## HÎNDARÎ

Dema hûn vê mijarê dixwînin hêrsek yan jî dilşadiyek çawa bi we re çêdibe? Şîrove bikin.

## NIRXANDIN


Li gor we mercên bîranînekî çine? Hûn jî bîranînekî binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- Dema hûn mijarekî hûnandî dixwînin hestek çawa bi we re pêş dikeve?
- Çi cûdabûn di navbera hevalnav û navan de heye?

# AWAZA MIN

Ez keçikek biçûk im,
Navê min jî Awaz e.
Dengekî min xweş heye,
Mîna tembûr û saz e.
Wek bilbil bi fîxan im,
Bi şaxan re heval im.
Çavreş û poz çilak im,
Nevya Zerdeşt û Zal im.
Bi zimanê dayka xwe ,
Distirim ez ji bo we.
Ev sirûdên zarokan,
Beşek ji hûnera me.
Zarê Medya û Mîtan,
Xwedanê gurzê giran.
Em tev xwîşk û bira ne.
Sor û kurmanc û zazan,
Bi hev re tev de bêjin,
Em zarokên Kurdistan.





## PEYV

**Tembûr:** Saz
**Fîxan:** Qîr û hewar
**Şax:** Çiya



## RÊZIMAN

**Hevalnavên diyarkirinê dibin sê beş:**

**a-** Hevalnavên nîşandanê
**b-** Hevalnavên jimarî
**c-** Hevalnavên pirsyarî

### a- Hevalnavên nîşandanê

*Ew hevalnavên ku navan di hêla nîşandanê de diyar dikin jê re **hevalnavên nîşandanê** tê gotin.*

**Mînak:**

**<u>Ev</u>** zarok yên me ne.
**<u>Ew</u>** pênûs ya hevalê min e.
**<u>Wê</u>** pirtûkê bide min.

### b- Hevalnavên Jimarî

*Hevalnavên ku navan di hêla jimarê de ji navên din diyar dikin, jê re **hevalnavên jimarî** tê gotin.*

**Mînak:**

**<u>Du</u>** gul
Sîrwanê **<u>yekemîn</u>**
Egîd **<u>ji pêncan yekê</u>** pirtûkê xwend.

### c- Hevalnavên pirsyarî:

*Hevalnavên ku navan di aliyê pirsyarî de diyar dikin jê re **hevalnavên pirsyarî** tê gotin.*

**Mînak:**

**<u>Kîjan</u>** xwendekar hatibû?
**<u>Çend</u>** heval hatin?

# TESTA 1.

**Delal û xoşewîstên min!**

Kurdistan mala hemû Kurdan e. Çawa ku her endamê malê ji bo parastina wê berpirsyar e û yek ji yekê çavnebarî nake, Kurdistan jî wisa ne. Eger we dît hinekan berpirsyariyek hilda ser xwe bihêlin, bila encam bide. Kevir navêjin karê wan. Bila ji bo vî karî serperiştiyê bikin. Bizanin ku birayê we yê Kurd, ji her kesî dilsojtirê we ye. Eger min berpirsyariya mezin hilnedaba ser xwe, ezê niha ne li ber piyê sêdarê bûma. Ji bo vê yekê divê ez teng nebim. Ew kesên ku bi gotina me nekirin û li hemberê me rabûyîn, niha li mala xwe û di nav nivînên xwe yên germ de, bi hêsanî radizin.

***"Her sê pirsên destpêkê li gor kurte mijara jor bersiv bidin."***

**1- Çima Qazî Mihemed dibêji; "Kurdistan mala hemû Kurdan e"?**
**a-** Ji ber ku ava wê zêde ye.
**b-** Ji ber ku bixwin.
**c-** Ji ber ku hinek din jî bêxin hundirê wê.
**d-** Ji ber ku welatê me ye.

**2- Ger we dît kesek berpirsyarî hilda ser xwe pêwîst e hûn çi bikin?**
**a-** Bibin asteng.
**b-** Ji bo serbikeve rê nedinê.
**c-** Ji bo encam bigire bibin alîkar.
**d-** Ji bo şer bike.

**3- Çima Qazî Mihemed birin ber sêdarê?**
**a-** Ji ber şer kiribû.
**b-** Ji bo berpirsyarî girtibû serxwe.
**c-** Ji ber şervanê azadiyêbû.
**d-** Ji ber Kurd bû.

**4- "Ji wan cûre nivîsînên cihê geryayî û dîtî, agahiyên komkirî, tiştê pêhesiyayî, ragihandî re çi tê gotin?**
**a-** Çîrok **b-** Bîranîn **c-** Gotar **d-** Geryaname

**5- Di vê rêzika helbestê de çend kite hene?**
*"Îro dost in ew ji hev re tu dibêjî canfida/Roja paşî tu dinêrî arz û hala lev didin"*
**a-** 32 **b-** 29 **c-** 31 **d-** 30

**6- Di vê hevoka jêr de çend tîpên dengdar hene?**
*"Ger min berpirsyartî negirta ser xwe, ne diçûm sêdarê."*
**a-** 17 **b-** 18 **c-** 27 **d-** 28

**7- Di kîjan peyvên jêr de diyarkirina kiteyan çewt e?**
**a-** ho – zan – van **b-** Dag – ir – ker
**c-** Cot – kar **d-** Da – ris – tan

**8- Kîjan peyvên jêr ne yek kite ye?**
**a-** Berx **b-** Kerx **c-** Çerx **d-** Çarex

**9- Di kîjan peyvên jêr de tîpa cêwî nîne?**
**a-** Karwan **b-** Laleş **c-** Parêzgeh **d-** Dagirker

**10- Di kîjan peyvên jêr de, ji derveyî tîpên dengdêrên dengkurt ne hatine bikaranîn?**
**a-** Kurdistan **b-** Dengdêr **c-** Daristan **d-** Keniye

**11- Çima tîpa "î" ya dengdirêj ya di hevoka, "Ez rêwiyê riya dûr im." Cihê xwe ji tîpa "i" ya dengkurt re hêlaye?**
**a-** Ji ber ketiye pişt tîpa cêwî.
**b-** Ji ber du tîpên dengdêr rasta hevdû hatine.
**c-** Ji ber ketina deng heye.
**d-** Ji ber ketiye pêşiya tîpa siwar.

**12- Di kîjan hevokên jêr de kêmasiyên hêmadanînê hatine kirin?**
**a-** Dengê bilbil pir xweş e.
**b-** Ma tu îro nayê dibistanê?
**c-** Pirtûka xwe vekir û dest bi xwendinê kir!
**d-** Bav û birayên Kawa, li malê bûn.

**13- Kîjan navên jêr navê taybet e?**
**a-** Dar **b-** Cotkar **c-** Mirov **d-** Kurd

**14- Di kîjan hevokên jêr de cînav hatiye bikaranîn?**
**a-** Vê darê bibire. **b-** Vê bide min.
**c-** Wê gulê bikire. **d-** Wey! Hat

**15- Di kîjan hevokên jêr de hevalnavê wesfî heye?**
**a-** Vî darî bîne. **b-** Çar gula bikire.
**c-** Kîjan mirov hat. **d-** Gula sor bêhnxweş e.

**16- kîjan vebijêrkên jêr, taybetmendiya bîranînê ye?**
**a-** Hêza xiyalî zêde ye.
**b-** Ji aliyê civakê ve rast nayê dîtin.
**c-** Di nav wê de gotinên mezinan tên bikaranîn.
**d-** Pêwîst e xwe bipesêre rastî yê.

**17- Kîjan bire peyvên jêr ne hevok in?**
**a-** Egîdê reş û Sosina bejin zirav.
**b-** Egîdê reş çû.
**c-** Sosina bejin zirav hat.
**d-** Bejina zirav ciwan e.

**18- Li kûderê xalbêhnok tê bikaranîn?**
**a-** Di navbera kiteyan de.
**b-** Di navbera hevokan de.
**c-** Li despêka hevokê.
**d-** Li dawiya hevokê.

# BEŞA II

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **Em di mijara borî de fêrî hînbûna bîranînan bibûn.**
- **We qet ramanên xwe taqîkirine, ger we taqîkiri bin, tiştên we têde zorî kişandî çi bûn?**
- **Hûn jî palvebidin hizirê xwe û di refê de nivîsandinek ya taqîkirinê binivîsin.**

# EKOLOJIYA CIVAKÎ

Ekolojî, bixwe zanisteke ku têkiliyên civak bi derdor re lêkolîn dike. Bi nûbûna xwe re her ku diçe, bi hemû zanistên din re di nav hev de, ji bo derbazkirina nakokiyên civakê yên bi xwezayê re, wê rolek pêşeng bilîze. Zanîna derdor ya ku bi sînor pêşdikeve, bi ekolojiyê re wê bibe pêngavekî mezin ya şoreşê.

Di civaka seretayî ya komîn de, girêdana bi xwezayê re, mîna girêdana zarok û dayîkê ye. Civak, xwezayê zindî dibîne. Divê li hember xwezayê dijberiyê neke, li hemberî xwezayê, gunehan neke. Ev bûye destûrek olî ya bingehîn. Olê xwezayî, olê civaka seretayî ya komînal e. Di pêkhatina civakê de, nakokî û çêbûnên ne asayî, nîne. Felsefe bixwe jî, mirovê xwezaya xwe naskirî rave dike. Mirov di cewherê xwe de, parçeyek ji xwezayê yê herî pêşketiye. Ew sîstema civakî ya ku ev parçeyê herî pêşketî yê xwezayê, bi xwezayê re dixe nav nakokiyan, Ew sîstem, ji derveyî xwezayê, dijberê xwezayê ye. Vê sîstemê, mirovê bi xwezayê re bûye yek, di nav coş, şahî û cejnekê de, xistiye bela ya serê xwezayê. Ev rastî jî diyar dike ku ev sîstem çiqas sîstemekî bi bela ye.



Hevgirtin û yekbûyîna bi derdor û xwezayê re, ne tenê aborî û civakî ye. Di aliyê felsefî de jî xweza, ji bo têgihiştinê evîndariyeke ku dest jê nayê berdan e. Xweza, bi bûyîna mirov re mereqa xwe ya mezin, hêza xwe ya afrêner nîşa kiriye. Mirov jî, bi têgihiştina xwezayê re hebûna xwe dinase. Di navbera herduyan de têkiliyekî wek evîn û evîndariyê heye. Ev serboriyekê mezin ya evîndariyê ye. Xirakirin û ji hevqetandin li gor ravekirina olî gunehekê herî mezin e. Ji ber ku ji vê hêjatir hêzekê watedar nayê afirandin.

Lê nakokiyên bingehîn yên bi xwezayê re dikarin bi sîstemê gav bidin avêtin. Ji ber nakokiyên wê yên bingehîn, tevgerên hawîrdor parêz bi serê xwe tenê nikarin çareseriyê pêkbînin. Ji aliyê din ve, civakekê ekolojîk veguherînekê exlaqî jî ferz dike. Civakek zordar, bi helwestekê ekolojîk aliyê wê yê dijberî exlaqî wê dawî lê bê. Têkiliya exlaq û wijdan giyanekî empatîk û sempatîk divê. Ev jî bi amadekariyekê baş ya ekolojik, watedar dibe. Ekolojî, dostaniya bi xwezayê re û baweriya bi dînê xwezayê ye. Bi vî awayî  xwe gihandina hev ya civakekî organîk û xwezayî têgihiştinekî rast diyar dike.

**PEYV**

**Nakok:** Alozî
**Ekolojî:** Zanista hawîrdor
**Organîk:** Her tiştên resen
**Felsefe:** Hezkirina zanistê
**Sîstem:** Pergal
**Sempatîk:** Hezkirin
**Empatîk:** Di warê hestiyarî de xwe kirina cihê keseke din.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Hêmaya neynok, **(“”)** peyv û nivîsînên ji kesekê yan jî, ji çavkaniyekê hatine girtin û di nav nivîsînekî de hatiye bi cihkirin di nava neynokê de tê danîn.

Hêmaya neynok carnan li ser çend gotinan tê bi karanîn, carna jî,ji bo balkişandina li ser peyvekê tê bi karanîn.

**Mînak:**

Rêber APO li ser xwendinê wiha dibêje; "Xwendin ronahiya jiyanê ye."

**Mînak:**

Di tevayî perwerdeyên bi zimanê Kurdî tên dayîn de; "Dibistanên Mexmûr", mînakên herî girîng in.

## PIRS

1- Hûn çawa nêzîkî derdorê xwe dibin? Rave bikin.
2- Dema ekolojî tê gotin hûn çi têdigihin? Vekin.
3- Sûdê parastina zanista derdor ji bo zarokan çi ye?

## CÛR Û AWÊN

Nivîsîna herî girîng ya cûre vegotînên çespandî û diyar armanc digirin goter e. Gotar di rojname, kovar û malperan de tê weşandin. Gotara bi mijarên nû, di destpêka rojnameyê de cih digire. Ji vê gotarê re jî gotara sereke tê gotin.

## RÊZIMAN

**Hevalnav li gor çêbûna xwe dibin sê beş:**

| **Hevalnavên Xwerû** | **Hevalnavên Darriştî** | **Hevalnavên Hevgirtî** |
|---|---|---|
| **Gula sor** | Hozanê **Dildar** | Mirovê **Çavr** |
| **Kêm kes** | **Evîna Evîndar** | **Gula Dilşad** |

**1- Hevalnavên xwerû:**

*Ew hevalnavên ku pêvekên sazker nestandî, hevgirtin bi peyvek cûda re çênekirî, jê re* ***hevalnavên xwerû*** *tê gotin***.**

**Mînak:**

Xwendekarê **jîr**.
Ava **sar**

**2-Hevalnavên tûredayî (darriştî):**

*Ew hevalnavên xwerû yên ku pêveka sazker standî û sazûmaniyek nû li hevalnav dayîn qezençkirin, jê re* ***hevalnavên tûredayî (darriştî)*** *tê gotin.*

**Mînak:**

Keçika **dildar** çû bêriyê.
Nivîsîna **vehonandî** ciwan e.

**3- Hevalnavên hevgirtî:**

*Ew hevalnavên, ji du peyvên cûda pêkhatî, çawabûna, nav dayîn diyarkirin, jê re* ***hevalnavên hevgirtî*** *tê gotin.*

**Mînak:**

Xwendekara **Dilsoz** jîr e.
Mirovê **çavsor**, **çavbirçî** ne.

## HÎNDARÎ

Hûn dibistan û derdora dibistana xwe paqij digirin? Di refê de li ser paqijiyê guftûgo bikin.

Li derdora we kesên ziyanê didin xwezayê hene? Ev cûrê reftaran li xweşa we diçin? Hûn dikarîn çawa li pêşiya van reftaran bibin asteng? Nîqaş bikin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- ❖ **Hûn fêr bûbûn mijara we ji beriya niha xwendî gotar e.**
- ❖ **Hûn dizanin çi cûdahî di navbera gotar û efsanê de heye?**

# FERHAT Û ŞÎRÎN

Dibêjin keçek Kurd ya ciwan, ya bi navê Şîrîn hebû. Ma kê ev keça ciwan nedixwest. Xortên çeleng, beg, hê kî û ne kî...

Li milê din, Ferhatê belengaz heye. Ew jî bûbû evîndarê Şîrînê. Ma dibe bavê keçikê, wê bide belengazek wek Ferhat. Na nade. Ferhat ne evîndarekî asayî bû, evîndariya Şîrînê, wî digihîne pileya dîn bûnê.

Bavê keçikê, wê nade Ferhat lê dîsa naxwaze, mercekê mezin nede pêşiya wî. Rojekî banî Ferhat dike, tîne dîwana xwe û jê re dibêje:


- Ferhat! Ez dizanim tu keça min dixwazî, ezê bidim te, lê mercek yê min heye. Ger tu vî mercî pêkbînî, tû û Şîrîn wê bigihin hev.

Ma wê Ferhat çi bêje? Ji vê dev nermiyê re bêgûman wê bipejirîne. Dengê xwe dernaxe.

Bavê Şîrînê mercê xwe datîne holê:

- Lawê hêja;

Tu dizanî ava bajarê me kêm e, ger tu vî çiyayî bi qelêşî û avê ji bajar re bînî, ezê Şîrînê bidim te.



Ava dixwest bîne bajêr; ji bajêr pir dûr û di navbera avê û bajêr de çiya hebû. Dibêjin; “Ti çiya xwe li ber zorê nagirin.” Ferhat jî bi tevayî hêza xwe dest bi karkirinê dike. Dema xebata xwe ber bi dawî ve dibe, hatina avê ya Qesr û Şîrînê çend rojan dimîne, evîndariya Şîrînê ya di dilê Ferhat de, gurzê wî yê di dest de, bi hezkirin, xebatkirina wî zinaran difelişîne.

Lê dîsa nahêlin her dû evîndar bigihin hev. Jinekî pîrhevok dixin navbera wan. Jina pîrhevok diçe gel Şîrînê, her wekî cîhan bi serê wê de xirabûye, bi rewşekî perîşan, dest bi axaftinê dike.

- Tiştên hatine serê min, nepirse keça min! Ferhat hem av nanî hem jî xwe di zinarê de avêt û xwe kuşt.

Şîrîn, li hemberî tirsnakiyekê bi vî rengî, ka wê çawa bikare li berxwe bide. Ev dilê nazdar wê piştî niha çawa lê bide. Belê jiyan li Şîrînê heram e, wê jî karî giyanê xwe.

Pîrhevok jî karê xwe pêkanî, niha dora Ferhat e. Diçe gel Ferhatê xemgîn, ji qehran, mirov dikare bibêje; zimanê wê hatiye girêdan. Bi awayekî nikare ji Ferhat re bîne ziman.

- Ferhat! Bavê Şîrînê, keça xwe daye yekî din, tû hîn jî çima dixebitî?

Çiya li ser serê Ferhat de hilweşiya. Piştî vê êdî anîna avê jî ti wateya xwe nîne.

Dibêjin, li serê Çiyayê Ferhat sê gor hene. Dema havîn tê, li hêla tenişta wan dû şitlên gulan şîn dibin. Yek ji wan kulîlka sor, yek jî spî pê ve tê, dema tam nêzîkî hev dibin û bigihin hev, striyek radibe û dikeve di navbera wan de û nahêle bigihin hev.

Li gor destanê tê gotin, herikandina ava Ferhat anî li hin cihan tê dîtin û ji van cihan re jî dibêjin; "Kolanên Ferhat."

## PEYV

**Gurz:** Hesinê sergopik, amûrek yê şer e.
**Pîrhevok:** Kesa fêlbaz.

**1-** Hêmaya kevanok ( ), di daxuyaniyên ku bi çêbûna hevokê ve ne girêdayî de tê bikaranîn.

**Mînak:**

Heval Egîd (Mahsum Korkmaz) di sala 1986'an de şehîd ketiye.

Di berhemên şanoyan de agahiyên di derbarê kes yan jî nîgarê (dekor) de tên dayîn, dikevin nav kevanokê.

**Mînak:**

Heval: (Bi rûkenî) banî hevala kir.

**1-** Peyvên li jêr hatine dayîn di nav hevokê de bikarbînin.

Ferhat, Şîrîn, efsane

**2-** Peyvên jêr hatine nivîsîn bi awayekî rast li lênûsa xwe binivîsin

Kûrd, Xortên çeleg, ewîndar, hilweşya, kulilk sor

## PIRS

1- Çima bavê Şîrînê nedixwest wê bide Ferhat?
2- Bavê Şîrînê mercek çawa da pêşiya Ferhat?
3- Sojeya mijarê çiye?

## CÛR Û AWA

**1-** We nivîsandinekî destanî xwend ku tê de serboriya jiyana evîndariya keçeke Kurd û xortekî Kurd bi navê Ferhat û Şîrîn hatibû vekirin. Di vê mijarê de mirov rewşa jiyana civaka Kurd ya di demboriyê de nas dike.

Cûre nivîsînek efsaneyî ye.

Efsane; bûyer, heyînên awarte yê ji demê kevin heya niha tên gotin, dike mijara xwe. Taybetmendiya wê ya sereke weke rastî çêbûyî tê pejirandin.

## RÊZIMAN

Hevalnavên di hevokên jêr de diyar bikin, van hevalnavan di kîjan alî de nav dane temamkirin, bêjin.

**Mînak:**

Ferhatê **çeleng** çiya kola.

Şîrîna **ciwan** bi bavê xwe yê berjewendî perest re pevçû.

Ev dilê **nazdar** wê piştî niha çawa lê bide.

## HÎNDARÎ

**1-** “Ti çiya, xwe li ber zorê nagire.” Çima nivîskar ev gotina penda pêşiyan di parçeya bi navê “Ferhat û Şîrînê” de bi karaniye?

**2-** Bûyerekê binivîsin, vê gotinê têde bikarbînin û ji hevalên xwe re bêjin.

## NIRXANDIN

Di efsaneyê de kesê herî zêde we pesnê wî daye, yan we rexne kirî ki ye? Çima.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **Di mijara derbazbûyî de, we efsaneyek ji çanda gel xwendibû.**
- **Niha jî hûnê bibînin ku pêkenok çawa tê sazûmankirin.**
- **We carnan guhdarî pêkenokan kiriye?**
- **Hûn dizanin ken jî hûnerek e.**

# BEHLÛL

Rojekê dadmendek yê bajêr, radibe diçe li ser serbanê qesrê û wiha bang dide.

- Heçî kesê bê, ta beyanî biçe bimîne di vê birka avê de, ezê keça xwe ya bedew û xweşik bidimê.

Lê mixabin çileyê zivistanê ye, kesek nikare ji ber serma û seqema dijwar, vî mercê dadmend rake. Hinek kes diçin, demjimêrekê dimînin nikarin bi qedînin, direvin û tên li gel dadmend û dibêjin;

-Ji kerema xwe re em nikarin vî mercî te pêkbînin.

Mirovekî hêja û wêrek, carekê rabû û wiha ji dadmend re got:

- Dadmendê min, ezê biçim vî karî bikim lê divê tû bêmafiyê li min nekî.

- Baş e, ma heya niha min bêmafî li kê kiriye, tu wisa dibêjî? Here ger tu bikarî, ez soz û peyman didim ku keça xwe bidim te. Ma tû weke din çi ji min dixwazî?

Vî mirovî, piştî şîva xwe bi dilê xwe xwar, cilên xwe ji ber xwe kir û berê xwe da birka avê.

Dema gihîşt ser birka avê, yekser ket birkê. Li pêşberî wî guriyek ya agir ji dûr ve xuya dikir. Zilam, berê xwe da vê guriya agir, ta beyanî hedara xwe pê anî û ew guriya agir ji bo wî bû hêviyek mezin. Beyanî ew ji birkê derket û berê xwe da mala dadmend.

Dadmend wiha got:

- Min hizir dikir ku heya niha tû mirî û emê te beyanî bibin li ser goristanê lê va tû li ber çavê minî û hebe nebe te fêlbaziyek kiriye?

- Ma ez kesekî ew qas jar im, ezê ew qas bihêsanî û zû bimirim. Lê belê min ji dûr ve agirek dîtiye û min hedara xwe pê aniye.

Bi vê gotinê dadmend kete gûmanê û hebe nebe vî mirovî fêlbaziyek kiriye û got:

- Na, ez napejirînim, te xwe li ber wî agirî germ kiriye; ma ez nizanim, fêlbaz?

- Bira, ma ezê çawa xwe li ber wî agirê ku bi hezaran gaz ji min dûr germ bikim? Tişta tu dibêjî, hiş napejirîne.

Bi van gotinan baweriya dadmend nehat û wiha got:

- De wê demê rabe, em biçin cem Behlûl, da mebesta me çareser bike.

- De biçin.

Dadmend û zilam rê ketin û berê xwe dan mala Behlûl. Piştî gihan wir, mebesta pê ve hatine ji Behlûl re ragihandin. Lê Behlûl got:

- Ka, niha rawestin, em hinek birçî ne, ezê xwarinekê ji we re çêbikim, piştre ezê pirsgirêka we çareser bikim.

Behlûl jî rabû çû hinek goşt xiste berojekê, bir danî li ser rojnê û hat jorve, li rasta rojnê pêtek agir kir û dest jê berda.

Demê firavînê derbaz bû lê Behlûl xwarin ne anî û her got; "hêj çênebûye." Dadmend pir birsî ye, xwe nikare bigire û carek çû mêze kir, Behlûl di wê rewşê de ye. Ji Behlûl re wiha got:

- De here xwelîser, mane tû bixwe dizanî ew xwarin wisa çênabe; vaye nemaze emê hatine li gel te, mebesta xwe çareser bikin? Na, ne zilam rabe emê biçin, ev kenê xwe li me dike.

Ji xwe Behlûl ma bû li benda vê gotinê û bi zimanekî tûj ji dadmend re wiha got:

- Gelo birayê min, ma dê ev zilam di birkê de, bi hezaran gaz ji agir dûr wê çawa xwe germ bike?

Bi vî awayî Behlûl dadmend vala derxist; bi van gotinên Behlûl, dadmend serê xwe xwerand û neçar ma ku keça xwe bide wî...

Rabû keça xwe da zilamê hejar û deh rojan ji bo wî kirin dîlan û govend.



## PEYV

**Dadmend:** Kesê bi dadê ve xerîk dibe
**Gurî:** Pêta agir
**Fêlbaz:** Fen kirin
**Gaz:** Amûrek ê pîvana dirêjahiyê
**Birk:** Hewza avê
**Rojne:** Cihê ku ji bo ronahîkirina malê ya li banê xanî hatiye vekirin.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**1**- Peyvên jêr bi awayekî rast binivîsin.

“dadmed, Felbaz, govand”

**2**- Li ser hêmaya li dawiya rêzika yekem, ya hevoka jêr hatiye danîn, baldar bin. Ev hêma dema di rêzekê de nivîsandin tê domandin, ger bigihîje dawiya rêzikê, peyv di nîvî de bimîne, ji bo berdewamkirina wê peyvê, xêzika berdewamkirinê tê bikaranîn; lê xêzika berdewamkirinê di peyvê de kitekirina peyvê bi awayekî rast dibire.

**Mînak**:Zilamê hejar êvarî, ji mala xwe çû. Xwe berda nava ava ce- midî, heya roj derket.

Di destûrên hêmadanînê de çar xêzik tên bikaranîn.

**1-** Xêzika berdewamkirinê
**2-** Xêzika axaftinê
**3-** Xêzika navber.
**4-** Xêzika xwar

***3-** Nivîsînên ji aliyê kesekê ve, ji bo çareseriya pirsgirêkekê, gilîkirinekê û zanistgirtinekê ji cihê peywendîdar re tê nivîsandin, jê re **daxwazname** tê gotin.*

***Li mînaka jêr ya daxwaznameyê baldarbin.***

**09/07/2013**

**JI BO ŞAREDARIYA ÊLIHÊ**

Li gel kêfxweşî û spasiyên xwe, ji bo vê qursa tendurusti ya ku ji aliyê we ve hatî vekirin. Ger çêbibe ez jî dixwazim weke hemwelatiyekî beşdar bibim.

Ji bo vê yekê jî, hêvîdarim tiştên pêwîst ji aliyê we ve bên pêkanîn.

Navnîşan:
Şeqam: 23
Kolan: Mûsa
Enter
Jimar: 45
ÊLIH

**PIRS**

**1-** Dadmend, mercek çawa avêt pêşiya zilam?
**2-** Dema zilam mercê dadmend pêkanî, çima dadmend bawerî pê nanî?
**3-** Dema çûn li gel Behlûl, Behlûl planek çawa ji wan re

**CÛR Û AWÊN**

Mijara we xwendî, mijara pêkenînê ye.

*Ji nivîsînên bi awayê ken û henek tên ravekirin, mirovan dihizirînin û waneyekê dide wan re* ***pêkenok*** *tê gotin.*

Di wêjeya me de pir mînakên pêkenokan yên ku zêhna gelê me bi xweşbînî vedikin û pêkanînên wan didin pêhesandin hene. Gelek pêkenokvanên Kurdan yên navdar hene lê ji ber bindestiya gelê Kurd piraniya wan winda ne.

Di civîn û civatan de, cihdana pêkenokan, peyvînê rengîn dikin. Lê divê pêkenok bi wê peyvînê re li hevhatî be, di cih û demê wê de bê têgihandin.

## RÊZIMAN

*Ew peyvên ku kirina kar di hêla dem, rewş, cih û ber, çendî û pirsyarî de bandor dikin, jê re* ***hevalkar*** *tê gotin.*

**Hevalkar di warê erkdariya xwe de dibin penç beş:**

**1-** Hevalkarên demî
**2-** Hevalkarên cih û ber
**3-** Hevalkarên rewşî
**4-** Hevalkarên çendî
**5-** Hevalkarên pirsyarî

## HÎNDARÎ

Hûn jî pêkenokekê peyda bikin û di refê de ji hevalên xwe re bixwînin. Dema we xwend aliyê wê yê pêkenokî bêjin.

Tîpên di zimanê me de heyî bi şêweyê xwar û rast li lênûsa xwe binivîsin.

**Gir û rast:**
**"A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z"**

**Gir û xwar:**
***"A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z"***

**Hûr û rast:**
**"a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z"**


**Hûr û xwar:**
***"a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z"***

# ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ

Şerefxan, kurê Mîr Şemsedînê kurê Mîr Eşref e. Ji binemala mîrên fermanraweyên Bedlîsê ye. Di sala 1542’an de ji dayîk bûye û di sala 1604’an de miriye. Di temenê xwe yê ciwan de, li mala Şahê Îranê hatiye perwerdekirin. Wekî şahzadan hatiye xudan kirin. Di hemû beşên hûnerî de xwendina xwe bi awayekî serkeftî qedandiye. Di dîrok-nasiyê de gelek kêrhatî ye. Karê ku di qada dîrokê de kirî, pir giranbiha ye. Dîroka Kurdistanê û navê bav û bapîrên xwe ku Mîrên Bedlîsê bûn, nemir kiriye.

'Şerefnama' wî karekê hêja ye. Her wekî di dawiya Şerefnamê de gotiye: “Ez xwe bextiyar dizanim û şanaz im ku min xizmeta netewa xwe kiriye û ketime rêza nivîskarên welatparêz. ”

Şerefxan, ev pirtûka xwe ya binavê Şerefname di serdema Sefawiyan de bi zimanê Farisî nivîsiye. Seyda Hejar Miku-riyanî, Şerefname ji zimanê Farisî wergerandiye zimanê Kurdî. Niha ev berhem bi gelek zimanan hatiye wergerandin û di pirtûkxaneyên navdar yên cîhanê de tê pêşkêşkirin.



## PEYV

**Fermanrawe:** Karbidest
**Şanaz:** bextewer
**Şahzade:** Zarokên kur yên şahan
**Dîroknas:** Dîrokzan
**Sefawî:** Gelê Îranî

## PIRS

1- Şerefxan kengê û li kûderê ji dayîk bûye?
2- Navê pirtûka Şerefxan çi ye?
3- Kê Şerefname wergerandiye zimanê Kurdî?

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **Hûn dizanin sûdên helbest xwendinê, hestekî li gel mirov şiyar dikin?**
- **Li jêr hûnê helbestek ya Cegerxwîn bixwînin.**

# XABÛRÊ

Ey Xabûr Xabûr, ey Xabûr Xabûr!
Wek daxwaza min, pir dirêj û kur.

Kêferata te, xum xum û lew lew,
Nayên bîra te ne razan, ne xew.

Herdem dinalî, bi qirîn, gazî,
Lê kes nizanî, ka çi dixwazî.

Armanca te ye, xurtî, pêşveçûn.
Cihê te teng e, divê fireh bûn.

Pêlan didî xwe, qîr û firyadî.
Tu jî wekî min, divê azadî.

Sînga vê erdê,te çirand bizor.
Nizanim çira tu naçî berjor?

Ev çende xurtî, bêdaxwaz û vîn
Dikevî sînga derya, bê evîn.

Xwezka min bi te, bêderd û bêkul.
Dijî bi şadî, bêmejî û dil.

Tu jî weke min, ger bûbûya Kurd ,
Ev xurtiya te, dibû kul û derd.

**Cegerxwîn**





## PEYV

**Xabûr:** Navê robarek yê Kurdistanê ye.
**Kêferat:** Bizav
**Xum:** Herikîna dengê avê

## EM HELBESTVANÊ XWE NASBIKIN

**CEGERXWÎN (1903-1984)**

Cegerxwîn sala 1903'ê li Hesara girêdayî Kercewsa Batmanê ji dayîk bûye. Navê wî yê rast Şêxmûs e. Navê bavê wî Hesenê kurê Mihemed e. Di zarokatiya xwe de şivanî û gavanî kiriye. Hîn di biçûkaniya wî de bavê wî çûye ber dilovaniya Yezdan. Weke sêwî li cem xwîşka xwe Asya maye. Li cem mela Ubeyd, hînî zanista olî bûye. Destûrnameya xwe ya olî û zanistî standiye.

Cegerxwîn sala 1984'ê li Stokolmê çûye ber dilovaniya Yezdan.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

| Çewt | Rast |
| --- | --- |
| Dirêş | Dirêj |
| Kûrd | Kurd |
| Çirant | Çirand |
| Xêw | Xew |

**1-**Peyvên li jor rast binivîsin û bixwînin.

**2-**Her peyvek yên li jêr bi awayekî rast di nav hevokê de bikarbînin.

armanc, pêl, kul, nalîn, Xabûr

## PIRS

1- Helbestvan di helbesta xwe de dabaşa çi dike?
2- Li gor helbestê, hûn herî zêde ji kîjan hestên helbestvan hez dikin? Rave bikin.
3- Jînama helbestvanî binivîsin.

## CÛR Û AWÊN

**1-** Mirov hest û hizrên xwe bi devokî yan jî bi niviskî tîne ziman.

**2-** Di helbesta we xwendî de, ev taybetmendiyên li jêr hatine diyarkirin?

- ❖ Bi şêweyê malik û rêzikan hatiye nivîsîn.
- ❖ Her rêzek bi tîpa mezin destpêkiriye.
- ❖ Bi pîvana kiteyan hatiye nivîsîn.
- ❖ Li dawiya rêzikan dengên lihevhatî hene.

Ji helbestên bi jimarek diyar yê kiteyan hatiye nivîsîn re helbestên bi **pîvan** tên gotin.

**3-** Malik li gor jimara rêzikên xwe tê binavkirin.

Ji ber ku helbesta we xwendî, ji dû rêzikan pêkhatiye, em jê re dibêjîn **cotik**.

We helbestek ji neh malikan pêkhatiye xwend.

## RÊZIMAN

**Hevalkar di warê erkdariya xwe de dibin pênç beş:**

**1- Hevalkarên demî:**

*Ew hevalkarên di hevokan de, di warê dem de bandorê li karê (kinrinê) yan li saloxê bikin jê re* ***hevalkarên demî*** *tê gotin.*

**Mînak:**

- **Îro** ez çûm dibistanê.
- Îro (hevalkara demî ye)
- **îro** ew nexweş e.

Ji bo hevalkarên demî bê dîtin, ji kirinê, pirsên “kengê, çi dem” tên pirsîn û hevalkarên demî diyar dibin.

**2- Hevalkarên cih û ber:**

*Ew hevalkarên ku cih û berê karê (kirinê) di hevokan de diyar dikin jê re* ***hevalkarên cih û ber*** *tê gotin.*

**Mînak:**

-Tu **paşve** ziviri.

Ji bo ku em bikarin hevalkarên cih û ber, di hevokê de peyda bikin, pêwîst e em pirsa “ji kuve, li kuderê ” ji karê bikin.

- Pez bi **kuve** çû?
- **berbi jorve** (hevalkarê cih û ber).

**3- Hevalkarên rewşî:**

*Ew peyva ku di hevokê de, çawaniya kirina kar diyar dike jê re* ***hevalkarên rewşî*** *tê gotin.*

**Mînak:**

Ez **hêdî hêdî** çûm.

Ji bo ku em bikarin hevalkarên rewşî di hevokan de peyda bikin, pêwîste em pirsa **“çawa”** ji kirinê bipirsin.

Çawa çûm?

**Hêdî hêdî** (hevalkara rewşî).

**4- Hevalkarên çendî:**

*Ew peyva di hevokan de, wateya karê (kirin) di warê, çendî de diyar dikin jê re **hevalkarên çendî** tê gotin.*

**Mînak:**

Ji dibistanê **gelek** hez dikim.

**Çiqas** jê hez dikim?

**Gelek** (hevalkara çendî).

Ji bo ku em bikarin, di hevokan de hevalkara çendî bibînin, pêwîst e pirsa **"çiqas, çend"** ji karê bikin.

**5- Hevalkarên pirsyarî:**

*Ew peyva di hevokê de, bi riya pirsan wateya kirina karan temam dikin jê re **hevalkarên pirsyarî** tê gotin.*

**Mînak:**

**Çiqas** kar dike?

Pirtûk **çawa** xwend?

Peyvên jêr di nav hevokê de weke hevalkarên pirsyarî bi karbînin.

çawa, kengê, çiqas, çend, ji ku ve û li kuderê.

## HÎNDARÎ

**1-** Tîpên di zimanê me de heyî bi şêweyê dest nivîs li lênûsa xwe binivîsin.

**Gir:**

**"A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z"**

**Hûr**

**"a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z"**

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ


- **Dema nivîsînên pexşan dinivîsînin bêhtir dikarîn hestên xwe bînin ziman.**
- **Hûn dizanin jînama kê tê nivîsandin?**
- **Peyvên dibin hevalkar di hevokê de bandorê li çi dikin?**

# JÎNAMA RÊBER APO

Rêber Apo di 4’ê Nîsana sala 1949’an de li gundê Amara a girêdayî navçeya Xelfetî ya Rihayê, di malbatek asayî de ji dayîkbûye. Navê bavê wî Emer, navê dayîka wî jî, Ûveyş e. Malbata Rêber Apo, ji heşt kesan pêktê. Sê xwîşk û dû birayên Rêber hene.

Rêber Apo, xwendina xwe ya seretayî li Cibînê destpêkiriye û qedandiye. Wê demê jî Rêber; ji zarokan re Rêberî dikir. Zarok kom dikirin û dibirin çolê, bi hev re çûk digirtin û çûkên girtîn, li wan belav dikir. Li hemberê zarokên nehedirî jî xwediyê seknekê bû. Mamosteyê wî Ferhat TURGA ji ber jîrbûn û zîrekiya wî gelek jê hez dikir û ji bo xwendina xwe berdewam bike hewl dida. Piştî dibistana seretayî qedand, li Nîzîpê li mala xalê xwe dest bi dibistana navîn kir û li wê derê dibistana navîn bi dawî dike. Bavê wî ji ber rewşa hejariyê nedixwest dibistanê berdewam bike. Lê dîsa li ser xwesteka mamosteyên wî, tevlî ezmûna Tapû Qadastro dibe û di nav 20 hezar xwendevanên tevlî ezmûnê bûyîn de, Rêbertî di rêza 18'mîn de ezmûnê serkeftî derbaz dike. Piştî qedandina dibistana Tapû Qadastro, li Amedê dest bi karmendiyê dike. Piştre tevlî ezmûnên zankoyê dibe. Di sala 1970’an de Zankoya Dadi ya li Stenbolê qezenc dike û li wê derê hem dixwîne hem jî karmendiya xwe berdewam dike.

Di sala 1971’an de dîsa tevlî ezmûnên zankoyê dibe. Vê carê Fakulteya Zanistên Ramyarî ya li Enqerê qezenc dike. Li wê derê dû salan xwendina xwe berdewam dike. Di wê demê de têkîliyên xwe bi tevgerên çepgir re çêdike.



Di yekemîn salvegera şahadeta Mahîr ÇAYAN û hevalên wî de (1972) ji ber ku Rêber Apo pêşengiya xwepêşandana protestoyî dike, tê giritin û 7 mehan di girtîgeha Mamakê ya girêdayî Enqerê de dimîne. Di zindanê de digihe wê baweriyê ku bi rêbaza riya wan çepgiran, wê tiştek neyê bidestxistin û biryara sazûmankirina rêxistinek nû digire. Piştî ji zindanê derdikeve, di sala 1973'an de dest bi xebatên vê rêxistinê dike.

Rêber APO di dilê xwe de, mirov perweriyek mezin; vîna gel, vîna welat dihilgire.

Hedara wî li hember zordarî û sitemkariyê ne dihat. Wî gelek ji gelê xwe û mirovahiyê hes dikir. Ji ber Kurd bûna xwe pir serbilindi bû. Ti cara karkirina ji bo gelê xwe bes ne didît, hêj zêdetir dixwest kar bike. Wî dixwest nakokiyên di nav gel de bên çareserkirin, bi taybet nêzîkbûnên li beramberî jinê, yên kevneperestî werin derbazkirin û sererastkirin. Gotinên wî yên hezkirina jiyanê, hezkirina wî ya li hemberî mirov, gel û welat baş dide diyarkirin.

"Mirovên bindest û bêvîn nayên heskirin. Azadiya jinê, azadiya civakê ye."

Bi vê boneyê bi çend xwendevanên zanko yên Kurd û Tirk re biryara damezrandina rêxistinekê dide. Ev civîna destpêkê di sala 1973'an de li Bendava Çûbûq ya li Enqerê pêktê.

Ji bo pêşxistina xebatên şoreşgerî û lêkolênkirina rewşa gelê Kurd, Rêber Apo di sala 1977'an de berbi bajarên Kurdistanê ve gerekê pêktîne. Di dawiya vê gerê de yek ji rêberên komê, hevalê Hakî KARER di 18'ê Gulana 1977'an de li Dîlokê ji aliyê Stêrka Sor ya girêdayî dewletê ve, tê şehid xistin. Hevalê Hakî di nav rêxsitinê de kesayetiyekî girîng bû. Rêber Apo ji bo bîranîna şahadeta Havalê Hekî KARER, biryara damezrandina partiyê dide û xebatên partîbûnê dide destpêkirin. Ji ber vê sedemê di 27'ê Mijdara 1978'an de, li gundê Fîsê girêdayî navçeya Lîce ya Amedê Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) dide damezrandin.

## PEYV

**Tapû Qadastro:** Saziya tapûkirina zeviyan.
**Xwepêşandan:** Rêpîvan, meş.
**Mamak:** Navçeyek ya Enqerê.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**Hêmaya neynok (donik) (“ ”)**

**a-** Dema ku gotin ji kesekî din bê girtin, di nav hêmaya neynokê tê bikaranîn.

**Mînak:**

Rêber APO dibêje: “Dîrok, di roja me de, em di kûrahiya dîrokê de veşartîne.” Li ser wê hêmaya neynokê ya ku di hevokê de hatî bikaranîn baldar bin.

**b-** Ger tû bixwazî peyvekî weke taybet bidî diyarkirin, wê di nava hêmaya neynokê de bikartînî..

**Mînak:**

Di dîroka Têkoşîna Azadiya Kurdistanê de, cihê “Zîlanan” girîng e.

Hin caran jî, ew peyv bi rengîntir tên nivîsîn, yan jî binê wan tê xêzkirin.

***HÎNKARÎ***

1- Rêber Apo kengê û li kuderê ji dayîkbûye?
2- Cara yekem ji ber çi sedemê Rêber APO ket zindanê?
3- Taybetmendiyên Rêber Apo bi rêzê ve li lênûsa xwe binivîsin.

## CÛR Û AWÊN

Ji wan nivîsên jiyana kesekê didin diyarkirin re **jîname** tê gotin.
a- Cih û demê ku lê dayîkbûyî.
b- Mercên dema ku tê de jiyan kirî.
c- Rewşa perwerdê.
d- Kar û xebatên ku di nav de cih girtî.
e- Hemû taybetmendiyên kesî.

## RÊZIMAN

**1-** Hevalkarên di hevokên jêr de hatine bikaranîn diyar bikin û beşên wan bêjin.
Wan îro pirtûk bilez xwendin.
Me karê mal kêm çêkir.
Xwendekar kengê hatin?
Hevalê Hozan berjêr çû.

**2-** Hûn jî komek hevalkaran di nav hevokan de bikarbînin.

## HÎNDARÎ

**1-**Hûn jî jînameya pakrewanekî binivîsin û di refê ji hevalên xwe re bixwînin.


**2-**Mijara jêr hûn jî bi dest nivîsê, li lênûsa xwe binivîsin.



**"Azadiya jinê, azadiya civakê ye."**
**"Yên şer dikin azad dibin, yên azad dibin xweşik dibin, yên xweşik dibin tên hes kirin."**
**Rêber APO**

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **Mijara me ya bi navê çand, ji ber ku nivîskar nêrîna xwe palvedaye ramanên xwe nivîsandinek ramanî ye.**






# ÇAND

Çand, dikare bi awayekî giştî weke yekparebûna tevahiya watedayîn û avahiyên civaka mirov, di pêvajoya dîrokê de pêk aniye, bide naskirin. Ev pêkhateyên ku pêk hatine, weke tevayî saziyên ji veguherînê re vekirî, didin naskirin. Mirov dikare watedayînê bi awayekî dewlemend, di asta naverok û saziyên vediguherîne de bide naskirin. Em bi mînandinekê dikarin baştir bidin naskirin. Mirov dikare avabûnê weke pêkhateya heyberî, rewaniyê jî weke zagona wê ya bihizir, bihîs û naveroka wê ya berbiçav ku dilivîne, diyar bike.

Di çerçoveyek teng de jî têgeha çandê tê pênasekirin. Em hewl didin çandê zêdetir weke wate, zagon avahiyê û zindîtiyê diyar bikin. Dema em dabaşa civakê dikin, di çerçoveyek teng de çandê, weke cîhana wateyê ya civakê, qanûna wê ya exlak, zihin, hûner û zanista wê pênase dikin. Di vê çerçoveya teng de saziyên siyasî, aborî û civakî dibin yek. Di çerçoveyek berfireh de danasîna giştî ya çandê tê kirin. Yan jî li ser vî bingehî weke naverok û sazî wateya xwe hebe, mirov dikare weke hebûn dabaşa civakê bixwe bike. Ger bi tenê dabaşa civaka sazî yan jî watedayînê were kirin, têra xwe mirov pê dixape. Ger civakek têra xwe gihiştibe asta sazîbûn û watedayînê, dikare weke hebûn bibe xwedî nasname û bê binavkirin.

Her wiha têgihîna ziman jî têkiliyek xurt, bi têgihîna çandê re heye. Di çerçoveyek teng de ziman bi awayekî bingehîn têgihîna sereke ya qada çandê ye. Di çerçoveyek teng de, mirov dikare ziman weke çandê jî bide naskirin. Ziman danheva civakî ya zîhnî, exlaq, hîs û fikra estetîkek ku civakê bi dest xistiye; ziman hebûna nasname, zihnî ya wate û hîsê serwextbûnê ye.

Watedayîn û sazîbûn hîmek bingehîn yê çandê ye, asta pêşketina çandê, asta pêşketina hemû tiştên civakê ye. Nexwe tê xwestin em li ser çandê hîn zêdetir bixwebitin û pêşbixin.

## PEYV

**Yekpare:** Giştî, giştîbûn
**Pênase:** Danasîn
**Zihîn:** Kêrhatinên hizrî
**Çerçove:** Dorbend

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Hêmaya pirsê di rewşên pirsyarî de tê dîtin.

**1-** Hêmaya pirsê li dawiya hevokên pirsyarî tên bikaranîn.

**Mînak:**

Gelo ma ji serxwebûnê xweştir tiştek heye?

**2-** Hêmaya pirsê di nav kevanokê de danîn, gûman, henek û biçûk kirinê dide diyarkirin.

**Mînak:**

Zerdeşt pêxember Bz. 610 (?) hatiye cîhanê.

**3-** Dema dû hevokên pirsyarî li pey hev tên, li dawiya hevoka dawî tê bikaranîn.

**Mînak:**

Ev mirov çima li virin, çi dixwazin?

## CÛR Û AWÊN

*Ji cûre nivîsandinên di derbarê mijarek diyar de li gor hizir û ramanê rave dike, zansitê li dora bûyerê kom dike jê re **ramanî** tê gotin.*

## RÊZIMAN

Ew karên ku ji dem û kesî tên qutkirin, pêveka jêderî li ser tê zêde kirin û weke nav tên bikaranîn re **jêder** (rader) tê gotin.

Jêder, ji peyvekê sade û pêveka jêderî pêk tên.

**Mînak:**

| **Peyva xwerû** | | **Tîpa siwar** | **Pêveka jêderî** | **Jêder** |
|---|---|---|---|---|
| **çû** | + | **y** | **în** | **çuyîn** |
| **girt** | + | | **in** | **Girtin** |
| **hat** | + | | **in** | **hatin** |
| **Kir** | + | | **in** | **kirin** |

## HÎNDARÎ

**1-** Hûn jî gor hizirê xwe, cûre nivîsînek ramanî binivîsin.

**2-** Kurte mijara jêr bi dest nivîsê binivîsin.

Em hewl didin çandê zêdetir weke wate, zagon avahiyê û zindîtiyê diyar bikin. Dema em dabaşa civakê dikin, di çerçoveyek teng de çandê, weke cîhana wateyê ya civakê, qanûna wê ya exlak, zihin, hûner û zanista wê pênase dikin. Di vê çerçoveya teng de saziyên siyasî, aborî û civakî dibin yek. Di çerçoveyek berfireh de, danasîna giştî ya çandê tê kirin. Yan jî li ser vî bingehî, weke naverok û sazî wateya xwe hebe, mirov dikare weke hebûn dabaşa civakê bixwe bike.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **Mijara me ya bi navê "Kêvroşka Xapînok" ji ber ku bûyerek di navbera tebayan de çêbûye dide diyarkirin, metelok e.**



# KÊVROŞKA XAPÎNOK

Şêrekî, li derdora Dêrsimê daristanek, ji xwe re kiribû cihê nêçîrê. Her roj çend ji wan tebayên, di nav daristanê de digirtin û dixwarin. Lê belê heya hinek digirtin, gelek ji wan yên din jî ditirsandin û bêzar dikirin.

Li ser vê çendê tebayan biryar girtin û gotin:

- Şûna em her roj di nav vê tirsê de bijîn, li gor çarenûsê emê pişkê bikişînin. Yê ku pişk lê bikeve emê wê ji şêr re rêbikin.

Hemuyan bi hev re ev biryar erê kirin, şêr jî bi vê biryarê dilşad bû, bi vî awayî her roj pişk, li kê biketa ji şêr re rêdikirin. Ji bo demekê aramî û xweşî hatibû nav daristanê.

Rojekê pişk li kêvroşkê ket. Kêvroşkê nedixwest giyanê xwe yê şîrîn, bi erzanî bide. Ji hevalên xwe re got:

- Xapek dikeve mejiyê min, ger ez serbikevim, ezê we tevan jî ji zordariya şêr rizgar bikim.

Qasî dema xwarinek dereng bimîne, bi şûn ve ma. Dema birçîbûna şêr gihişt pileya dawî, ji hêrsbûnê dûvê xwe li xakê dida, ditewand û gurz dikir. Di vê demê de kêvroşk bi xurûşeke xapînok hat pêşberî wî û got:



- Mezinê min, îro pişk li kêvroşkekî mîna min ket. Dema ku min dixwest ez wê bînim cem we, ez rastî şêrê din yê li ser bîrê hatim, dixwest nesîbê we bibe. Her çiqas min jê re got; "ew bi taybet yê mezinê tebaya ne jî dev jê berde ku ji we bitirse, bela xwe ji kêvroşkê veke, lê mixabin dijî we gelek gotinên giran jî gotin.

Dema şêr ev gotin bihîst, hêrs û kîna wî pir zêde bû û got:

- Nîşa min bike, ka ew bêrêz li kuye? Ezê hedê wî jê re bidim diyarkirin.

Kêvroşk ket pêşiya şêr, bir ser bîrek kûr ya herêmê û got:

- Belê mezinê min, ew di vê bîrê de ye.

Dema wisa ji şêr re got, şêr li bîrê temaşe kir. Di vê demê de kêvroşk jî di nav lepên şêr de li bîrê temaşe dikir. Bawer kir ku ev siha wî ya di avê de şêrê dijber û siha kêvroşkê jî ew kêvroşka ku jê re hatiye şandine. Yekser xwe avêt bîrê, xeniqî û mir. Tebayên din yên di daristanê de ji zordariya wî azad bûn.

## PEYV

**Pişk:** Par
**Eşkere:** Diyar
**Hêrs:** Kîn
**Çarenûs:** Qeder
**Xap:** Hîle, fêl

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

1- Di mijara borî de me dabû diyarkirin ku hêmaya xêzik di nav xwe de dibe çar beş. Dema em bala xwe bidin mijara jor, emê hinek ji wan xêzikan bibînin ku ka çawa hatine bikaranîn. Belê di mijarê de xêzika axaftinê hatiye bikaranîn.

Dema kesek dest bi peyvînê dike, ji beriya peyvîna wî dest pê bike, xêzika axaftinê li pêşiya peyvîna wî tê bikaranîn.

**Mînak:**

Kêvroşk ket pêşiya şêr, bir ser bîrek kûr ya herêmê û wiha jê re got:

- Belê meziné min, ew di vê bîrê de ye.

**2-**Dema em ji hevoka li jor hatiye bikaranîn bêhnokê rakin, wê guhertinek çawa di wateyê de çêbibe?

## PIRS

1-Şêr biryara tebayan çawa nirxand?
2-Dema pişk li kêvroşkê dikeve, çi dike?

## CÛR Û AWÊN

Mijara we li jor xwendî, metelok e.

*Ji wan cûre nivîsên ku nebûyî û ne pêkanî bûyînê ne û lehengên wan lawir, jê re **metelok** tê gotin.*

Mijara we xwendiye meteloke û lehengên wê teba (Şêr û kêvroşk) in.

Ev cûrê nivîsînan tim şîretekê ji bo mirov pêşkêş dikin.

**Metelok bi dû awayan tên nivîsîn:**

**a-** Meteloka pexşan
**b-** Meteloka hûnandî

## RÊZIMAN

**Kar:** Peyva ku hevok li ser tê avakirin, bar û girîngiya hevokê radike kar e. Ev endam di hevokê de ya herî girîng e.

- Kar ji jêderan (rader) tên kêşan.
- Kirina kar, dem û kesan didin diyarkirin.
- Kar, kirina karê kirekê dide diyarkirin.

**Mînak:**
Ji jêdera **"hatin"**
Hatim, hatî, hatiye, hatibû, dihat, wê bêm, têm.

## HÎNDARÎ

Li ser rewşa tebayan, we nivîsandinek bi wate xwend. Armanca ji van nivîsandinan, wane dayîna mirovan û balkişandina ser mijarekî ye. Metelokên we ji mezinên xwe bihîstîn, yên ku ser tebayan û lehengê wê ji tebayan pêkhatiye binivîsin û sergotarekê ji wê re danin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**Li jêr helbestek li ser evîna welat tê ziman, helbestek çawa tê lêkolîn kirin; hûnê fêr bibin.**

- **Li gor we mirov çima ji welatê xwe hes dike?**
- **Ma tenê hûn ji cêwaziya xwezayi ya welatê xwe hes dikin? Ev bese yan ne?**

# WELAT


Qurbana teye giyanê min,
Li ser te dirije xwîna min.
Mîna buhişta welatê min,
Ji bo te sed cara qurban im.

Bihar zindî dike miriyan,
Dilan de nahêle çi goman.
Kalên min danga te de razan,
Ji bo te sed cara qurban im.

Bi rûmet qasî dayîka min,
Şîrîntir ji tev zarokên min.
Tu yî viyana jiyana min,
Ji bo te sed cara qurban im.

Ev robar, ew çiya û ev bax,
Ji ku tê ev ciwanî û şax.
Ji evînê re bûyî qonax,
Ji bo te sed cara qurban im.





## PEYV

**Viyan:** Hezkirin
**Şax:** Çiya
**Dang:** Daw

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**Xêzika Xwar:**

**1-** Ev hêmaya ku di nav yên berê de cih nagire, di roja îro de, di nav berhemên zanistî de pir tên bikaranîn. Ji ber wê pêwîst e mirov wê nas bike.

**a-** Dema rêzikên di bin hev de pêwîst e bên nivîsîn lê tê xwestin li rex hev bên danîn, di navbera wan de xêzika xwar tê bikaranîn.

**Mînak:**

Bi rûmet qasî dayîka min/Şirîntir ji tev zarokên min.

**b-** Di navbera dîrokan û navnîşanan de tê bikaranîn.

**Mînak:**

10/07/2013
Çîya serbest
Kolana azadî/jimar: 72/24
Heskîf/ÊLIH

**2-** Peyvên jêr hatine dayîn di nav hevokan de bikarbînin.

Robar, çiya, bax, ciwanî û şax

## PIRS

**1-** Çima helbestvan dixwaze sed cara ji welatê xwe re bibe qurban?

**2-** Nivîskar, di malika duwem ya helbestê de li ser kîjan aliyê welat radiweste?

## CÛR Û AWÊN

Di mijarên borî de qafiye û beşên qafiyê me dabûn diyarkirin.

**Hûn fêr bûbûn qafiye dibe çar beş:**

**1- Qafiya Lewaz:**

*Wekheviya dengekê (tîpek dengdar) li dawiya rêzikên helbestan tê dubarekirin re **qafiya lewaz** tê gotin.*

**2- Qafiya Tam:**

*Wekheviya dû dengên li dawiya rêzikên helbestan tên dubarekirin re **qafiya tam** tê gotin.*

**3- Qafiya dewlemend:**

*Wekheviya sê deng û zêdetir dengên li dawiya rêzikên helbestan tên dubarekirin re **qafiya dewlemend** tê gotin.*

**4- Qafiya Hevdeng (Cînas):**

*Wekheviya peyvên di dengên xwe de wekhev lê di wateya xwe de cûda, yên li dawiya rêzikên helbestan tên dubarekirin re **qafiya hevdeng** tê gotin.*

## RÊZIMAN

**Sê demên bingehîn hene:**

**1- Demê borî:**

Demê borî; karekî, bûyerekî ya di demê borî de hatî kirin dide diyarkirin.

**Mînak:**

Xwar, xwariye, xwaribû, dixwar.

**2- Demê Niha:**

Demê niha kar û bûyerê destpêkiriye, hîn bi encam nebûye û berdewam e.

**Mînak:**

Dixwim, dixwî, dixwe, dixwin

**3- Demê Bê:**

Demê bê; kar û bûyerên nû çêbibin, dide diyarkirin.

**Mînak:**

Wê bixwim, yê bixwî, dê bixwe, dê bixwin.

**Têbînî:** Pêvekên demî ev in: “dê, wê, di, ye, bû.”

# MIJARA SETBEST

## ZANIST Û TEKNOLOJÎ

Zanist, beşekî hizrînê ye. Ji destpêka mirovahiyê heya niha, hebûna xwe domandiye û xwe pêş xistiye. Teknolojî jî, di encama pêşketina zanistê de derketiye holê. Ji bo vê mirov dikare bêje, ew amûrên ku mirovên berê jî bikaranîne, dikevin beşê teknolojiyê.

Zanist, têgehek ya sazûmaniyê ye ku gerdûnê yan jî beşek bûyerên gerdûnî digire nava xwe. Rêbazên ceribandinê, zagonên wê yên bingehîn in . Lê, teknolojî çengek yê zanistê ye ku şêwaza çêkera pîşesazî, bikaranîna amûr û cîhazan digire nava xwe.

Teknolojî xwe dispêre zanistê. Teknolojî, di sedsalên dawî de bûye navendek ya cûre kirina, pêkanîna zanistan. Pîşesazî bilez xist, hilberîn zêde kir, bandorek mezin li ser civak û mirovan kir.

Di encama pêşketina pîşesaziya çewt de, li welatê me, ji gundan ber bi bajaran ve koçberiya çêbûyî, bû sedemê zêdebûna şêniya bajaran. Vê rewşê hişt ku civak ji rastiya xwe dûr bikeve, li şûna taybetmendiyên xwezayî taybetmendiyên çêkirî pêş bixe.

Her wiha bû sedem ku hevsengiya di navbera gund û bajaran de têk biçe, berhemên civakê kêm bibe û di çandê de jî qirkirinek mezin pêş bikeve.




## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **We carnan guhdarî velorîna destanan kiriye, ger we guhdar kiribe, vegotina wan li xweşa we çûye? Çima?**
- **Niha hûnê li jêr mijara destana Xanê Dimdim bixwînin, hewl bidin ku tevahi ya destanê têbigihin.**

# XANÊ DIMDIM



Xano got:
"Kuro, qet xwe qels nekin,
Heya we tê, hûn bi kêf şer bikin.
Lêxin metirsin ji mirinê,
Navê Kurdan bimîne dinê."
Li hev ketin tîr, rim û nize,
Bûye hewar û bû hêwirze.
Mêrxasên Xano hindik û kêm,
Di nav cengê de dêm dane dêm.
Xwîna wan rijî û hat xwarê,
Wek ava çemên derbiharê.
Dimirin bi mêranî û Kurdî,
Li ber destê Şah nabin girtî.
Wextê Şahînşahê maldarî,
Qure, pozbilind û kubarî.
Xwe bi kelê re digihîne,
Da ku talanê jê hilîne.
Belav bike li ser serbazan,
Xişir, mal û hebûn, jin û qîzan.
Dayîka Xanê Çengzêrî ne,
Haya wê ji hişê xwe nîne.
Stiya bûka xwe hiltîne,
Serbanê kelê dibe tîne.

## PEYV

**Kelê:** Kelh
**Xişir:** hêsinê Sertûjê ji bo cengan tê bikaranîn.
**Serbazan:** Serleşker
**Dêm:** Rû
**Rim:** Amûrekê ji bo şer tê bikaranîn.
**Nize:** Mertal
**Qels:** Bêxêr, bêkêr, lewaz

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**Cotxal (:):** Hêmaya daxuyaniyê ye.

**1**- Dema di derbarê darezanekê de daxuyanî bê dayîn, tê bikaranîn.

**Mînak:**

Xano got**:**
- Kuro, qet xwe qels nekin,
Heya we tê, hûn bi kêf şer bikin.
Lêxin metirsin ji mirinê,
Navê Kurdan bimîne dinê.

**2-** Li pêşiya mînakên di derbarê mijarekê de, cotxal tên danîn.

**Mînak:** Tîpên deng kurt: **"i, e, u"**

### PIRS

1- Sedemê banga Xano çi bû?
2- Ciwanên Kurd çima dîlîtî nepejirandin?
3- Mêrxwazên Xano çi kirin?
4- Hûn jî destana Xanê Lepzêrîn lêkolîn bikin. Parçeyekê bala we kişandî binivîsin.

## CÛR Û AWÊN

**1**-We parçeyek ji destana Xanê Lepzêrîn xwend. Tê de lehengiya ciwanên Kurd û Xanê Lepzêrîn tê dîtin. Di vê destanê de mirov, rewşa jiyana civaka Kurd ya wê demê nasdike.

Destan, berhemê herî kevnar yê civaka ne.

*Ew berhemên di xiyalên gel de şopên kûr hêlayî, lehengî û bûyerên girseyî, şîrove dikin û di bin bandora qafiyê de mayî re* ***destan*** *tê gotin.*

Destan, berhemên çand û jiyana gelan ya hevpar e. Destan bihêza xiyalî ya gel dewlemend dibe, digihe û pîşt re jî, ji aliyê nivîskarekê ve tê berhevkirin. Bi vî awayî destanên xwezayî derdikevin holê, carnan jî hozanek li ser dihizire û dikare binivîse.

**2**-Destan ji demên kevin de bi awayekî xwezayî, ji aliyê civakê ve bi rengê stiran û beyt, nifş bi nifş hatiye, heya gihiştiye roja me.

## RÊZIMAN

Weke di mijara jor de jî hatiye dabaş kirin, dema pêveka dem û kesî dikeve li ser beşê navdêran dibe salox. Ew jî weke karan demê kesî nîşa dike û bi serê xwe dikare bibe hevok.

**Mînak:**

| Beşên navdêran | Pêveka dem û kesî | salox |
|---|---|---|
| Rewşenbîr | e | Rewşenbîr e |
| Rewşenbîr | in | Rewşenbîr in |
| Rewşenbîr | bû | Rewşenbîr bû |
| Rewşenbîr | bûn | Rewşenbîr bûn |

## HÎNDARÎ

**1-** Ji bo hûn spartinê nepejirînin pêwîst e çi bikin? Bêjin.

**2-** Hûn jî li ser lehengiya gelê Kurd nêrina xwe bînin ziman.

**3-** Nivîsandina li jêr bi destnivîs binivîsin.

Lêxin metirsin ji mirinê,
Navê Kurdan bimîne dinê.
Li hev ketin tîr, rim û nize,
Bûye hewar û bû hêwirze.
Mêrxwazên Xano hindik û kêm,
Di nav cengê de dêm dane dêm.
Xwîna wan rijî û hat xwarê.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **Mijara me ya bi navê “Şivaniya Min” ji ber ku bûyerek çêbûyî ye dide diyarkirin serpêhatî ye.**
- **Hûn dizanin serpêhatî xurûşê bi mirovan re dide peydakirin.**

# ŞIVANIYA MIN

Ev serpêhatî nivîskar li ser rewşa xwe ya hejari ya di zarokatiya xwe de, jiyankirî û bêkesiya xwe nivîsiye.

Min derbazkiriye ku çawa dê û bavê min serê xwe danîne û li ber destê jinbira û xwîşka xwe mame. Lê pir caran li cem xwîşka xwe bûm. Carnan diçûm xwendinê lê çi xwendin!

Çil pezek yê mala xwîşka min hebûn. Hin pezê cîranan jî dixistin nav colikê pezê min. Carnan jî ez bêkar dimam. Min ji xwe re komek ji zarokan çêkiribû. Em diketin rezê Amûdiyan û me gindor û zebeş didizîn.

Carekê em ji diziya werz dihatin û li ser xanî dûvpişkekî bi min ve da. Min deng li xwîşka xwe kir ku min derman bike. Lê xwişka min got:

- Wey Xudê bike koremarek bi te ve bide! Ma tu li çi digerî?



Carekê em li ber pez bûn, çend gur hatin me; zivistan e, berf ketiye, me bi kefikên kopalan li ser pezê xwe vedigerandin. Lê li pey me hatin, ta nêzîkî gund, kevir di nav berfê de dihatin xuya kirin, lê min berf dikir golat û bi kevirkanî, li guran wer dikir. Carekê şeş-heft pez li çolê zan, min nekarîbû-nezanîbû çawa ezê van berxikan hilgirim. Pezê min êriş kire nav ziyanê xelkê. Xwediyê dexlan hate û gotinên nexweş ji min re gotin. Lê çawa ez naskirim, got:

- Hey Xudê nehiştî! Çawa te pez berdaye nav ziyanên gundiyan?

Ez giriyam û min got:

- Ez nikarim vegerînim. Ev qas berx di stûyê min de ne.

Mêrik hat, tev xist nav ebayê min û got:

- De bide serê xwe. Paşê keniya û got:

- Te hêj şivanî nekiriye. Pêwîst e berx hemû li şûna wan bihiştana. Pezê xwe li wan vegeranda ta ku bêrîvan bihatana.

Dema min diziya gundiyan dikir, ji ber ku xelkê Amûdê bavê min nasnedikirin, dujûn ji mêrê xwîşka min re dikirin. Lê xwîşka min ji bavê min re vedigerand û digot:

- Ya dê ji bavê wî re bidin! Çima ji mela Xelîlê reben re dibêjin? Carna diçûm mizgeftê ku bixwînim lê me ji xwe re henek dikirin û min çavê xwe digirt û digot:

- Filan mirov buhiştiye û filan kes wê here dojehê. Hin zarok digiriyan û hin bi min dikeniyan.

**Cegerxwîn**

## PEYV

**Kefik:** Ji cihê çemandî yê kopal re dibêjin.
**Colik:** Bire pezê biçûk.
**Werz:** Cihê gindor û zebeş lê tên çandin.
**Amûd:** Navçeyek ya bajarê Qamişloyê ye.

## PIRS

1- Gelek caran hebûnên, xwezayê bi reng dikin hene, ev rewş keyfa mirovan xweş dikin. Di mijara we xwendî de hûn rastî tiştek wiha hatin? Vekin.
2- Çima nivîskar şivaniyê dike?
3- Dema nivîskar li cem xwîşka xwe tişta li xweşiya wî nediçû, çi bû?

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**Baneşan (!):**

**1-**Li pişt peyv yan birepeyvên ku hestên mirovan şiyar dikin tê danîn.

**2-**Dema tû bixwazî balê bikişînî li ser peyv yan hevokekî, jî tê bikaranîn.

**Mînak:**
Carnan diçûm xwendinê, lê çi xwendin!
Hey bextê xirab! Ev koçberî ji mirinê nexweştir e.

**3-** hêmaya baneşanê piştî alavên bangkirinê yên hezkirin û tirsê diyar dikin tê danîn.

**Mînak:**
Ax! Çi welatekî xweş, mîna buhiştê ye.
Hewar e! Agir bi malê ket.

**4-** Ji bo henek û biçûk xistina tiştekî tê bi karanîn.

**Mînak**:
Bibezin, bibezin! Kavirên bazirganan hemû ji serma qerisin!

## RÊZIMAN

***1-*** *Ew peyvên ku bêwate; lê di nav hevokê de watedar dibin, jê re* ***alav*** *tê gotin.*

**Beşên alavan ev in:**

a- Alavên bangî
b- Alavên gihanek (girêdan)
c- Alavên mercî
d- Alavên sedemî
e- Alavên daçekî
ê- Alavên pirsyarî

**a- Alavên bangî:**

Ew cûrên alavan ku bang li kes yan kesan dike û carna dubare tê bikaranîn.

**Mînak:**

Egîd derket ser banê xanî û bang kir; hewar e hewar e! Gundîno! Neyaran talanê me birin.

**Of;** ji bo pêhesîna bêzarbûn û nexweşiyekê tê bikaranîn.
**Wax;** ji bo hestên mixabiniyê tê bikaranîn.
**Wey;** ji bo hestên bêzarbûnê bidin diyarkirin, tê bikaranîn.
**Wa;** ji bo bankirina hestiyariyê tê bikaranîn.

**b- Alavên gihanek (girêdan):**

Ger peyvên **“ku, û, yan, hem, jî”** dema em ji navbera peyv û hevokan rakin, zêde wateya wan xira nake, lê belê bi rakirina wan re girêdana wan bi hev re nayê çêkirin. Bi vi awayî têkiliyên wan yên di hêla wateyê de, bi hev re lewaz dibin, ji bo têkiliyên di navbera wan de çêbibin, tên bikaranîn.

**Mînak:**

**û:**
Hizirîn **û** qîr li hev nayên.

**ku:**
Şerê **ku** ji bo azadiyê têkirin pîroz e.

**jî:**
Ez çûm dibistanê, ew **jî** hatibû.

**lê (lê belê):**
Me wane nivîsî **lê** baş nehat xwendin.

**Yan yan:**
**Yan** here **yan** jî neçe.

**Hem hem**
**Hem** dimeşe **hem** stirana dibêie.

## CÛR Û AWÊN

**1**- Hûn serpêhatiyan nas dikin? Ger hûn nas bikin, hûn jî serpêhatiyekî binivîsin.

**2**- Lehengê serpêhatiya we nivîsî bidin diyarkirin.

## HÎNDARÎ

**1**- Dema hûn vê mijarê dixwînin, hezkirina we ji bêkesan re zêde dibe? Bi awayekî devokî bêjin.

**2**- Di vê serpêhatiyê de bûyera herî bala we kişandî çiye û çima?

# NAME

Hevalê min yê birêz;

Piştî min nameya te, bi rondikên hezkirinê şil kir, wijdana xwe bi rondikên bextewariyê şûşt...

Girîngiya we dayî xemrevandina hevala xwe, pêgirên we dayîn têgihandin; ji min re dan têgihandin ku hebûna hevalekî wek we, bi binyat û dilpaqij xweşiyek mezin e...

Hevalê minê giranbiha;

Çawa pirtûka pîroz ya Rêber Apo bûye destûra gelê Kurd, bi heman rengî gelek hêviyên min ji we hene... Hewl bide ku ev hêviyên min vala dernekevin, weke penda pêşiya dibêje: “Rojek xweşî çêtire ji hezar salên nexweşî.” Daxwaza min; tevayî xweşiyan bibin destûrên jiyana we...

Hevalê minê ku heskirina wî ji min re, ji her tiştî pêwîstir;

Ji bo ez bikarim pişt rast, dilşa û gavên nû bavêjim, ezê nameya we bixwînim. Wêrekî û kûrbûna di nameya we de, dê ji min re wêrekiyek nû bafirîne...

Hûn afrênerê xweşiya heyîne. Hewldanên min yên jiyanê ew e ku di demê pêş de bibim hevalek yê we yê baş.

Bi dest xistina diravan hêsaniye lê karekê birûmet kirin, weke avakirina cihekî pîroz e.

Hevalê minê dilovan;

Hûn û hevalên xwe dê bigihîjin armancên xwe... Ger tû vê serkeftinê daxwaz bikî, ti tişta bibe sedemê nepêkanînê nîne.

Hizirînek xêzkirî ya min jî heye. Ji beriya her tiştî, ji bo ez pêgirekê ya min jiyayî bidim diyarkirin, bermayek bi vî awayî ezê derêxim holê, xwe, gelê xwe û welatê xwe navdar bikim.

Çima ji bo tiştek bi vî awayî min biryar da?

Min di nameya xwe ya derbazbûyî de, dabaş kiribû ku ji bo derbazkirina tevayî nexweşiyan, gihandina xweşiyê neçariyek e... Dîsa ez têgihiştim ku ji tiştên heyberî, sextekarî, xapandin û (ji bo gihandina hin armancan) ji direwkirinê zewqê nastînim.

Hevalê min;

Tû dixwazî hevalê we bikene? Wê bê û vê carê bi rastî dê bê dîtin... Bi hevalê xwe re li ser mijarek bi vî awayî goftûgo kirin, çiqas şîrîn û lîstokek şanaziyê ye. Bi rêzdarî ruyê te maç dikim.

Silav û Rêz…



## PEYV

**Şanaz:** Bişans, bextiyar
**Giranbiha:** Hêja
**Pêgir:** Delîl

## PIRS

1- Di hevoka destpêka nameyê de hestê nivîskar diyar dibe? Nêrînên xwe li ser bidin diyarkirin.
2- Nivîskar gotinên hevalê xwe bi pirtûka Rêber Apo re di kîjan alî de beramber dike?
3- Li cem nivîskar tişta herî birûmet çi ye?

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**Sêxal:**
**1-** Li dawiya hevokên temam nebûyîn tê bikaranîn.
**Mînak:**
"Xwendekarên me yên dibistanê ev in: Egîd, Hogir **...**"
Ev xwendin û perwerde bi mirov çi nade têgihandin**...**
**2-** Li cihê gotinên nayên xwestin bê gotin tên bikaranîn.
**Mînak:**
Ji min re**...** anî.

## CÛR Û AWÊN

Name, berhemekî wêjeyî ya herî kevnar, dirêjî demê derketina nivîsînê dibe.

Name, ji wan nivîsînên hest, hizir û xwestekan bi kinahî ji kesek din re radigihîne.

**PLANA NAMEYÊ**

**Beşê destpêkê:** Di vî beşî de armanc bi awayê vekirî derdikeve holê û piranî kurt tê nivîsîn.


**Beşê naverok:** Tişta ku em bixwazin bêjîn, em di vî beşî de diyar dikin.

**Beşê encam:** Beşek herî kurt e, biniyaz, xwestek, evîn û silavan bidawî dibe.

**Dîrok**
**Bang..............................** → **Destpêk**

.........................................................
.........................................................
......................................................... → **Naverok**
.........................................................
.........................................................
.........................................................
.........................................................
......................................................... → **Encam**
.........................................................
............
.........................................................
.........................................................

**Zerf**



## RÊZIMAN

**c- Alavên mercî:**

Alavên mercî, mercekê di karanîna hevokê de çêdike.

**Mînak:**

**Ger** ew bê, ezê bêm.

**Heya** Rizgar neyê, ez nayêm.

**d- Alavên sedemî:**

Alavên sedemî, di hevokan de bûyerekî sedemî dide diyarkirin.

**Mînak:**

**Ji ber ku** rêkûpêkiya kar nehatibû çêkirin, kar pêk nehat.

**Ji bo** azadiyê têkoşînê dikin.

**e- Alavên daçekî:**

Alavên, di hevokê de, watedar dibin û bandorê li rewşa nav dikin jê re alavên daçekî tên gotin.

**Minak:**

Ez **di** mal **de** rûniştîbûm.

Wê pênûsê **ji** min **re** bîne.

# BIHAR

Gava dinê dibe bihar,
dibişkivin devî û dar.

Zozan têne guhartin zû,
mîna cilên bûkên ji nû.

Nêrgiz, sosin, kulîlk û gul,
direvînin xeman ji dil.

Dinya dibe wek gola şîn,
çîçek didin, sed rengî bîn.

Xasma siban berbangê zû,
tev radibin, ew teyr û tû.

Vêkra dikin şahî û saz,
hişyar dibin holik û baz.

Bilbil dibe dengbêjê wan,
dike qîrîn ji dil û can.

Pîroz dikin rojên ji hev,
hîn xweştir e biharê şev.

**Osman**





## PEYV

**Holik:** Golik
**Xasma:** Bitaybet

## EM HELBESTVANÊ XWE NAS BIKIN

Osman Sebrî di sala 1905’an de li gundê Narincê girêdayî Semsûrê ji dayîkbûye. Piştî di sala 1915’an de bavê wî diçe ber dilovaniya Yezdan. Osman Sebrî di sala 1922’an de xwendina xwe dawî kiriye.

Osman Sebrî wek kesên din yên Kurd, ji ber têkoşîna xwe bi awayê ramanî tîne ziman, gelek caran rastî êrîşên dewletê tê û bi tevayî 12 salan hatiye girtin.

Osman Sabrî di sala 1993'an de li Şamê diçe ber dilovaniya Yezdan, li gorîstana şehîdan ya li Berkevira Dirbêsiyê hatiye veşartin.

Berhemên wî:

**1-**Bahoz
**2-**Derdên Me
**3-**Çar Leheng
**4-**Diwana Helbestan
**5-**Giramera Kurdî

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Hêmayên pêwîst di mijara jêr de bikarbînin.

Çawa pirtûka pîroz ya Rêber Apo bûye destûra gelê Kurd, bi heman rengî gelek hêviyên min ji we hene. Hewl bide ku ev hêviyên min vala dernekevin, weke penda pêşiya dibêje: Rojek xweşî çêtire ji hezar salên nexweşî. Daxwaza min tevayî xweşiyan bibin destûrên jiyana we.

## PIRS

1- Helbestvan xweşikbûna biharê çawa tîne ziman? Rave bikin.
2- Gelo dibin navê biharê de nivîskar dixwaze çi bîne ziman?
3- Armanca nivîskar ji holik û baz çi ye? Vekin.

## CÛR Û AWÊN

Mijara we xwendî hûnandî ye. Bi pîvan û qafiyan ji pexşanê hatiye cûdakirin.

Hûn fêrbûbûn ku qafiya lewaz ji wekheviya tîpek dengdar ya ku li dawiya rêzikên helbestê tê dubare kirine.

**Mînak:**

Nêrgiz, sosin, kulîlk û gu**l**,
Direvînin xeman ji di**l**.

Weke di malika jor de jî tê dîtin, li dawiya her rêzikekê tîpa dengdara "**l**" hatiye dubare kirin û qafiya lewaz e.

Hûn fêrbûbûn ku qafiya tam ji wekheviya du dengên li dawiya rêzikên helbestê tê dubare kirine.

**Mînak:**

Dinya dibe wek gola ş**în**,
Çîçek didin sed rengî b**în**.

Weke di malika jor de jî tê dîtin, li dawiya her rêzikekê dengên "**în**" hatiye dubare kirin û **qafiya tam** e.

## RÊZIMAN

**Pêvek:**

*Ew parçe peyvên ku li dawî, destpêk û nava peyvê ve tê zêdekirin, di aliyê wate yan zayendî de bandorekê li ser peyvê nîşa dikin re* ***pêvek*** *tê gotin.*

**Pêvek di nav xwe dibin dû beş:**

**a-** Pêvekên sazker (paşgir û pêşgir)
**b-** Pêvekên kêşanê.

**HÎNDARÎ**

- Karekê we bi hes pêkanî, li gel sedemê wê binivîsin û ji hevalên xwe re bêjin.
- Dest xetên jêr li lênûsa xwe binivîsin.

Bilbil dibe dengbêjê wan, dike qêrîn ji dil û can.



# TESTA 2.

Lêxin metirsin ji mirinê,
Navê Kurdan bimîne dinê.
Li hev ketin tîr, rim û nize,
Bûye hewar û bû hêwirze.
Mêrxasên Xano hindik û kêm,
Di nav cengê de dêm dane dêm.
Xwîna wan rijî û hat xwarê,
Wek ava çemên derbiharê.
Dimirin bi mêranî û Kurdî,
Li ber destê Şah nabin girtî.
Wextê Şahînşahê maldarî,
Qure, pozbilind û kubarî.
Xwe bi kelê re digihîne,
Da ku talanê jê hilîne.
Belav bike li ser serbazan,
Xişir, mal û hebûn, jin û qîzan.
Dayîka Xanê Çengzêrî ne,
Haya wê ji hişê xwe nîne.
Stiya bûka xwe hiltîne,
Serbanê kelê dibe tîne.

**Her sê pirsên destpêkê li gor mijara li jor bersiv bidin.**

**1- Çima pêwîst e Kurd ji mirinê netirsin?**

**a-** Ji ber dewlemend bibin.
**b-** Ji ber xizmeta dostê xwe bikin.
**c-** Ji ber bikaribin şer bikin
**d-** Ji ber navê Kurd û rûmeta Kurdan biparêzin.

**2- Çima Şahê Îranê êrişek ew qas dijwar bir ser Xanê Lep zêrîn?**

**a-** Ji ber Xano dewlemend bû.
**b-** Ji ber Qesreke xweş çêkiribû.
**c-** Ji ber Xano ziyanek mezin dabû Şahê Îranê.
**d-** Ji ber Xano dixwest Kurd azad bijîn.

**3- Çima xwîna mêrxwazên Xano weke royê biharê dihe-rike?**
**a**- Ji ber ku direviyan.
**b**- Ji ber ku navê wan bi xirabî dernekeve, parastina kelhê dikirin.
**c**- Ji ber ku xwe dispartin Îranê.
**d**- Ji ber ku bêxem bûn.

**4- Kîjan cûre nivîsînên li jêr bi bangî dest pê dike?**
**a**- Name **b-** Bîranîn **c**- Hevpeyvîn **d**- Çîrok

**5- Di kîjan hevokê jêr de hevalnav heye?**
**a-** Gulê bîne. **b-** Gul a sor bîne.
**c-** Sorgulê bîne. **d-** Gul û Sosinê bîne.

**6- Ew hevalnavên xwerû yên ku pêveka sazker standîn û sazûmaniyek nû li hevalnavan dayîn qezençkirin re çi tê gotin?**
**a-** Hevalnavên hevgirtî **b-** Hevalnavên xwerû
**c-** Hevalnavên tûredayî (dariştî) **d-** Hevalnavên nîşandanê

**7- Hêmaya li dawiya hevokên asayî tê bikaranîn kîjan e?**
**a-** Hêmaya baneşan. **b-** Hêmaya cotxal.
**c-** Hêmaya xal. **d-** Hêmaya pirsê.

**8- Kîjan peyvên li jêr jêder e?**
**a-** hatim **b-** hatin **c-** hat **d-** hatibû

**9- Ji alavên li jêr kîjan alava daçekî ye?**
**a-** Ji bo **b-** Ger **c-** Jî **d-** Li

**10- Ji nivîsînên ji aliyê kesekî ve, ji bo çareseriya pirsgirêkekî, gilîkirinekî û zanistgirtinekî ji cihê peywendîdar re tê nivîsandin jê re çi tê gotin?**
**a-** Name **b-** Lezgînî **c-** Daxwazname **d-** Vexwendiname

**11- Ji nivîsînên bûyeran bi awayek bi ken û henek rave dikin, mirovan dihizirînin û waneyekê didin wan re çi tê gotin?**
**a-** Çîrok **b-** Serpêhatî **c-** Destan **d-** Pêkenok

**12- Di kîjan hevokê li jêr de hevalkarê demî heye?**
**a-** Min par name nivîsî.
**b-** Min di refê de name nivîsî.
**c-** Min li ser kaxezê name nivîsî.
**d-** Min bilez name nivîsî.

**13- Ji helbestên bi jimarek diyar yê kiteyan hatiye nivîsîn re çi tê gotin?**
**a-** Helbestên bêpîvan. **b-** Helbestên serbest.
**c-** Helbestên pastural. **d-** Helbestên bipîvan.

**14- Ji cûre nivîsandinên di derbarê mijarek diyar de li gor hizir û ramanê rave dike, zansitê li dora bûyerê kom dike re çi tê gotin?**
**a-** Metelok. **b-** Destan. **c-** Ramanî. **d-** Pêkenok.

**15- Ji wekheviya du dengên li dawiya rêzikên helbestan de tên dubarekirin re çi tê gotin?**
**a-** Qafiya lewaz. **b-** Qafiya dewlemend.
**c-** Qafiya tam. **d-** Qafiya hevdeng.

**16- Di kîjan hevokên li jêr de kirina karê demê niha heye?**
**a-** Havînê nivîsî. **b-** Havînê nivîsîbû.
**c-** Havîn dinivîse. **d-** Havîn wê binivîse.

**17- Jêdera peyva, 'dêbêje' çi ye?**
**a-** Gotin. **b-** Peyvîn. **c-** Axaftin. **d-** Bêje.

**18- Helbesta bi navê 'Bihar' ya kîjan hozanvanî ye?**
**a-** Cegerxwîn. **b-** Celadet Bedirxan.
**c-** Osman Sebrî. **d-** Qenatê Kurdo.

**19- Helbestvan û wêjevanê Kurd yê di sala 1903'an de li Hesarê hatiye cîhanê kî ye?**
**a-** Musa Anter. **b-** Ehmedê Xanî.
**c-** Feqê Teyran. **d-** Cegerxwîn.

**20- Hêmaya di destpêka hevokê peyvînê de tê bikaranîn kîjan e?**
**a-** Xêzika navber. **b-** Xêzika axaftinê.
**c-** Xêzika xwar. **d-** Cotxal.

# BEŞA III

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **We nivîsînên şanogerî xwendine?**
- **Ev nivîsîn rewşa jiyana Bedo dide diyarkirin.**

# ŞANO

Di demên berê de, li gundekî aliyê Torê, malbatek xîzan hebû. Navê zilam Biro; navê dayîkê jî Zînê bû. Biro, li mala begê Torê, “cîrîtê” dike. Zînê jî sê mirîşk hene. Hêkên wan mirîşkan difiroşe û pê debara xwe dike. Nanê wan nanê cehî ye. Nanê genimî wisa bi hêsanî nakeve destê wan. Zarokên wan ên ewil, mîna zarokên gundiyên wan, hemû bi nexweşiya “Birîna Reş” mirine û çûne. Tenê ji vê nexweşiyê lawekekî yê wan, sax filitiye. Navê wî Bedo ye. Wan jî ew daye ber xwendinê. Li bajarê Diyarbekirê dixwîne. Li vî gundî, hîna lawê begî jî amadeyî nexwendiye û neqedandiye. Kêfa dayîka wî pir tê, bela ku lawê wan dê nikaribe bibe “onbaşiyê eskeriyê”, di çavê bavê wî de hîn ne tiştek e.

Di perdeya duyem de, ev danûstandina balkêş di navbera Biro, Zînê û lawê wan Bedoyî de derbaz dibe.

**Bedo:** Yabo ma te divê, ez bibim çi?

**Biro:** Onbaşiyê cendirman.

**Bedo:**

-Çawa onbaşî yabo, onbaşî çi ye?

**Biro:**

-Çi? Tû yê hîn meztir bibî Bedo?

**Zînê:**

-Jixwe Biro, ma tu nizanî, wê lawê min hîn meztir bibe?

**Biro:**

-Ha ho! Zînê, niha lawê min bikare, wê bibe rêvebirê (midur) nahyê.

**Bedo:**

-Erê yabo! Ez dikarim bibim midur lê hîn tiştên ferztir hene. Wek tixtor, mihendiz, hakim û evûkatan.

**Biro:**

-Kuro lawo tu jî wek diya xwe yî, kengî te dikin, ewên tu dibêjî? Ma ev qas zarokên beg û axan, qelyan e ku te bikin midur û tixtor.

**Bedo:**

-Na yabo na, niha ne wiha ye, kî bixwîne, dibe her tişt.

Roja ku Bedo hatiye mala bavê xwe, gundiyekî wan yê “zana” bi navê Sado tê mêvandariya wan. Ji Bedo, çend pirsên ser efsaneyên sewalan-ajalan dipirse. Bedo pê dernaxe, bi van tiştan nizane. Sado jî bi çîrokên demên berê efsaneyên ser van lawiran rave dike. Bedo jî çend nûçeyên ser zanist û teknolojiyê yên welatên dewlemend yên weke Ûrus û Emerîkan ku diçin ser heyvê, ji wan re radigihîne. Tavilê hestên olî yên Xalê Sado radibin. Li ser temenê dinyayê, li ser siyaseta balkêş ya Partiya Demokrat û Partiya Xelkçiyan ya Turkiyayê dipeyvin, dabaşa xelayê dike.
Dawiyê Bedo dibe dixtor, li Nexweşxaneya Diyabekirê tixtoriyê dike. Li rewşa gundiyan dipirse. Bi wan re têr eleqedar dibe. Dê û bavê xwe tîne ba xwe. Muayenexaneya taybet venake, li mala xwe, nexweşên gundiyan dinêre. Çend zarokên gundên wan ku bi nexweşiya “Birîna Reş” ketine, li ber mirinêne, tînin mala Dr. Bedo.

***Musa Anter (Birîna Reş)***



## PEYV

**Tixtor:** Bijîşk
**Mihendiz:** Endezyar
**Hakim:** Dadger
**Evûkat:** Parêzer
**Muayenexane:** Cihê lênêrînê
**Midur:** Rêberê bajarokan
**Onbaşî:** Berpirsê çend leşkeran
**Cendirme:** Leşker
**Diyarbekir:** Amed

## EM HELBESTVANÊ XWE NAS BIKIN

Musa Enter di sala 1918'an de li gundê Zivinga girêdayî Nêsêybîna Mêrdênê ji dayîkbûye. Dibistana xwe ya seretayî li Mêrdênê û ya navîn û amadeyî jî li Edenê dixwîne. Di 20'ê Êlona 1992'an de di encama êrîşekî çekdarî de li Amedê jiyana xwe ji dest dide û tevlî karwanê nemiran dibe.

**Berhemên wî:**

Bîranînên Min I-II
Qimil
Vakaîname
Birîna Reş

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

"Her zimanek destûr û wêjeyek ya xwe heye."

Hûn jî mijara li jêr li gor destûr û wêjeya Kurdî rêkûpêk bikin.

**Bedo**

Yabo ma te divê ez bibim çi

**Biro**

Onbaşiyê cendirman

**Bedo**

Çawa onbaşî yabo onbaşî çi ye

**Biro**

Çi Tu yê hîn meztir bibî Bedo

**Zînê**

Jixwe biro ma tû nizanî wê lawê min hîn meztir bibe

**Biro**

Ha ho Zînê niha lawê min bikare, wê bibe rêvebirê (midurê) nahyê

**Bedo**

erê yabo Ez dikarim bibim midur lê hîn tiştên ferztir hene Wek dixtor mihendiz hakim û evûkatan

## CÛR Û AWÊN

*Ji wan nivîsîn û berhemên bi mebesta li ser dikê bê lîstin, hatîn amadekirin re **şano** tê gotin.*

We mijarek ji axaftinên pêşberî hev pêkhatî xwend. Em di vê mijarê de van taybetmendiyan dibînin:

**1**-Mijar, bûyerê bi awayekî raste rast şîrove dike. (Em vê ji axaftina kesan têdigihîjin.)

**2**- Şano nivîsînên bûyeran didin têgihandin. Hemû berhem û nivîs, ji bo xwendinê tên nivîsandin; lê şano ji bo temaşekirinê tê nivîsandin.

**3**- Şano hem awayê hûnandî û hem bi awayê pexşan tê nivîsandin. Berhemê we xwendî, bi çi awayî hatiye nivîsandin?

**4**- Şano jî weke hemû berheman ji sê beşan; destpêk, naverok û encamê pêktê.

**5**- Ew berhemên li ser dikan tên lîstin, dibe ku ji yek yan jî, ji gelek beşan pekbên.

Ji her beşekê re **perde** tê gotin**.**

Ji cihê ku li ser tê lîstin re **dik** tê gotin.

*Ji wî cihê pişt dikê re ku mirov xwe lê amade dikin re **kulis** tê gotin.*

*Ji wan cil û bergên ku lîstokvan li gor pêwîstiya şanoyê li xwe dikin re **kostûm** tê gotin.*

## RÊZIMAN

**Di waneya derbazbûyî de me dabaşa pêvekan kiribû û me gotibû dibin du beş:**

**1- Pêveka Sazker:** Ev cûre pêvek, li ser peyvê tên zêde kirin û bi peyvê ve têne zeliqandin, li ser bingehê wateya peyvê wateyek nû ji heman peyvê re didin qezençkirin.

| Peyva xwerû | Pêveka sazker | Peyva dariştî |
|---|---|---|
| Aş | van | Aşvan |
| Gund | î | Gundî |

**TÊBÎNÎ:** Carna di zimanê me de peyvên dariştî carek din tên tûre dan.

**Mînak:**

| Peyva xwerû | Pêveka sazker | Peyva dariştî 1 | Pêveka sazker | Peyva dariştî 2 |
|---|---|---|---|---|
| hiş | mend | hişmend | î | hişmendî |
| sol | bend | solbend | î | solbendî |
| ket | hil | hilket | in | hilketin |

## HÎNDARÎ

**1-**Hûn jî lîstokekê amade bikin û ji hevalên xwe re bêjin.
**2-**Dest nivîsa jêr hûn jî li lênûsa xwe binivîsin.

Dawiyê Bedo dibe dixtor, li Nexweşxaneya Diyabekirê dixtoriyê dike. Li rewşa gundiyan dipirse. Bi wan re têr eleqedar dibe. Dê û bavê xwe tîne ba xwe. Muayenexaneya taybet venake, li mala xwe, nexweşên gundiyan dinêre. Çend zarokên gundên wan ku bi nexweşiya "Birîna Reş" ketine, li ber mirinêne, tînin mala Dr. Bedo.

# NEWROZ

MIJARA SERBEST

Newroz; rojek pîroz ya serkeftina gelê Kurd e. Di vê rojê de li hemberî Dehaqê zordar, Kawayê Hesinkar serketiye û ew roj bûye dawî anîna zordariya bi sedê salan û di bin pêşengiya Kurdan de bûye roja destpêka azadiya Rojhilata Navîn.


Her wiha di vê rojê de Kawayê Hemdem (Mazlum Doxan) jî li hemberî zordarê faşîstê dewlata Tirk, ala berxwedanê bilind kir û bû pêngava yekem ya berxwedana li hemberî zordarî yê.

Belê, berxwedana ku di vê rojê de destpêkîrî, bi serkêşiya şehîdên nemir, di zîndana Amedê de berdewam kir û tîrêjên wê berxwedanê, xwe avêtin çiyayên Kurdistanê. Ji bo bîranîna şehîdên berxwedanê, bi hezaran çalekî hatin lidarxistin û bi hezaran ciwan tevlî refên pakrewanan bûn.

Berxwedana ku di bin tîrêjên Roja nû de, pêş diket, di salên 90'an de derbazî qadên serhildana gel bû û ev berxwedan bilind bû, heya giha her çar aliyê Kurdistanê. Bi vê berxwedanê, Kurdistana ku hatibû tarîkirin, hêdî hêdî ronî dibû. Ev roja ku di bin perda reş de hatî veşartin, êdî perda xwe diqetand û carek din, weke gulek ya biharê, serê xwe hildida û bêhna wê belavî hemû qadên cîhanê dibû.

Ji ber bandora berxwedanvanên azadiyê, êdî ev roj ji aliyê dagirkeran ve jî tê pîrozkirin. Bi taybet di roja me de her kes dixwaze wateya vê rojê berevajî bike û weke cejnek ya xwe, ji xwe re bikarbîne.

Lê gelê Kurd, bi tîrêjên zanista Rêber APO şîn bûyî û bi xwîna pakrewana hatî avdan, ti caran rê nade ku ev roj ji wateya xwe ya rast derbikeve û vê rojê her tim li qadan, ji bo bi destxis tina azadiyê, weke roja berxwed anê, pîroz dike.



# GOLA QULINGA



Dem meha Gulanê bû, berf nema bû, deşt şîn bûbû, çiyayên biçûk biberf bûn. Çiyayê Sîpanê jî wek şîr spî bû.

Ev deşt, deşta Patnosê ye, li vê deştê raste rast giya xwe li çokan dida. Bê qutbûn weke mehfûrekê şîn e. Di deşta rast de Çiyayê Sîpanê bi hemû xweşikbûna xwe derdikeve pêşiya te. Ew li rasta serê te bilind û bilind e. Tû nikarî serê xwe rakî û li gûpika wî binêrî, tû ditirsî... Dema ku tu ji dûr ve wisa li Çiyayê Sîpanê dinêrî, ji Çiyayê Agirî bi heybetir tê xuyakirin. Wek çend Agiriyan tê dîtin. A-liyekê wê Gola Wanê, aliyê din deşta Patnosê ye. Ew heşamet ji nav deştê derketiye û bilind bûye. Lê belê hilkişîna serê Çiyayê Sîpanê hêsan e. Mirov dikare bi hêstiran heya nêzîkî gupika serê wî biçe. Ew qas ne asê ye. Havînê bahoza berfê li wê derê çênabe. Li ser serê wî gelek zûng (krater) hene.

Ji heriyê; tirampêl nikarin, bên û biçin. Ez ji Agirî têm, em sê heval in, di bin her yek ji me de, hespekê kihêlê resen heye. Hevalekî hespê xwe yê siwariyê da min, hespê ku wek xezalê, ew qas rê jî çû lê carek tenê jî nehiltepilî, tenê bin guh û rûyê wî xwih da.

Bi derekî wan ve, çirîskek ji nişka ve hil dibe û vedimire. Di nav firindeyan de, firindeya ku kesekî yan jî tiştekî nêzîkî xwe nake quling e, min gelek quling dîtin. Li cem min gelek qulingan nêçîr kirin, tenê yek quling jî derfet neda ku ji sêsed metran kêmtir kes nêzîk bibe. Li wê derê dihêlin ku tû, ta sed metran jî nêzîk bibî, sedemê wê jî heye. Kuştina qulingan li dora Gola Wanê gunehekê mezin tê dîtin. Ji ber wê yekê, kesê ku xwe nas dike, qulingan na-kuje. Ji ber vê yekê jî ev der tejî quling bûne. Li ser me re refek quling diborî û diçû, netenê refek, çend ref... di her refekê de bêjimar quling hebûn.

Hevalê li gel min navê wî Mustafa bû; bi xwe xelkê Agiriyê bû, ev der baş nasdikir.

Digot: Ev quling diçin Gola Wanê û li rexê avê, li cihekê ku kes lê neyî, di hêlînan de, wê hêkan bikin. Dora Gola Wanê heşameta qulinga ne. Belkî ti cihê cîhanê ew qas quling nebin. Tû diçî cihekî dibînî deşt seranser tejî quling in, weke keriyê pez wisa zêde ne.

Min deşt nîşakir. Aha, li vê derê jî ew qas pir in... ma ji vê zêdetir jî wê quling hebin. Seranserî deştê derbest jî quling in.

Got: “Ey hevalê min, ev jî quling in? Ev kit û mit in, xwezî em rastî bihatana, dê te ew li deştê bidîtana, dê te zimanê xwe gezdaba.”

Em nêzîkî qontara Çiyayê Sîpanê dibin, gûpikê wî yê bi berf, li esman êdî nayê dîtin. Bi şînatiya esman re bûye yek. Hevalê min, vê carê dest bi stranekê li ser Sîpanê kir. Di stranê de efsaneyekî evîndariyê tê ziman. Stran sê demjimêran got û nekarî bi dawî bike. Stranek dilşewat bû, weke pêlên deryayê... li ser me re ref bi ref quling ber bi Gola Wanê ve diçûn. Serek yê refê li qontara Çiyayê Sîpanê ye û serê din jî li Gola Wanê ye.

***Ji pirtûka Rojinên Periyan***
***Yaşar Kemal***

## PEYV

**Heybet:** Sehm
**Heşamet:** Gengeşeyekê pir mezin
**Krater:** Zûng, çalên ku paşmayên çiyayên şewatek

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**1-**Hêmaya birek; pêvekên ku dikevin li ser jimaran bi hêmaya birekê (') ji jimaran tê cûdakirin.

**Mînak:**

Di sala 1990'an de gelê Amedê serîhilda.

**2-**Peyvên jêr hatine nivîsîn di nav hevokê de bikarbînin.

Gol, Wan, quling, gulan

## PIRS

1-Nivîskar çima ji Gola Wanê re gotiye, gola qulingan?
2-Nivîskar û hevalê xwe, kengê diçin kûderê?
3-Nivîskar li Deşta Patnosê çi dike, bêjin?

## CÛR Û AWÊN

Nivîsîna we li jor xwendî, ji ber ku li derdora Gola Wanê geriyane û tiştên dîtîn, bi rêzê ve rave kiriye.

Mirov, dixwaze li cih, bajar, herêm û welatê ji derveyî yê xwe bigere û bibîne.

*Hûn berê fêr bûbûn ku ji wan cûre nivîsînên cihê geryayî û dîtî, agahiyên komkirî, tiştên pêhesiyayî, radigihînê re* ***geryaname*** *tê gotin.*

## RÊZIMAN

**Pêvekên kêşanê:**

Ew cûre pêvekên ku dema bi peyvê ve tên, bandorê li ser wateya peyvê nakin. Belkî di aliyê zayend, jimar û palvedanê de kêşanê pêktînin.

**Mînak:**

| Hevok | Peyv | Pêveka kêşanê | Peyva P. kêşanê girtî |
|---|---|---|---|
| **Gulê name nivîsî.** | **Gul** | **ê** | **Gulê** |
| **Hevalna şer kir.** | **Heval** | **na** | **Hevalna** |
| **Dara milê ciwan e.** | **mil** | **ê** | **Milê** |

## HÎNDARÎ

**1-**Hûn jî hewl bidin ku weke destnivîsa jêr li lênûsa xwe binivîsin.

Dem meha Gulanê bû, berf nema bû, deşt şîn bûbû, çiyayên biçûk biberf bûn. Çiyayê Sîpanê jî wek şîr spî bû.

**2-**Hûn jî hewl bidin ku weke destxeta jêr li lênûsa xwe binivîsin.

*"Di deŞta rast de çiyayê Sîpanê bi hemû xweŞikbûna xwe derdikeve pêŞiya te."*


## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **Mijara jêr girîngiya rojbûna Rêber Apo dide diyarkirin. Di rojbûna Rêber Apo de pîrozbahiyek çawa tê pêşxistin û we heya niha encamek çawa ji vê roja pîroz girtiye?**
- **We li ser vê roja pîroz qet nivîsandin nivîsîne?**

# GIRÎNGIYA 4’Ê NÎSANÊ

Biharê bi hemû delaliyên xwe, xemla xwe temamkiriye. Roj bê ku raweste, bi lez û bez dem derbaz dike. Her wek di tarîbûna şevê de li jiyanê digere, jiyan bi xwezeyê xweş e; xweşikbûna xwezayê bi bêhna gulan çêdibe, lê mixabin gul çilmisîne, her wekî ji rojê xeyîdî, kanî zûha bûne. Derketina parçeyek ewrê li esmana ji bo biharê gûmanan dertêxe holê. Xûnava bi pelên daran ve dilop dilop xwe berdiden xwarê.

Bilbil bêgêwil û bêzar, li şeva tarî û bêdeng, bi hemû hewldanên xwe, xwe dispêre biharê. Robar hêdî hêdî zelalbûna xwe winda dikin. Ji nav her dû niklê bilbil, awazek xembar û melûl êdî şanên hemû zindiyan dike, rondikan li ser hinarokên rûyê wan de diherikine. Zivistan û havîn ji bo biharê mukur tên, stêrkên li esîmana geş dibin, lê dîsa xwe dixin pişt ewran û xwe vedişêrin. Dil difetise ku xwe kiriye perî, ji ber ku ji buhiştê tên avêtin. Periyan êdî tevgerkirin, ber bidojehê ve diçin. Çiyayên bilind stûxwar dibin, ji ber ku êdî mij ji bo çiyan dibin mêvan; bûk li şûna kincên bûkaniyê, êdî cilên sor li xwe dikin; ji ber ku êdî dibe bihar; erê roja ku çuye ava, wê her derbikeve, lê kengî? Her kes li bendê ye!



Bajarê ku di dîrokê de her tim li ser singa xwe bihara rengîn av dayî, bêgûman vê carê jî çavê her kesê li bihara vî bajarî ye. Ruhaya ku bajarê ol û pêxemberan e, baxçeyê gul û gulistanan bû, ma dibe ku tovên biharê di boxçika dayîkên vî bajarî de xilas bibin? Tovên biharê di boxçikên dayîkên wê de pir in. Lê ew li benda derketina rojê mane. Ji bo bibe bihar, êdî dem hatiye. Roja ku çuye ava, piştî hezarên salan di çarê Nîsanê de carekî din, li ser çiyayê vî welatî re, şewqa xwe ya bi heybet avêtiye. Çiya û zozan, deşt û banî, dol û newal, herder ronî kiriye. Bihar hat, xweşikbûna xwe vekir, xweşikbûna xwe belav kir û bêhna xwe li çar aliyên welat belav kir. Ji her çar aliyên welat ve her kes ji bo bêhna wê hatin. Li hawîrdora wê civiyan. Bi derketina biharê re, çem û kaniyan axa dêm avî kirin, xezal û pezkûviyan gelî û newal tejî kirin, şalûl û bilbilan li ser çiqilê her darekê hêlînên xwe çêkirin, beran û nêriyan li ber bilûra şivanan xwe serxweş dikirin û zarokên di dergûşan de kenê azadiyê dikirin. Bihara ku di çarê Nîsanê de derketî, her kes dixwaze di rojên şahiyan de wê di nav nameya evîna xwe de bike diyarî. Ji ber ku ev bihar bi xwîna şehîdên vî welatî hatiye avdan. Bi xwihdana eniya mêrxasan belk daye. Bêhna xwe ji birînên sînga Egîdan girtiye. Xemla xwe ji xweşikbûna Zîlan û Semayan standiye. Êdî ev bihara bi vê rojê derketî, ji bo her mirovekî dibe gulek geş; ji kêfxweşiya vê rojê hozan temborên xwe bi ziman dikin û hevsengiya dengê xwe û tembora xwe çêdikin, ji ber ku êdî wateya vê rojê, ji bo wan tê têgihiştin û zimanê wan ji bo vê rojê tê vekirin. Ker bi guh dibin, lal bi ziman dibin, dîn haş dibin û ji ber ku êdî bi 4’ê Nîsanê ji firindeyan tenê firîn dibe para kevoka spî; li hemberî bêhna biharê, Sibat dibe firewn û Nemrût. Hemû tiştên xweş yên çêdibin bi dayîkbûna we re tê, Rêberê min...!

Lê çibikim, dil ji xiyalan, pênûs ji nivîsînê, çav ji dîtinê hizirîn ji hestan têr nabe. Her çiqas em pesnê we bidin lê dîsa biqasî we nabe Rêberê min. Bêy hebûna we, em mîna zindiyekî bêgiyan, zarokekî sêwî xwe dibînin. Lê çibikim, çiqas bihûnim, çiqas bilorînim, bêjim lê nikarim pesnê we bidim Reberê min.

## PEYV

**Hinarok:** Ew parçe ruyê li binê çavê mirov
**Şan:** Hucre
**Melûl:** Di nav xemgîniyê de
**Xembar:** Kesê xemên wî pir
**Hewldan:** Bizav
**Bêzar:** Bêçare

## PIRS

1-Armanca nivîskar ji çilmisîna gulan çi ye?
2-Nivîskar çi hêviyê ji bajarê pexemberan dike û li benda çi ye?
3-Li gor mijarê nivîskar roj li şûna çi bikaranî ye?

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Hevokên jêr temam bikin.

Biharê bi hemû delaliyên xwe, xemla xwe ... Roj bê ku raweste, bi lez û bez … derbaz dike. Her wek di … şevê de li jiyanê digere, jiyan bi xwezeyê xweş e; xweşikbûna … bi bêhna gulan çêdibe.

## HÎNDARÎ

*Nivîsîna ku dema nivîskar ramanê xwe yê di derbarê mijara avêtî holê de tîne ziman, nêrînên xwe napesêre mukurekî , nakeve xema nebawerkirinê jî ji vî cûrê nivîsînê re* ***taqîkirin*** *tê gotin.*

Ji bo çêkirina taqîkirin û ramanî pêwîstiya me bi van xalên jêr heye.

a- Pêwîst e em mijarekî diyar bikin (kifşkirina mijarê).
b- Divê mijara xwe bitixûb bikin.
c- Pêwîst e ramana bingehîn danin holê.
d- Divê diyar bikin, ka ramana bingehîn bi kîjan riyê vekin?
e- Divê biryar bidin, ka awayê ravekirinê wê çawa be?
**e.** Divê cûrê nivîsînê yê di cih de hilbijêrin.

## RÊZIMAN

*Dema navê duwem wateya navê yekem temam dike, jê re **palvedariya navan** tê gotin.*

**Mînak:**

Hogir ê Sosinê

Nav veqetandek nav

Palvedar Palvedêr

Palvedariya navan

Palvedariya navan, ji dû navan yan jî ji nav,cînavekî û veqetandekê pêktê.

*Dema hevalnavek navekî temam dike, jê re **raveka hevalnavan** tê gotin.*

**Mînak:**

Gul a sor

Nav veqetandek hevalnav

Raveber raveker

Raveka hevalnavan

Raveka hevalnavan jî ji nav, hevalnav û veqetandekê pêktê. Lê dibe ku veqetandek carnan neyê bikaranîn.

Veqetandek, dibin dû beş. Veqetandeka nêrza û mêza, nêrzatî û mêzatiya van veqetandekan li gor palvedar û raveber tên diyarkirin yanî ger palvedar û ravber nêr be, bendek nêrza ye. Ger mê be, mêza ye. Di zimanê Kurdî de bendeka mê “**a**” ye. Ya nêr jî “**ê**” ye.

## HÎNDARÎ

**1-**Li ser mijarekî diyar hûn jî ramanê xwe binivîsin û di refê de ji hevalên xwe re bêjin.

**2-**Destnivîsa jêr, li lênûsa xwe binivîsin.

Lê çibikim, dil ji xiyalan, pênûs ji nivîsînê, çav ji dîtinê hizirîn ji hestan têr nabe. Her çiqas em pesnê we bidin, lê dîsa biqasî we nabe Rêberê min. Bê hebûna we, em mîna zindiyekî bêgiyan, zarokekî sêwî xwe dibînin. Lê çibikim, çiqas bihûnim, çiqas bilorînim, bêjim lê nikarim pesnê we bidim Reberê min.

# BÊRIYA BOTAN


Mîr Celadet Alî Bedir Xan





Kanî Derwêş, ka Herekol, ka Kepir.
Ka zozanên Bavê Têlî, ka kê bir.

Dibêjin kû Birca Belek hilweşî,
Text û bextê Botiyan de, ka geşî.

Seyrangeha Banûwa Zîn, ma çi bû?
Naxuyên, qet xişr û xemlên wê li ku?

Ka Westanî, ka Qesara, ka Kanî?
Kanên zozan, cihên bilind, kebanî?

Awan jî bit kanî Beko, kanê reng?
Kanên ew bezm, kanî bade, kanî beng?

Basiret ku, neqşibendê, terîqet.
Ka şêxên me, kanî rêzik, şerîet?

Kanî Seqlan, Senefis û Nêrgizî?
Gul û rihan zeriyane, tev rizî.

Ka Azîzan, şêx û seyda û axa?
Kanîn ew qesr, tev bilind û tev ava?

Kanî Sitî, kanî jinmîr û cêrî?
Kanîn ew rim, ka huwêzî, şeşperî?


Mîr Mihemê yê nêçîrvan, kanî ku?
Çeper li ku kovî, hevor, nêrî ku?

Ka gêra wî, Gera Xanî, gêj gerîng?
Ka salên me, Bekirbegî, xweş devling?



Kanî mîrek, ka mifirdî, kanî beng?
Kanî lolo, lê lê li ku, kanî deng?

Kanîn çeper, betîlik û ka celab?
Nêrekew û pêjn û dengên qeb û qab.




Ka banê me, yê Azîzan, kanî war?
Kepirê de ne kozik in, ne jî dar?

Bor mirişkan tenik biye kete ba.
Ez botî me, diştexilim her bi pa.

Pa ez bêjim, pa dizan im, çi bêjim.
Pa bi Xwedê, wek nexweş im û gêj im.

Kanî dîwan, ne diyar e xafa Mîr?
Ka çîrokbêj, dengbêj li ku kanî pîr?

Teter li ku, Axayê Sor û ew reng?
Tenbûr û ney, kemençe û zirne deng.



Kanî dawet, qelîsêl û medfûnî?
Tirşik, parêv, arok, mehîr, hêkrûnî.

Kanî civat, fîl û setrenc, ka zindan?
Ko tê de Mîr, şahê Mexrib, Mîr Alan.

Dotmîr li ku, ka Mîr Şeref, Mîr Ezdîn?
Kanî bavê Sitiya Zîn, Mîr Zeydîn?



Beg û axa kanî tovrind, kanî dot?
Ne mîr mane, ne mîrîtî, ne jî cot.

Ne Gurgêl e, ne Finik e, ne Cizîr.
Ne rîsipî, ne kêfxwê ye, ne gizîr.

***Ji giyanê Şêx Evdirehmanê Garisî re***

## PEYV

**Tovrind:** Esilzade
**Mexrib:** Li gor helbestê, bajarê rojava
**Medfûnî:** Navê xwarinekêye, tirşik
**Teter:** Turk
**Celab:** Bir
**Mifirdî:** Noturvan
**Gêjgerîng:** Gergerok
**Hevor:** nêriyê dû salî
**Şeşperî:** Şeşhûrî
**Huwêzî:** Cewêzî
**Cêrî:** Xizmetkarê xatûnan
**Nefîs:** Banê senfîsê li kêleka Cizîrê
**Seqlan:** Navê ava nêzîkî Cizîrê ( navê ciheki ye)
**Neqşibendî:** Kesê girêdayî Şahe Nexşebendî
**Basiret:** Pêşdîtin
**Beng:** Serxwe
**Qesara:** Navê cihekê
**Xişr:** Ciwanî
**Bezm:** Cirîd
**gizîr:** Xizmetvan
**Kêfxwê:** Mezinê Xirîstiyanan.

## PIRS

1-Çima Celadet Bedirxan ev helbest nivîsandiye?
2-Çima nivîskar Birca Belek, Kelha Gurgêl û Kelha Finik bi hev re anîne ziman?

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**1-** Peyvên jêr di nav hevokê de bikarbînin.
dawet, qelîsêl, medfûnî, tirşik, parêv, arok, mehîr, hêkrûnî.
**2-** Hûn jî ji her yek ji hêmayên jêr re hevokekî binivîsin.
**, . : ? ! ... “” ‘ ( )**

## CÛR Û AWÊN

Mijara we li jor xwendî, nimûneyek ya helbestên hûnandî ye.

Hûnandî; *Ew cûrên nivîsînê ku bi awayekî, pir zirav, bi hev ve girêdayî, pîvana kite û wekheviya qafiyan tê de bikarhatî, jê re **hûnandî** tê gotin.*

Nivîsînên helbest, stiran, mamik û beşek yê destanan bi awayê hûnandî hatine çêkirin.

## RÊZIMAN

Palvedariya navan; ji hevtemamkirina du nav yan zêdetir navan pêk tê.

**Mînak: Neyarê cîhanê**

| | | | |
|---|---|---|---|
| **Neyar** | **ê** | **cîhan** | **ê** |
| **Nav** | **veqetandek** | **nav** | **Pêveka Palvedanê** |
| | **Palvedariya navan** | | |

**a- Taybetmendiyên palvedariya navan:**

Di palvedariya navan de herî kêm du nav peyda dibin. Di nav van de yê ku tê xwestin diyar bibe, navê diyarkiriye (tekuzkiriye). Navê dibe palvedêr wateya navê dibe palvedar temam dike.

**ŞIYARÎ**

Dema veqetandek nekeve navbera navan, nabe palvedariya navan: “şivhinar, marmasî, pelmêw” ev bire peyv nabin palvedariya navan. Belkî dibin navên hevgirtî.

**HÎNDARÎ**

1-Hûn jî helbestekê li ser armancek diyar binivîsin.
2-Dest xetên jêr binivîsin
***Kanî Derwêş, ka Herekol, ka Kepir Ka zozanên Bavê Têlî, ka kê bir?***


# KELHA HEWLÊRÊ

Kelha Hewlêrê, kelheke dikeve Başûrê Rojhilatê Kurdistanê. Dikeve nava bajarê Hewlêrê, dora wê bi firoşgehan hatiye dorpêçkirin û li ser zemînekî bilind hatiye avakirin. Dikare tevayî bajêr bixe bin çavnêriyê.

Kelha Hewlêrê kelhekê dîrokî ye. Weke tê dîtin, berê ax hatiye kom kirin û bi axê girek hatiye çêkirin. Li ser vî zemînî bi kerpîçên sor dîwarên xaniyan hatine lêkirin. Avakirina xaniyan li hemû aliyên wê bi awayekî wek hev hatine çêkirin.  Li pencerê xaniyên wê re tû dikarî libin xwe re li tevayî Hewlêrê mêze bikî. Dema tû temaşeyî kelhê dikî, dibînî ku di  hinek aliyê wê de, ji ber hezîna axê, dîwarên wê herifîne. Li aliyê wê yê başur riyek, li aliyê wê yê bakur re jî riyek derbazî serê kelhê dibe. Li rex riya li aliyê başûr firoşgehên xalî firoşan, rewşekê cûda diden kelhê. Li ser devê pêpilkên riya diçe kelhê, peykerek balkêş yê ku dîroka Hewlêrê nivîsandî heye. Di destê peyker de pirtûk, li serê wî şaşik, cil û bergên wî weke temtêla kesên zanayê kevnar e. Mirov li kêleka wî peykerî re derbaz dibî. Di  deriyê kelhê yê bi awayê azinc hatiye çêkirin re derbazî hundirê kelhê dibe. Dema mirov temaşeyî hundirê kelhê dike, bê xweyîtiya wê rewşekê xembar bi mirovan re dide çêkirin. Di nava riya wê de dîtina hinek leşker, vê rewşê zehmetir dike. Ji vir derbazî deriyê bakur dibî, li wê derê jî li jor de dema tû temaşe jêra xwe dikî, çavê te li kolana bijîşka dikeve.

Dema tû berê xwe didî riya ku tê kelhê, ti caran mirov bawer nake ku tirampêl têre derbaz dibe lê dîsan tû dibînî ku ji bo hatina kelhê, di vê riyê re tirampêl tên bikaranîn. Dema ji kelhê berbi jêr xwe berdidî, hinek berbi rojava ve diçî, rastî şelaleya bi dest çêkirî tê yî. Hinek wênekêş li wir wêneyên kesê gerok digirin. Hinekî radiwestî heya ku tirampêl rê bidin te û derbazî aliyê rojava bibî. Li wir firoşgehên qeyserî yên ku hemû cûrên tiştan difiroşin, tên berçavên te. Di hundirê qeyseriyê de, dikarî ji zêr, tiştê xwarinê yê cûr be cûr û cil û bergan bikirî. Ji derveyî qeyseriyê, herî zêde şerbetfiroş bala mirovan dikişînin. Hinekê berbi başur ve firoşgehên alavên spî dibînî, li aliyê wê yê rojhilat firotina tiştên kevnar û antîka tê dîtin.

Kevnariya vê kelhê, dewlemendî û dîroka Kurdan ji me re rave dike.



**PEYV**

**Qeyserî:** Sûka sergirtî
**Azinc:** Akit
**Peyker:** Awênê heyînan yê bi awayek kevir hatî çêkirin

**PIRS**

1- Kelha Hewlêrê li kûderê ye?
2- Kelha Hewlêrê li ser zemînek çawa hatiye avakirin?
3- Çima hinek aliyên kelhê hilweşiyan e?
4- Peykerê dîrokzanê mezin li kîjan aliyê kelhêye?

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Kurte mijara li jêr bi awayekî sererast li lênûsa xwe binivîsin.

kelha hewlêrê kelheke dikeve başûrê rojhilatê Kurdistanê dikeve nava bajarê Hewlêrê dora wê bifiroşgeha hatiye dorpêçkirin û li ser zemînekî bilind hatiye avakirin dikare tevayî bajêr bixe bin çavnêriyê.

## CÛR Û AWÊN

**Wêneyîkirin û dahûrandin (tesvir û tahlil)**

Mijara we li jor xwendî, cûre nivîsînekî wêneyî ye. Wêneyîkirin û dahûrandin ne, awayekî serbixwe yê vegotinê ye. Ev awayê vegotinê di serpêhatiyê de tê bikaranîn. Wêneyîkirin, kesê dîtî, dahûrandin jî awayê nêrînê têdigihîne. Hîn zelaltir wêneyîkirin di bûyerekî de dîtina; heyîn, rewş, kes, teba wisa radixe ber çav ku her wek me wêneyê wan kişandî dide têgihandin.

## RÊZIMAN

*Birepeyvên ji nav û hevalnavan tên holê re* ***raveka hevalnavan*** *tê gotin:*

| Tişt | ên | kevin |
|---|---|---|
| nav | veqetandek | hevalnav |
| raveber | | raveker |

Raveka Hevalnavan

**Taybetmendiyên raveka hevalnavan:**

**1**-Weke li jor tê dîtin nav raveber, hevalnav jî raveker e.

**2**-Di raveka hevalnavan de, endam bê yî ku pêveka palvedanê bê bikaranîn, bi hev ve tên girêdan. Ji ber hevalnav pêvekan nagrin, lê carnan nav pêvekan digirin. Carnan veqetandek dikeve navbera nav û hevalnavan. Ger cînav bibe hevalnav zayenda nêr, mê û komê digirin.

**HÎNDARÎ**

**1-** Hûn jî mijarekî wêneyîkirinê peyda bikin û li lênûsa xwe binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **We mijarek wêneyîkirinê ya bi navê Kelha Hewlêrê xwend û wisa hatibû vekirin ka her wek wêneyê wê hatibû girtin.**
- **Dîsa hûn fêrbûn raveka hevalnavan çawa çêdibin?**
- **Niha balê bikişînin li ser mijara li jêr ya bi navê kîso û kêvroşk.**
- **Gelo ev mijar çi cûrê nivîsînê ye?**
- **Dema hûn hevokekî saz dikin, gelo hûn çend endamên wê yên bingehîn dibînin?**

# KÊVROŞK Û KÎSO

Rojek ji rojan kîso rabû û çû gel hevalê xwe kêvroşk. Jê re got:

-Lo birako! Ez hatime ba te, ku em şert bilîzin. Ez û tu yê bibezin heta wî girê han, ka kî ji me dê ji berî yê din xwe bigîhîne wir. Kêvroşk bi vê gotinê kenî. Xwe nepixand û ji kîso re got:

-Tu ji dil dibêjî, yan henekan dikî?

Kîso li ser gotina xwe sekinî. Soz û biryarê xwe dan û bi rê ketin. Kîso hêdî hêdî, lê bê rawestandin diçû. Kêvroşk lê dinêrî, dikeniya û di dilê xwe de digot: "Heta ku kîso xwe bigihîjîne nîvê rê, wê cîhan lê bibe şev. Ezê niha zikê xwe têr bikim. Jixwe paşî dikarim bi derbekî xwe bigihînim serê gir."

Wisa jî kir. Di nav werzan de kelem dan hev û xwar.

Kîso qet ne rawestiya û çû, li pişt xwe jî nenêrî.

Piştî kêvroşkê têr xwar, serê xwe rakir û li kîso geriya. Dît ku kîso bi gavên hêdî hêdî, xwe gihandibû gir û li benda wî ma ye. Kêvroşk pûşman bû, lê çi feyde, kîso karê xwe biribû serî.



## PEYV

**Werz:** Cihê zebeş, gindor û hwd têde çêdibin
**Gir:** Cihê ji derdora xwe bilindtir
**Kelem:** Pelên tayên zebeş û gindoran

## PIRS

1-Kêvroşkê xwe li kûderê mijûl kir?
2-Çima kîso li pêşiya kêvroşkê giha serê gir?

## CÛR Û AWÊN

Hûn fêrbûbûn ku cûre nivîsînên bûyerekê nebûyî û ne pêkanî (gengazê) bûyînê radigihînin re çîrok tên gotin.
Di çîrokan de rewşên awarte tên dîtin û ji aliyê civakê ve navên pejirandin.

## RÊZIMAN

*Ji wan rêzepeyvên; hest, bûyer, xwestek, raman û nûçeyekê diyar dikin re* ***hevok*** *tê gotin.*

Hevok ji cûrepeyv û komên peyvan pêktên. Her yek ji peyvên ku hevokê pêktînin, erkekê digirin ser milê xwe.

Endamên hevokê saz dikin, li gor kiryarî û navdêrî dibin dû beş.

**a- Endamên hevoka karî yên bingehîn sê ne:**

**1-** Kar **2-** Kirek **3-** Pêkir

**TÊBÎNÎ:**

Di hevokên kiryarî de her tim endama alîkar têrker e. Têrker, hevalkarên ku di karanîna hevokê de tên bikaranîn û daçekên ku li ser navên cih hatîn bikaranîn, pêşwazî dikin.

**Mînak:**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Me | îro | li dibistanê | pirtûk | xwend. |
| Kirek | têrker | têrker | pêkir | kar |

**b- Endamên hevoka navdêrî yên bingehîn dû ne:**

**1-** Salox

**2-** Destpêk

**Mînak:**

Ronî jîre.

Pirtûk ciwan e.

Di hevokên jor de endamên hevokan yên bingehîn hatine nîşandan. Weke di hevoka karî de, di hevoka navdêrî de jî têrker endama alîkare.

**Hevoka karî**:

Di hevokên karî de endama hevok li ser tê avakirin û bi serê xwe jî tê wateya hevokê, **kar e**.

**Mînak;**

| | | |
|---|---|---|
| Heval | pirtûk | xwend. |
| kirek | pêkir | kar |

Di hevoka jor de peyva hevokê dike hevok, peyva **xwend** e. Ger em her dû endamên din **kirek** û **pêkir** bavêjin jî peyva **xwend** dibe hevok.

**Kar:** Peyva di hevokê de kirana karê kirekî dide diyarkirin.

**Kirek:** Peyv û rêzepeyvên di hevokan de çalekiyê pêktînin.

**Pêkir:** Peyv û rêzepeyvên ku di hevokê de çalekî li ser wan tê pêkanîn.pêkan meşandin.meşandin rêvebirin.

**HÎNDARÎ**

1-Hûn jî çîrokekê peyda bikin û li lênûsa xwe binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

- **Hûnê niha mijarekê ne weke çîrokê, tîştên awarte tê de heyî, belkî hûnê mijarekî bi hemû aliyê xwe ve rast, bûyerên di jiyana pakrewaneke Kurd de, çêbûyî rave dike, bixwînin.**
- **Gelo ji vî cûrê nivîsînê re çi tê gotin?**
- **Di hevokên saloxî de, endamên hevokê kîjan in?**

# JÎNAMEYA LEYLA QASIM



Leyla Qasım; di sala 1952'an de li Xaneqînê ji dayîkbûye. Yek ji wan keçane ku di dîroka ramyarî ya Kurdistanê de wekî pêşeng û lehenga şoreşgeriyê tê nasîn. Di 12'ê Gulan a, sala 1974'an de li Bexdayê şehîd bûye.

Xwendina xwe ya seretayî, navîn û amadeyî li Xaneqînê temamkiriye. Li zankoya Bexda, Koleja Wêjeyî, beşê Komelayetî xwendiye. Cihê xwe di nav rêzên 'Yêkîtiya Xwendekarên Kurdistanê' de, girtiye.

Di roja 28'ê Nîsan a 1974'an de, Leyla û çar hevalên xwe; Hesen Heme Reşîd, Nerîman Fuad, Azad Silêman Mîran û Cemal Hemewendî, hatin girtin. Di girtîgehê de rastî îşkence û azarekî pir mezin tên. Her çendî biçûktirîn, tawan li ser wan nehatibe çespandin jî lê rejima Iraqê, ji bo tirsandina Kurdan û bi taybetî çîna rewşenbîr ku piştgiriya doza xwe ya netewî dikirin. Di demek kurt de qasî 14-15 rojan bi pêkanîna dadgehekî seranser, her pênç ciwanên Kurd bi îdamê hatin darizandin.



Li gor dîtana wan kesên ku Leyla ji nêz ve dinasîn û ew dîtîn, Leyla keçek e bêtirs, zîrek, axaftin xweş, esmer, bejin bilind û di karê rêxistinê de bi disîplîn û rêk û pêk bû.

Di dadgehê de li rûyê dadgerê BAASÎ nerî û bi dengekî bilind wiha jê re got: "Min bikûjin, lê vê rastiyê jî bizanin ku bi kuştina min, bi hezaran Kurd wê ji xewa giran şiyar bibin. Ez pir kêfxweşim ku bi serfirazî û di 'Riya Azadiya Kurdistanê' de canê xwe feda dikim."

Piştî şehedata wê, Selamê birayê wê jî li Bexdayê ji aliyê BAASÎ'yan ve hat şehîd kirin.
Wêjevan û helbestvanên weke Hêmin, Mikuryanî, Cegerxwîn, Şêrko Bêkes, Tîrêj û hwd. di helbestên xwe de dabaşa lehengiya Leyla Qasim kirin e.

## PEYV

**Xaneqîn :** Navçeyekî girêdayî bajarê Silêmaniyê ye
**BAAS:** Pergala faşîst ya desthilatdariya Iraqê.
**Çîn:** Tebeqe
**Dadgeh:** Mahkeme
**Dadger:** Hakim

## PIRS

**1-**Leyla keçek çawa bû?
**2-**Çima Leyla ji aliyê rejîma BAAS ve hat girtin?
**3-**Kesên bi Leyla Qasim re hatîn girtin kî ne?

## CÛR Û AWÊN

*Hûn fêrbûbûn ku ji wan cûre nivîsînên jiyana kesekê ji dayîkbûnê heya mirinê, yan beşek ji jiyana wî/wê radigihînin re **jîname** tê gotin.*

Di jînameyê de kar û berhemên birûmet yê xwediyê jînamê tên diyarkirin.

## RÊZIMAN

**b- Endamên hevoka navdêrî (saloxî? Bi giştî dibin sê beş, ev in:**

**1-** Salox
**2-** Destpêk
**3-** Têrker

**1- Salox:** *Peyva di hevokê de kesekî, heyînekî, rewşa karekî yan nûçeyekî ji me re radigihînin yan dide zanîn re* ***salox*** *tê gotin.*

Ji ber pêveka demî digire, weke kar, ew jî dikare bi serê xwe bibe hevok.

**Mînak:**

<u>Îro</u> <u>cîhan</u> <u>germ e.</u>
**Têrker** **Destpêk** **Salox**

**2- Destpêk:** *Ew peyva di hevokê de, kar yan rewşa wê tê têgihandin re* ***destpêk*** *tê gotin.*

Di hevoka navdêrî (saloxî) de destpêk, weke destpêka hevokê tê pejirandin, yanî bi karanîna wê, li pişt saloxê ne pêkane. Ger li pişt saloxê werê jî, ew hevok, hevokekî bêdestûr e.

**Mînak:**

**<u>Gul</u>** pir ciwan e.
destpêk

**3-Têrker:** *Peyva di hevokê de dem, rewş, cih û çendiya salox û kar diyar dikin re* ***Têrker*** *tê gotin.*

**Mînak:**

Ew **<u>îro</u>** bextewar e.
Têrker

**TÊBÎNÎ:**

Di hevokên navdêrî de têrker her tim endamê alîkar e.

## HÎNDARÎ

**1**-Çar taybetmendiyên Leyla Qasim li lênûsa xwe binivîsin û ji hevalên xwe re vebêjin.

**2**-Destnivîsa li jêr li lênûsa xwe binivîsin.

"Min bikûjin, lê vê rastiyê jî bizanin ku bi kuştina min, bi hezaran Kurd wê ji xewa giran şiyar bibin. Ez pir kêfxweşim ku bi serfirazî û di 'Riya Azadiya Kurdistanê' de canê xwe feda dikim."

# BINIVE LOLO

***Binive xweşiya dil û du çava.***
***Dadê ji te re her roj, agahba.***
***Da zû tu mezin bibî Bedirxan.***
***Binive kezeba min, binive lolo.***

***Şiyar nebe nûhû neqenc e.***
***Landik ji te re bizane qenc e.***
***Bêxew nebe, paşiyê wê rêneçe.***
***Binive kezeba min, binive lolo.***

***Dewra felekê, li ser me kîn e.***
***Bextê me reş e, kezeb birîn e.***
***Mesken ji me re, Nûh Nebîn e***
***Binive kezeba min, binive lolo.***



*Emîn Elî Bedirxan neviyê Bedirxan begê ye, kesayetiyekî Kurdperwer, ji binemala Bedirxaniyan e. Di sala 1851'an de ji dayîkbûye û di 1926'an li welatê Misirê koça dawî kiriye.*

## PEYV

**Agahban:** Haydar
**Rêneçe:** Rêveçûn

## PIRS

1-Çima nivîskar ji Bedirxan re dibêje binive? Vekin.
2-Bedirxan kiye û li kûderê raperîn kiriye?
3-Çima nivîskar dibêje; "Dewra felekê li ser me kîn e"? Vekin.

## CÛR Û AWÊN

*Di mijarê borî de hûn fêr bûbûn ku ew cûre nivîsandinên ku ji pîvana kitan, qafiyan û malikan pêkhatî re **hûnadî** tê gotin. Her wiha fêrî pîvan û qafiyan jî bûbûn.*

*Weke di mijara jor de jî tê dîtin, ew rêzikên li dawiya malikên helbestê tên dubarekirin re, dibêjîn **Qulf** (**Nakarat**).*

**Mînak:**

"Dewra felekê li ser me kîn e
Bextê me reş e kezeb birîn e
Mesken ji me re Nûh Nebîn e
**Binive kezeba min, binive lolo"**

## RÊZIMAN

**1- Hevok li gor çêbûnê:**

**a- Hevokên hêsanî:** *Ew hevokên ku tenê kirinek yan saloxek ya wan heyî jê re* ***hevoka hêsanî*** *tê gotin.*

**Mînak:**

Wan pirtûk xwend.
Hewa germ bû.

**b- Hevokên rêzî:** *Hevokên bi tena xwe darezandinekî didin zanîn, di nav wateyek tevayî de hatine rêzkirin jê re* ***hevokên rêzî*** *tên gotin.*

**Mînak:**

Mamoste nahilberîne; digihîne, ronîdike, dafirîne.

**c- Hevokên girêdayî:** *Ew hevokên ku bi peyvên gihanek girêdana wan çêbûyî û di aliyê wateyê de hevdû temam dikin re* ***hevokên girêdayî*** *tên gotin.*

**Mînak:**

**Û:** Rizgar ket kemînê **û** derbeyek mezin li neyaran xist.

**Ku:** Xebat pir hatkirin **ku** Kurdan ji bindestan derxin.

**Lê:** Mamoste wanê dide **lê** hinek guhdar nakin.

**Lê belê:** Ez bi te re dixebitim **lê belê** karên min yên din jî hene.

**Yan:** Rewşê bi telefonê fêrbibe **yan** bi xwe biçe wir.

**Jî:** Egîd hat **jî** Ronî nehat.

**d- Hevokên hevgirtî:** *Hevokên ji hevokekî bingehîn û ji yek yan zêdetir hevokên alîkar tên holê re* ***hevokên hevgirtî*** *tê gotin.*

**Mînak:**

Darên di nav daristanê de neyên parastin, dê têk biçin.

Dibêji dayê! Bavê minê te bibe geştê, were biçin.

## HÎNDARÎ

Hûn jî helbestekê bi qulf peyda bikin û li lênûsa xwe binivîsin

**XEBATÊN AMADEKARIYÊ**

- **Niha li ser bingehê toreyên hûnerî, pênaseyek şanoyê hatiye nivîsandin.**
- **We qet temaşeyî şanoyekî kiriye, çi bandor li ser we kir?**

# BÊHNDANA HAVÎNÊ

Şano, hûnerekî herî kevnar, ya ku di dîroka mirovahiyê de cihê xwe girtiye. Di destpêka civakbûyînê, de ji bo jiyana xwe û baweriya xwe bidomînin, li derdora şamanan de lîstikên cûr be cûr lîstine. Mirov dikare bêje ku ev dibe destpêka şanogeriyê.


Xaka Mezopotamyayê, ji hûnera şanoyê re bi govend, dengbêjî û çîrokan… bingehekî bi hêz daye çêkerin.

Li Yewnanîstan û Roma kevin, hûnerê şano, xwe digihîne asta herî bilind. Ji bo şanoyê, dikên bi heybet yên ku bi hezaran kes bi hev re dikarin guhdar û temaşe bikin, dane çêkirin. Şopên van dikan, niha jî mirov dikare bibîne.

Almanan ji beriya çêkirina bajar, nexweşxane û zanîngehan, şano çêkirin.

Hebûna herî binirx gewde û giyanê mirovan e, nexweşxane cihê şîfaya gewde û şano jî cihê şifaya giyanî ye. Mirovek bê giyan weke qalibekî ye; ji hizirîn, bîhîstin û mirovahi ya başî û xirabiyê ji hev cûda dike, dûr e!

Ji ber vê çendê şano, qasî dibistan û nexweşxaneyan girîng e. weke nexweşê gewde, nexweşê giyanî jî dimire.





Şano, di nava beşê wêjeyî yê herî balkêş de cih digire. Xîtabî derûniya civakê û kesan dike.

Di berhemekî yê şanoyê de, endamên wek; mijar, kes, derdor, dem, uslûb û armanc tên dîtin.

Qada şano: Hemû bûyerên di nav civakê de pêkhatî, yan jî dibe ku pêk werin dikarin bibin mijara şanoyê û ji civakê re werin pêşkêşkirin.

Pîvanên çanda civakekî, şanoyên wanin, perwerda mirov bi wê tê pîvan. Hestên mirovahiyê di wê de bi mirovan re tên çandin. Rabûn, rûniştin, taqîkirin, têgihandin, ziravî û hezkirina ji hevdû re di şanoyê de fêr dibin. Her ku dibînin, dihizirin bi tendurist dibin.

## PEYV

**Şaman:** Kesê di serdema qlanan de zana, bitemen û serkêş.
**Mezopotamya:** Mezrabaton, xaka dikeve di navbera robarê Dîcle û Firat de.
**Şîfa:** Nosincan

## PIRS

1- Hebûna herî bi nirx gewde û giyanê mirovan e. Çima?
2- Pîvanê çanda civakî çine?
3- Nivîskar şanoyê çawa dide têgihandin?

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**Karanîna tîpên mezin**

**a) Hevok bi tîpa mezin tê destpêkirin:**

-Gotinên bapîran rûmetên netewî ne.

**b) Pistî cotxalê, hevok bi tîpên mezin tên destpêkirin:**

-Rêzan got: Divê em biçin dibistanê.

**c) Hevokên dikevin piştî hêmaya pirsê, bi tîpa mezin tên destpêkirin:**

-Ma ji azadiyê xwestir çi heye? Xweşiya azdiyê têbigihînin.

**d) Hevokên dikevin piştî baneşanê, bi tîpa mezin tên despêkirin:**

-Hevalno! Erkên we yên destpêkê, bi destxistina azadiyê ye.

**e) Rêzik bi tîpa mezin dest pê dike:**

Ez naçim dîwana mîra.
Nabim esîrê koçk û sera.
Bila li min xin kêr û xencera.
Feqiyê Teyran tengezarê dila.

**f) Navên taybet û paşnavên wan, bi tîpa mezin dest pê dikin**:

Osman Sebrî
Mahmûd Baksî

**g) Peyvên rêzgirtinê yên dikevin beriya nav, yên weke nasnav (unvan) û pişe, bi tîpên mezin destpê dikin:**

Şehîd Egîd
Birêz Zîlan
Bedirxan Beg
Mamoste Viyan
Birêz Zîlan pakrewanek hêja bû.

**h)Nasnav (kod) bi tîpên mezin tên destpêkirin:**
Egîd (Mahsum Korkmaz)
Zîlan (Zeynep Kinaci)

**I) Navên ku xizmaniyê didin diyarkirin, dema li pêşiya navê kesî bên, bi tîpa mezin dest pê dike.**
Xal Egîd, Yadê Xunav.
Yadê Bihar

**Î) Navên taybet yê ku ji tebayan re hatiye dayîn bi tîpa mezin dest pê dike:**
Qero.
Perê.

**j) Navê gel, welat, ziman û zaravayan, bi tîpên mezin destpê dikin:**
Kurd
Îran
Komara Kurdistan
Kurdî, Elmanî
Kurmancî, Zazakî, Soranî, Hewremanî

**k) Navên olan nav û hevalnavên bi wan ve girêdayî bi tîpên mezin destpê dikin:**
Îslam a Rast.
Museviyên Hişk.
Xirîstaniya Nerm.

**l) Navên saziyên fermî, bi tîpên mezin tên destpêkirin:**
Enstûtiya Kurdî.
Weşanên Roj.
Weşanên Doz.

**m) Navên pirtûk, kovar, rojname, belavok, zagon û rêvebirname, bi tîpa mazin destpêdikin:**
Mem û Zîn.
Hewar.

**n) Navên bûyerên dîrokî yên dem, sedsal û dem ,bi tîpên mezin destpê dikin:**

Têkoşîna Azadiya Kurdistanê.
Demê Berpenîr.
Demê Neolotîk.
Sedsala Bîstan.

**O) Navên stêrk û gerekstêrk, bi tîpên mezin tên destpêkirin:**

Mars (gerekstêrk)
Roj (stêrk)

**P) Navên roj û mehên ku dîrokekê didin diyarkirin, bi tîpên mezin tên destpêkirin:**

Di 15' ê Tebaxa 1984'an de, têkoşîna çekdarî dest pê kir.

**HÎNDARÎ**

*Hûn ji beriya niha fêrbûbûn ku, ew cûre nivîsandinên mirov ramanên xwe di derbarê mijarek diyar de rave bike, jê re cûre* ***nivîsandinên ramanî*** *tên gotin.*

Mijara li jor we xwendî, ji ber ku palvedaye ramanê û hatiye rave kirin, mijarek ramanî ye.

## RÊZIMAN

**2- Hevok li gorî cûrê peyva bingehîn:**

**Hevok li gor peyva bingehîna hevokê saz dike, dibin dû beş:**

a- Hevoka navdêrî (saloxî)

b- Hevoka karî (kiryarî)

a- Hevoka navdêrî:

*Ew hevokên bi* ***salox****ê tên avakirin jê re* ***hevokên navdêrî*** *tên gotin.*

**Mînak:**

Ew **ciwan e**.

Xwendevanek **jîr e**.

Awazê bilbil gelek **xweş e**.

**b- Hevoka karî**

*Dema hevok bi* ***kar*** *tê avakirin jê re dibêjin* ***hevoka karî****.*

**Mînak:**

Em di refê de nameyê **dinivîsîn**.

Hogir ji nişka ve **ket**.

## HÎNDARÎ

1-Cûre nivîsîneke ramanî binivîsin.

2-Destxeta li jêr binivîsin.

*"Min jî li ser vê rêya dijwar, gelek kir qîr û hewar, da rojekî ji bo we jî dinya bibe gulbihar."*

***Dr. Nûrî Dêrsimî***

# AŞÛT

Jiyan diherike, lê berf bi tûnd û dijwar dibare!.. Mîna barana reş, li ser mirovan dibare û li pêş dibû dava mirinê. Mirin û jiyan, jiyan û mirin xwe pev diguherîn. Lê dîsa darbest her dihatin amadekirin. Darbest, ji cendekên pîroz, yek li pey ya din dihatin dagirtin. Ji ber ku pêlên mirinê, ev dever ji xwe re kiribûn qada giyan standinê... Zagros, zagonên xwe yên hişk, tûj û bêwijdan li ser dilê Xinêre çikandibûn. Her zagonekî wê bûbû singek di dilê Xinêr e de. Carna digirî, carna jî dilopên xwînê jê dirijiyan! Çawa?

Destpêkê ewr li esmanên buhiştê gihan hev, çiya reşkirin û bi rûken pêşbazî li darxistin. Di demekê pir nêzîk de ji barîna baranê geliyên Xinêr e, bûn qada lêhiyên avê. Pişt re Zagros, bagera xwe rêkir. Bagerek ew qas xurt bû, çavan çav nedidîtin, guhan deng nedibihîstin.

Piştî van tofanan, tofana mezin got: “va ez hatim, yê ji xwe bawer bila were şer!” Êdî berf dipeyve, hemû ziman hatine birîn. Êdî berf dimeşe, hemû meş rawestiyabûn! Êdî berfê dîlan dikir, hemû dîlan rawestayîbûn, berf dibare. Çiya bêdeng û stûxwar kiribûn. Berfa dilovan kefenê spî li ser xwezayê de kiribû. Dar û daristan xeniqîbûn, lawir bêdeng bûbûn, jixwe ti şopa biharê nemabû. Ma hin hêz hebûn, beramberî xezeba Zagros xwe ragire?...

Zozana Dêrikî, bibêrê, pêşiya deriyê rûniştgeha xwe paqij dikir. Hin hevalên wê jî berfa serê ban tavêtin, gava çavê wan bi fermandara wan Zozanê ket ku berfê tavêje, bi gêwil dibûn. Heval bi lez diketin tevgerê û encama herikîna xuhdana ji eniyan, dibû qedandina kar! Zozanê bêr da tenişta rûniştgehê, derbazî hundir bû û mazota sobê zêde kir, piştî demekê hevalên wê yên din jî, li dora germahiya agirê sobê kombûn. Zozanê berê xwe da wan ruyên ji sarmayê sorbûyîn, li ber çavê xwe yên her tim biken û hêvî re derbaz kir û kenî. Ew kenê wê, ken li derdor belav kir. Bi dengê bêtêlê (cîhaz-telsiz) re Zozan berbi bêtêlê ve çû.

"Ax, Ax, Ax guhdar e!"

"Belê Zagros, Ax guhdar e!"

"Rewşa hevalan çawa ye?"

"Ti pirsgirêk nînin, rewşa hemû hevalan baş e, bila heval bi serê xwe tevger nekin û bila dû heval bi hev re bin, divê hevalek bitenê bi ti deveran ve neçe."

"Raste, di van xalan de min hêza cangoriyên li vir şiyar kirine!"…

"Baş e, duh ji Saziya Yekîtiya Rewşengeriya Demokratîk hevalek di bin aşûtê de şehîd ket. Ger cihê we tirsnak be, wir bi guharin."



"Başe."

"Serkeftin."

"Serkeftin."

Ev mijar, bi mijara "Pêhesa Dayîkê" didome.

**PEYV**

**Aşût:** Lêhiya berfê.
**Xezeb:** Kîn.
**Bager:** Ba û barîna di nav hev de.
**Ax:** Ji bo nasnavê bêtêlê ye.

**PIRS**

1-Bîranîna we li jor xwendî, di kîjan demsalê de û li kûderê çêbûye?
2-Nivîskar, bûyerê çawa dide têgihandin?
3-Li gor mijarê, hûn Zozanê weke kesayetek çawa dibînin?

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

We di mijara derbazbûyî de dîtibû ku tîpa mezin ka li kûderê tê bikaranîn, li jêr hûnê berdewamiya wê bibînin.

**Q) Navên welat, herêm, bajar, navçe, gund, tax, rê, şeqam, av û çiyan bi tîpên mezin tên destpê kirin. Ew jî evin:**

**Navên parzemînan:**

Asya, Ewrûpa, Emerîka û hwd. em di parzemîna Asya de dijîn.

**Navên welatan:**
Kurdistan
Gurcistan
Ermenîstan û hwd.
**Navên herêman:**
Rojhilata Navîn
Basûrê Rojhilat
Botan
Behdînan
**Navên bajaran:**
Amed
Mihabad
Hewlêr
Qamislo
**Navên navçeyan:**
Qoser
Şarezor
Amûdê
Amediyê
**Navên gundan:**
Mijîn
Dîkê
Girsor

**Navên taxan:**
Taxa Cudî
Taxa Xançepek
Taxa Enteriyê
**Navên şeqaman:**
Şeqama Musa Anter
Şeqama Misêbînê
**Navên robaran**:
Robarê Dîcle
Robarê Firat
Robarê Hîzil
Robarê Mûnzûr
Robarê Çekçekok
**Navên çiyayan:**
Çiyayê Cudî
Çiyayê Qendîl
Çiyayê Kurmênç
Çiyayê Hewreman

## CÛR Û AWÊN

We di mijarên borî de bîranîn dîtibû û têgihiştibûn ku ji wan nivîsînên tişta bi serê nivîskarekî hatî yan jî nivîskar bixwe bûyî bînerê bûyerê, radigihînê re **bîranîn** tê gotin.

## RÊZIMAN

**3- Hevok li gor wateya xwe**

**Hevok li gor wateya xwe dibin sê beş:**

**a-** Hevoka erênî
**b-** Hevoka nerênî
**c-** Hevoka pirsyarî

**a- Hevoka erênî:**

*Dema kar, pêkanîna karekî bûyî, yan dê bibe, radigihîne yan saloxdayîna tiştekî bi erênî radigihîne, jê re dibêjin **hevoka erênî.***

**Mînak:**

Zozanê Kele Şînê li herêma Xinêre ye.
Berf bi tûndî û dijwarî diherike.
Heval di nav serma zivistanê de dixebitin.

**b- Hevoka nerênî**

*Hevokên pêknehatina karekî yan rewşekî didin diyarkirin jê re **hevokên nerênî** tên gotin.*

**Mînak:**

Îro em naçîn geştê.
Zozan neziviri.
Îsal hewa nehênik e.
Kurd bi hev re nabin alîkar.
Bindestî bêwate ye.

**TÊBÎNÎ:**

Bi pêvekirina, pêvekên **ne, na, bê** li pêşiya kar yan saloxê, hevok ji rewşa erênî, derbazî nerênî dibe.

**c- Hevokên pirsyarî:**

Ew hevokên ku tê de ji bo naskirina rewşa karê tê kirin pirsekî dike, jê re **hevoka pirsyarî** tê gotin.

**Mînak:**

Rewşa hevalan çawa ye?

Tu çi dikî?

**TÊBÎNÎ:**

Li dawiya hevokên pirsyarî, her tim nîşana pirsê (**?**) tê danîn.

Hevokên pirsyarî erênî yan jî nerênî jî be, bandorê li rewşa wan ya pirsyarî nake.

**d- Hevoka baneşanî:**

Ew hevokên ku ji bo hest, tirs, qehir û xweşiyê, balê dikişînin li ser xwe, weke hevokên baneşanî tên bikaranîn û li dawiya wan hêmaya baneşanê (**!**) tê danîn.

**Mînak:**

Ew çi rojbûn! (hestiyarî)

Ev çi marek mezin e! (tirs)

Bi koçberiyê, em belangaz bûn! (qehir)

Çiyayê Cûdî wek buhiştê ye! (xweşiyê)

**HÎNDARÎ**

**1**-Hûn jî, du hevokên baneşanî binivîsin û bi kîjan hestan hatiye nivîsîn diyar bikin.

**2**-Bîranînek dilsoj weke vê peyda bikin û ji hevalên xwe re bêjin.

**2**-Destnivîsa li jêr li lênûsa xwe binivîsin.

# XWENDIN RONAHIYA JIYANÊYE!



# QAZÎ MIHEMED



Bi navê Xudayê Dilovanê Mîhrîban;

**Gelê Kurd! Xwîşk** û **birayên min yên xoşewîst!**

**Birayên ku malên we talan bûyî û hûn di bin zext û zorê de ne!** Ezê di dawiya demê jiyana xwe de, çend şîret û amojgarî pêşkêşî we bikim.

**Bo xatirê Xudê, êdî dijminahiya hev nekin!** Bibin yek, li hember dijminê zordar, li piyanbin û ticarî xwe nefiroşin wan! Dijmin hingê ji were dilovan e, dema ji we sûd bigire. Eger na, ti carî dilê wan bi we nasoje. Di her fersendê de ji bo berjewendiyên xwe yên qirêj, xwe digihînin we û bi we xwe digihînin armancên xwe. Dijminên gelê Kurd, gelek zalim û bêrehmin. Nîşana pîroz ya her netewî, yekitî û hevkarî ye. Ev nîşana pêşiyên we ne, ji bilî vê rewşê, ev gel tine dibe û di bin destê biyaniyan de dîl dimîne.

Ey gelê Kurd!

Ti tiştek yê we, ji yên gelên cîhanê kêmtir nîne. Belkî dilêrî û xîreta we ji yên gelek gelên ku gihiştine azadiya xwe zêdetir e. Ew jî niha ji penceyên dijmin rizgarbûne, rojekê wek we bûn. Lê ew bûn yek û gihiştin azadiya xwe. Ji vê û pê de, êdî ji destê wan tiştekî negirin û nebin dijminên hevdû. Hûn jî wek gelên cîhanê bigihin azadiya xwe. Dema hûn li hember hev dijminî û çavnebariyê nekin, hûnê bikaribin azadiya xwe bidest bêxin.

Gelî biraderan!

Êdî bi fend û fêlên dijmin nexapin. Dijminê Kurd ji kîjan nijad û neteweyê be, dîsa dijmin e. Bêrehim û bêwijdan e. Ticarî dilê wî bi Kurdan naşewite. Wan bi hev dide qirkirin û kuştin. Ti dijmin, ji dijminê Kurdan bêrehmtir û ji Xwedê netirstir nînin. Hemû bêdadî û nemirovahiyê li hember Kurdan rewa dibînin. Di kûrahiya dirokê de, li

hember Kurdan her tim bikîn û dijminî tevgeryaye û tevdigere. Ti carî li hember Kurdan durist nebûye. Çend soz û peyman dayî, hemû ji bo fen û xapandinê bûne. Ez wek birakî we yê biçûk, ji we re dibêjim:

"Bo xatirê Xudê, pişta hev bigirin, dema dijmin ji we re qencî bike, baş bizanin ku ew dê jarê bi we bide vexwarin. Ger hezar carî, bi Quranê sond jî bixwe dîsa jî wê we bixapîne."

Ez di dawiya jiyana xwe de, şîretan li we dikim. Bila bîra we de be ku ji bo bexteweriya we çi ji destê min hat, min texsîr nekir. Dîsa dibêm, bila hûn bi fêlên dijmin nexapîn. Ji ber ku bi Xudê, pêxember û bi roja heşrê nebawer in.

Di çavên wan de çend Kurd hene, eger çiqas musilman jî bin, tewanbar û sucdar in. Kuştin û tinekirina wan rewa ye. Me, ji bo xwe xenîmet dihesibînin. Ger çi soza me, ne ew bû ku ez biçim, we di nav pencên dijmin de bihêlim, lê min gelek caran ji we re got: “Dijminê fêlbaz gelek mezinên me, bi dek û dolaban dîl girtine û kuştine. Ji ber ku di qada şer de bi we nikarin, fend û fêlan bikartînin.”

Ez wan, baş nas dikim. Şah û rayedarên wî, bi şandina navber û mirovên xwe, peyman dan ku em nahêlin dilopek xwîna ti kesî birije û rencîde bibe. Lê hûn niha vê encamê dibînin.

Eger serokê eşîran xiyanet nekiribûna û xwe nefirotibana Hukumeta Şah, hûn û komara me rastî vê çarenûsê nedihatin. Niha gotina min ji we re ewe ku bila ciwanên we bixwînin. Ji ber ku ji bilî paş de mayîna perwedê, ti tiştê me Kurdan ji yên din kêmtir nîne. Di vê cihanê de çeka zanistê, ji hemû çekan bihatire.

Baş bizanin ku dema hûn yekreng û hînkirî bin, hûnê ciwan û li hember dijmin serkeftî bin. Divê hûn ji kuştina min, bira û kurmamê min netirsin. Dibe ku di vê riyê de, hêj gelek kes şehîd bibin, ta bigihîjin mirazên xwe. Bawer im ku piştî min jî gelek dê bêne kuştin.

Ez bawer im ku gelek kesên ji min xwendatir jî dê bikevin dava wan. Lê kuştina min ji we re bila bibe wane û îbret. Ji Xudê alîkarî bixwazin, dibe ku hûn ji min bipirsin û bêjin: “Tû ji bo çi serneketî.” Di bersiv de dibêjim: “Ez bi Xudê sond dixwim ku ez serketî me. Çi ji wê qenctir û hêjatire ku mirov di riya gelê xwe de ser, mal û canê xwe gorî bike? Min her tim dixwest, ku ez dema bimirim li hember Xudê, pêxember û gelê xwe rû spî bim. Ev mirin ji bo min serketin û pîrozî ye.

## PEYV

**Rewa:** Meşru
**Amojgarî:** Gotinên pêşiyan yê ji nifşê li pey xwe re dihêlin.
**Mîhrîban:** Rehîm

## PIRS

1-Banga nivîskar ji bo kê ye?
2-Çima ew qas ji neyaran bê bawer e?
3-Çima nivîskar bi şehîdbûna xwe bextewar dibe?

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**Nivîsîna daçekan**

Alavên daçekî, hem daçek hem jî paşdaçek bi peyvê ve nayêne zeliqandin. Cûda tên nivîsîn. Dikevin ser navan û rewşek daçekî ji navan re didin peydakirin.

**Mînak:**

**Di** daristanê **de** lawirên dirinde hene.
Em **bi** zarokan **re** dixebitin.
Ew **bi** cilan **ve** ket avê.
Lîlozê **ji** mamosten **re** tiştek negot.
Darvan **ji** Kobanê **ve** hat.
Ew **li** Cîhanê geriya.

## CÛR Û AWÊN

Cûre nivîsîna li jor axaftin **(nutuq)** e.

*Axaftin, ji cûre nivîsînên bi amadekarî li hember girseyekê naskirî tên amadekirin re* ***axaftin*** *tê gotin.*

Ev cûre nivîsîn ji bona li hember komek mirovan bên bikaranîn têne amadekirin.

## RÊZIMAN

**4- Hevok li gor cihê kar û saloxê**

**a- Hevoka bidestûr:**

*Hevokên ku kirek bikeve destpêkê û kar bikeve dawî, ji wan hevokan re* ***hevokên bidestûr*** *tên gotin.*

**Mînak:**

Wê name nivîsî.

Ew rêzdar e.

Ez dereng razam.

**TÊBÎNÎ:**

Gelek caran hevalkar dikeve destpêka hevokê û bandorê li ser vê zagonê nake. Ji ber ku hevalkar ne endamek sereke yê hevokê ye.

**Mînak:**

Îsal bi taybet berf jî nebarî.

Na, yekser jê hez nakim.

**b- Hevoka bêdestûr**

*Hevokên ku kar dikeve despêkê yan jî pêkir dikeve pêşiya kirekê jê re* ***hevokên bêdestûr*** *tê gotin.*

**Mînak:**

**Gotinên pêşiyan:** "**Saxdibe** cihê xenceran, **saxnabe** cihê xeberan."

**Helbest:** **Hat** gula min a ciwan
Di dest de ben û teşî
**Bandike,** bi dil û can
Çi heşiye û çi reşî

**HÎNDARÎ**

Hûn jî axaftinekî (Nutuq) peyda bikin û ji hevalên xwe re vebêjin.

## AXÎN JI BO KURDISTANÊ

Axîn ji dest dûrketinê,
Bilbilê nav baxê te me.

Ji boyî min tu Sîpanî,
Belê Siyamendê te me.

Tu çeka destê gerîla,
Armanc û nîşana te me.

Tu berxwedana zîndana,
Kemal û Mazlumê te me.

Sed carî dê ez şehîd bim,
Hîn jî ez deyndarê te me.

Van axînan ez helandim,
Berfim li Sîpanê te me.

Ji nû, dilan de xwîn rijand,
Hozan Cegerxwînê te me.

Tu Kerkuk û Mehabadî,
Çiya û sînorê te me.

Tu şoreşa PKK yî,
Ez karkerê nava te me.

Hezar axîn bi vî rengî,
Belê perîşanê te me.

Penaber im bi Rêber im,
Mêvanê Mexmûra te me.

Tu pirtûka netewî yî,
Ez pênûsa nava te me.

Xaka teyî zîv û zêr e,
Bixwîn bican, ez bo te me.

Jiyana bê te qet nabe,
Ez mirovê xaka te me.

Faşîst nikarin min derxin,
Ez Cûdiyê singa te me.

Ji dozê, min nagerînin,
Şahîn li esmanê te me.

Navnîşana berxwedanê,
Ez azadê rêça te me.

Xîyaneta wan nûkeran,
Yusuf û Yaqûbê te me.

Tu nexweşî li ber destan,
Ez nû hesireta te me.

Tu Belqîsa li Sebabet,
Nebî Suleymanê te me.

Yan jî tu Şirîn û Zînî,
Ez Mem û Ferhatê te me.

Bes e jîna bi wî rengî,
Ez bersiva pirsa te me.

## PEYV

**Perîşan:** Belengaz
**Zar:** Zimanê peyvînê
**Rêç:** Şop
**Nûker:** Kirê girtî, xwefiroş
**Hesiret:** Bêrîkirin

## PIRS

1-Axîna helbestvan ji bo çi ye?
2-Helbestvan berxwedana zîndana, girêdayî kê tîne ziman?
3-Armanca helbestvan ji pirtûka netewî çi ye?

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**Nivîsîna hinek peyv û pêvekan**

**a-**Peyvên nivîsîna wan yek; lê deng û wateya wan cûda:

Ev peyvên wiha, tenê li gor cih û cudahiya wan di xwendinê de çêdibe.

Di her peyvekê de, dengê tîpekê bandor dike.

**Ç**: **Çar** kes hatin mala me. (hişk)
**Çar**a serê jinan, delale. (nerm)
**K**: Ew mirovek pir **kal** e. **Kal**: Negihiştî (hişk)
Ew mirovê **kal** çû. **Kal**: Bi temen (nerm)
**P**: Ev pirtûk **par**a min e. (hişk)
**Par** ew mirov jîr bû. (nerm)
**R**: Min **pir** lez kir. (hişk)
Ez **pirê** çêdikim. (nerm)
**T**: Hevalê me **ta** girt. (hişk)
Me **ta** û dezî anîn. (nerm)

Dema temaşeyî helbesta jor dikin, dibînîn ku li piştî qafiyê peyvek hatiye dubarekirin. Di helbestê de peyv yan pêveka li piştî qafiyê tê dubarekirin re dibêjin **redîf**.

**Mînak:**

Navnîşana berxwedanê,
Ez azadê rêça te **me.**
Xîyaneta wan nûkeran,
Yusuf û Yaqûbê te **me**.

## RÊZIMAN

Hevokên jêr binçîne bikin, cûrên wan bêjin û hêmayên pêwîst bikarbînin.

Nermîn hat malê
Ma Lîloz hat mal
Dema Dîlan hatî kuştin Nêrgiz jî birîndarbû
Mar bi Sosinê ve veda

Valehiyên li jêr bi peyvên pêwîst dagirin.

Penaber im bi ...........................,
...................... Mexmûra te me.
Tû ......................... netewî yî,
Ez pênûsa .................... me.

# PÊHESÎNA DAYÎKÊ

Zozanê, pala xwe da dîwarê rûniştgehê lê dîwar cemidîbû. Lewra xwe li ser cihê xwe dirêj kir. Her dû destê xwe kirin bin serê xwe. Hişê wê di nav çiyan de bû gerok, çiya bi çiya digeriya, ji Cûdî dest pê kir, Gabar, Herekol, Sîpan û giha gupikê Agirî, gemiya xiyalê wê li Gola Wanê rawestiya û êdî şev bû, çavê wê qerimî û çav nema dikarî li hember xewê li berxwe bide.

"Keça min! Berxika dayîka xwe! Pêjnekê dikim. Tû nexweşî! Dilê min tê gûvaştin! Gewriya min zûhabûye, tayên jana xwe berdaye nav canê min. Dayê, ez qurban çima rengê te spiye?... Ez nabêjim karê xwe neke, na, riya xwe berdewam bike, bila tu Lîloza ber bêhna hevalên xwe bî û bila hemû ji te hezbikin. Lê min xwîşka te Jiyan dît, rewşa wê baş e. Tû dizanî Jiyanê di encama pêlêkirina mayînekê de lingê xwe winda kiriye û niha bi lingekê ye!"

Zozan, dibeşişe ji her d quncikên çavên wê rondik dihatin xwar. Çend caran gotina dayê ji nav lêvên wê derdiket. Çawa be vî dîmenî bala hevalek ya wê kişand û ew şiyar kir.

"Hevala Zozan, hevala Zozan! Rojbaş"

Çavê Zozanê di nav şilatiya rondikan de hêdî hêdî vebû. Çawa  çavê wê bi hevala wê Tekoşîna Mêrdînî ket, bi coş got:

"Rojbaş Hevala Tekoşîn"

"Rojbaş"

"Heval şiyar bûne!"

"Na, hêj razayîne."

"Ma demjimêr çende?"

"Pênç û nîve."

"Niha wan şiyar neke. Heval! Haya te ji wan hebe, carnan bênixûmandin dimînin."

Zozan, ma bi tenê, xewna wê dîsa li ber çavê wê zindî bû. Ji xwe re got:

“Dayê! Bawer bike, min tu ji bîr nekirî. Ma ezê çawa te ji bîr bikim? Ax tû yî! Evîn tû yî! Girêdan tû yî! Hezkirin û baweriya bi Rêber Apo tû yî! Diyê! Yê keda dayîkê ji bîr bikin, nikarin riya pîroz berdewam bikin. Nikarin bibin heval ji çiyayên welatê me re, ez bi şîrê te mezin bûm û ev rastî li ser dilê min nivîsandiye. Wêneyê Jiyanê jî pir caran tê li ber çavên min. Dayê! Hîs dikim.

Canê min sar e. Ez dibêjim qey qeşa Zagros xwe berdaye nava min. Dayê, niha hestiyên min ji ber wê dilerizin. Nizanim, ez keça teme, keça vê axê me, keça vî welatê dayîktî ji şaristaniyê re kirî me! Lê dîsa jî min sar e dayê... Min sar e, dixwazim tû min himbêz bikî!... Dixwazim tû min bi germahiya xwe germ bikî!”

Di demjimêr heftê de, Zozanê hevalê xwe şiyarkirin, da karê berf avêtinê bikin.

Gava dengê Zozanê çû wan, piraniya wan bi dengekê gotin: “Emê berfê bavêjin?”

“Erê, emê berfê bavêjin. Em ne avêjin, berf dê me dîl bigire û dûv re emê hêdî hêdî ber bimirinê ve herîn.”

Piştî taştê xwarin, mîna moriyan dest bi karê xwe kirin. Zozan, di nav wan de bû. Zozan, ji bo xwe gêwil didîtin. Pir ji Zozanê hezdikirin û pêve girêdayîbûn. Ji ber ku hevaltî, hezkirin, bi hev re alîkarbûyîn û tevlîbûna jiyanê di kesayeta wê de didîtin. Zozanê heya êvarê di nav hevalên xwe de berf tavêt û bêhnekê jî dûrî wan nediket. Lê bihatina êvarê re rawestiyan. Çend ji wan berê xwe dan cihê Televizyonê.

Zozanê dikir û nedikir, xew nedibû mêhvanê çavên wê, geh xwe diqulipand vî alî geh xwe diqulipand wî alî, carna her dû destê xwe li dora xwe dipêçand, ji hemû tevgerên wê xuya dikir ku sermayê ji mêj ve xwe li canê wê pêçaye. Serê xwe danî li ser balgîf û ji xwe re digot:

“Ev çi rewş e? Çima wisa dilerizim? Lê çi dibe bila bibe, ez keça Rojê me û pora min bi tîrêjên Rojê tê ramûsandin. Min ava jiyanê, ji kaniya jiyanê vexwariye. Ger şehîdbûnek bibe para min, fermo bila bibe, ez amademe, ji bo wê şehîdbûnê!... Aşût bi bêbextî, weke mar bi ser wan de hat û xwe gihand rûniştgehê. Rûniştgeh biçûk bû, her dû dîwarên paş û pêş bûn yek. Cendek bi dîwaran ve zeliqîn. Zozan û hevalên xwe li hember hemû hişkbûna xwezayê bûn kûlîlkên Lîloz ê!...

***Ev mijar berdewamiya mijara 'Aşûtê' ye.***

## PEYV

**Gupik:** Cihê herî bilind yê girekî
**Lîloz:** Navê kulîlkek sor ya biharê
**Demjimêr:** Katjimêr, (seet)
**Pêjin:** Deng

## PIRS

1-Çima hevalên Zozanê ew qas jê hezdikirin?
2-Gelo çima hevala Tekoşîn hevala Zozan ji xew şiyar kir?
3-Çima hevala Zozan nekarî razê?

## CÛR Û AWÊN

Parçe nivîsîna li jor we xwendî berdewama bîranîna Hevala Zozan û biserde hatina Aşûtê ye.

Ji ber wê ev jî parçeyek ya berdewamiya bîranînê ye.

## RÊZIMAN

Hevokên erênî û nerênî yê li jêr ji hev cûda bikin.
Azad gava din neçû dibistanê.
Hevala Zozan berf paqij kir.
Hevala Tekoşîn, hevala Zozan ji xew rakir.
Berfa Xinêre baweriya hevalan neşkandibû.

## HÎNDARÎ

**1-**Hûn jî nêrînên xwe li ser taybetmendiyên hevala Zozan binivîsin.

**2-**Destnivîsîna li jêr li lênûsa xwe binivîsînin.

"Dayê! Bawer bike, min tû ji bîr nekirî. Ma ezê çawa te ji bîr bikim? Ax tû yî! Evîn tû yî! Girêdan tû yî! Hezkirin û baweriya bi Rêber Apo tû yî! Diyê, yê keda dayîkê ji bîr bikin, nikarin riya pîroz berdewam bikin. Nikarin bibin heval ji çiyayên welatê me re, ez bi şîrê te mezin bûm û ev rastî li ser dilê min nivîsandiye.

# DAPÎRA BELENGAZ

Rojekê ji rojan dapîrek belengaz û hejar hebû, lê mixabin li cihê ku dapîr lê dijîya, av tinebû. Robar bi dirêjahiya çend demjimêran ji cihê wê dûr bû. Wê şevê dapîrê ji bo çûyîna avê biryar da bû. Roja paştir demê ji xew şiyarbû, berê xwe da avê.

Piştî çend demjimêran dapîr bibêhntengiyekê mezin, giha li ser robarê avê. Vê dapîrê destê xwe şûştin, ava xwe vexwar, bêhnek kurt kişand û cerikê xwe ji avê tejî kir û berê xwe da mal.

Di rê de dapîra belengaz li rastî tehtekê bilind hat, dapîr pir bêzar bûbû û wiha got:

- Tehtê-tehtê bi ser cerikê min de nekeve, heta ez diçim û têm.

- Baş e dapîrê ez bi ser cerikê te de nakevim, ma çi karê min heye, ez bi ser cerikê te de werim.

Lê mixabin tehtê dapîr xapand û heta dapîr çû karê xwe qedand û hat, temaşe kir, teht wê bi ser cerikê wê de hatiye û hûr kiriye. Ji ber vê sedemê dapîr gelek bêzar bûbû û tengezariyê xwe avête dilê pîrê û êrîşî li ser tehtê kir.

- Tehtê-tehtê, tû çima bi ser cerikê min de hatî?

Tehtê jî bersiva dapîrê bi kîn û kelejan da:

- Çima giya li ser min şîn dibe?

Vê carê dapîr neçar bû û berê xwe da giya û got:

- Giya-giya çima tu li ser tehtê şîn dibî?

Giya jî bi ziman dirêjiyekê, got:

- Narîna min, çima bizin min dixwin.

Vê carê dîsa dapîr neçarbû û berê xwe da, ba bizinê û got:

- Bizinê-bizinê tu çima giya dixwî?

Bizina hejar û belengaz ji ber bêzariyên hatiye serê wê wiha ji dapîrê re got:

- Çima gur min dixwe?

Vê carê dapîrê berê xwe da gur û got:

- Guro-guro tu çima bizinê dixwî?

- Ezê bixwim-bixwim ta bi serê duvê xwe re jî bidim. Ger tû jinî were holê, bêje te çima wiha kir, daku ez mafê te bidim te.

Lê belê dapîrê newêra ji ber bê hefsariya gur tiştekê bêje. Ya jêhatî patika xwe xwerand û berê xwe da mala xwe.



**PEYV**

**Bêhefsar:** Serberedayî
**Tengezar:** Bêzar

**PIRS**

1-Dema pîrê çû cem gur bi danûstandinek çawa re rû be rû ma?
2-Demê em  dibêjîn dapîr jinek çawa tê bîra we?

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Cihê tîpên mezin lê tên bikaranîn kîjanin? Vekin.

## CÛR Û AWÊN

We di mijarên borî de dîtibûn ku ew cûre nivîsînên rewş yan bûyerê bi awayê awarte didin têgihandin jê re **çîrok** tê gotin.

Mijara me li jor xwendî, ji ber ku cih daye bûyerên awarte yên ku ji aliyê civakê ve wek rast nayêne pejirandin çîrok e.

## RÊZIMAN

Ji bo her peyvekê ya li jêr, li gor cûrên hevokan, hevokekî saz bikin.

**Dapîr, gur, hûr kir, bizin, bixwim, şînebû**

## HÎNDARÎ

Hûn jî çîrokek wiha peyda bikin û di refê de ji hevalên xwe re vebêjin.

# DI CIVAKÊ DE ZAROK

Zarok heyînek herî birûmet ya civakî ye. Ji ber zarok, hem bingiha civakê hem jî diyarkerê pêşeroja civakê ye. Ji ber wê çendê parastin, pêşxistin û xwedî derketina li vê heyîna birûmet erkê her mirovî ye.

Bi taybet di nav hemû civakên mirovahiyê de zarok, weke heyînekî bêguneh û pîroz e. Weke kaxezê spî ye. Malbat û derdor çi bixwazin, dikarin li ser binivîsin.

Bêguman mafê zarokan yê pêşxistin û mezinkirinê zagonek gerdûnî ya mirovahiyê ye. Parastina zarok ya mergî û giyanî ji nexweşiyên cûr be cûr, erkek bingehîn yê civak, dayîk, bav û derdor e. Di heman demê de divê bi hînkariyek baş û têr bê perwerdekirin.

Divê zarok bi destûrên dilnizmî, rêzdarî, azad, hezkirin, û hevaltiyê werin mezinkirin. Li hemberî her beşên zordariyê bên parastin û bi nêrînek azad bên xwedîkirin; li gel van hest, xiyal û ramanek azad bidin rûnişkandin. Divê li pêşiya hestên wan nebin asteng, da ku bikaribin xwe bi awayekî azad bînin zimin.







## PEYV

**Dilnizm: kesê bi hejaran re hejar, bi biçûkan re biçûk**
**Zordarî:** Zilimkarî
**Giyan:** Jiyan
**Merg:** Rih, can

## PIRS

1-Erkê kê ye zarokan biparêzin?
2-Zarokên Kurdan çawa tên xwedîkirin?

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**Valahiyên li jêr dagirin**

Zarok heyînek … birûmet ya civakê ye. Ji ber zarok, hem bingiha … hem jî diyarkerê pêşeroja civakê ye. Ji ber wê çendê parastin, … û xwedî derketina li vê heyîna birûmet … her mirovî ye.

## CÛR Û AWÊN

Mijara li jor we xwendî, ji ber ku nivîskar di derbarê mijarek diyar de ramanê xwe aniye ziman, cûre nivîsînek ramanî ye.

## RÊZIMAN

**Cûrên hevokên li jêr bêjin.**
Zarokan gava din raperîn kirin.
Zarokên Kurdan ji bo mafê xwe tu têkoşînê nakin.
Zarokan mafê xwe bidest xistin?
Zarok heyînên herî ciwan in.

## SITÎ Û FERXÎ

Li min hatî meha yek e.
Xwedêyo barî pak e.
Ferxê Evdal xuliqandî bi dest û pêk e.
    Va li min hatî meha du ye
    Şukra min ji dana Xwedê ye.
    Ferxê Evdal xuliqandî ji behra avê ye.
Va li min hatî meha sê ye.
Şukra min ji dana Xwedê ye.
Ferxê Evdal xuliqandî bi dest û pê ye.
    Va li min hatî meha çar e.
    Şukra min ji dana Xwedê re.
    Ferxê Evdal xuliqandî esman û zehr e.
Va li min hatî meha pênca ye.
Şukra min ji dana Xweda ye.
Ferxê Evdal xuliqandî dest û pê ye.
    Va li min hatî meha şeş e.
    Navê Xwedê şîrîn û xweş e.
    Ferxê Evdal xuliqandî bi ser û leş e.
Va li min hatî meha heftê ye.
Şukra min ji dana Xwedê ye.
Ferxê Evdal ezmanê wî xuliqî nav zikê dê ye.
    Va li min hatî meha heştê ye.
    Şukra min ji dana Xwedê ye.
    Ferxê Evdal temambû nav zikê dê ye.
Va li min hatî meha nehê ye.
Şukra min ji dana Xwedê ye.
Ferxê Evdal va ketî ji danga dayê ye.

### PEYV

**Şukr:** Sipas
**Dang:** Mal zarok

## PIRS

1-Li gor destanê, zarok di meha duwan de, rewşek çawa di zikê dayîka xwe de distîne?

2-Destana 'Stî û Ferxî' lêkolîn bikin, destanê weke heyî ji hevalên xwe re bêjin.

## CÛR Û AWÊN

Mijara li jor kurte parçeyek ji destana 'Stî û Ferxî' ye.

## RÊZIMAN

***Mînakên dabeşkirina cûre hevokên li jêr lêkolîn bikin û hûn jî çend hevokên wiha binivîsin û dabeş bikin.***

**Wan gava din, gul a sor a bêhn xweş, neçinîn**.

**a-** Hevok li gor çêbûna xwe: **hêsanî. ye**

**b-** Hevok li gor rewşa xwe: **karî** ye.

**c-** Hevok li gor bi cihbûna kar û saloxê: **bidestûr e.**

**d-** Hevok li gor wateya xwe: **nerênî ye.**

**Kûlîlkên deştê ne ciwan in.**

a- Hevok li gor çêbûna xwe: **hêsanî ye.**

b- Hevok li gor rewşa xwe: **saloxî ye**.

c-Hevok li gor bi cihbûna kar û saloxê: **bidestûr e.**

d- Hevok li gor wateya û daxwaza xwe: **nerênî ye.**

**Te karê berê çawa çêkiribe, vî karî jî wisa bike.**

a- Hevok li gor çêbûna xwe: **hevgirtî ye.**

b- Hevok li gor rewşa xwe: **karî ye.**

c-Hevok li gor bi cihbûna kar û saloxê: **bidestûr e.**

d- Hevok li gor wateya û daxwaza xwe: e**rênî ye.**

**Dara helbestek ciwan nivîsî û xwend.**

a- Hevok li gor çêbûna xwe: **bi hev ve girêdayî ye.**

b- Hevok li gor rewşa xwe: **karî ye**.

c-Hevok li gor bi cihbûna kar û saloxê: **bidestûr** e.

d- Hevok li gor wateya û daxwaza xwe: e**rênî ye.**

# TESTA 3.

"Erê, emê berfê bavêjin. Em ne avêjin, berfa dê me dîl bigire û dûvre emê hêdî hêdî ber mirinê ve herin."

Piştî taştê xwarin, mîna moriyan dest bi karê xwe kirin. Zozan, di nav wan de bû. Zozan, ji bo xwe gêwil didîtin. Pir ji Zozanê hezdikirin û pêve girêdayîbûn. Ji ber ku hevaltî, hezkirin, bi hev re alîkarbûyîn û tevlîbûna jiyanê di kesayeta wê de didîtin. Zozanê heya êvarê di nav hevalên xwe de berf tavêt û bêhnekê jî li dûrî wan nediket. Lê bihatina êvarê re rawestiyan. Çend ji wan berê xwe dan cihê Televizyonê.

Zozanê dikir û nedikir, xew nedibû mêhvanê çavên wê, geh xwe diqulipand vî alî geh xwe diqulipand wî alî, carna her dû destê xwe li dora xwe dipêçan, ji hemû tevgerên wê xuya dikir ku sermayê ji mêj ve xwe li canê wê pêçaye. Serê xwe danî li ser balgîf û ji xwe re digot:
"Ev çi rewş e? Çima wisa dilerizim? Lê çi dibe bila bibe, ez keça Rojê me û pora min bi tîrêjên Rojê tê ramûsandin. Min ava jiyanê, ji kaniya jiyanê vexwariye. Ger şehîdbûnek bibe para min, fermo bila bibe, ez amademe, ji bo wê şehîdbûnê!... Aşût bi bêbextî, weke mar bi ser wan de hat û xwe gihand rûniştgehê. Rûniştgeh biçûkbû, her dû dîwarên paş û pêş bûn yek. Cendek bi dîwaran ve zeliqîn. Zozan û hevalên xwe li hember hemû hişkbûna xwezayê bûn kûlîlkên Lîloz ê!...

**Her sê pirsên destpêkê li gor mijara jor bersiv bidin.**

**1-Piştî hevalan taştê xwarin çawa karkirin?**

**a-** Mîna karkeran. **b-** Mîna herikîna avê.
**c-** Mîna Moriyan. **d-** Mîna Cotkaran.

**2- Çima xew nedibû mêhvanê çavên Zozanê?**

**a-** Ji ber ditirsiya.
**b-** Ji ber dayîka wê dihat bîra wê.
**c-** Ji ber nexweşbû
**d-** Ji ber mergê wê bi rewşê hesiyabû.

**3- Çima rûniştgeh hat tengkirin?**

**a-** Ji ber heval di hundir de bûn.
**b-** Ji ber kelûpelên hevalan pir bûn.
**c-** Ji ber pirbûna berfê, pêlavên hevalan jî di mal de bûn.
**d-** Ji ber Aşût bi ser de hatibû.

**4- Helbesta "Binive lolo" ji hûnandina kîjan helbestvanên jê re?**

**a-** Ehmedê Xanî. **b-** Feqê Teyran.
**c-** Pertew Begê Hekarî. **d-** Emîn Elî Bedirxan.

**5- Hêmaya "cotxal" li kûderê tê bikaranîn?**

**a-** Li dawiya hevokên nerênî.
**b-** Di bêhndanên kurt yên di navbera hevokê de.
**c-** Piştî jimarên rêzkirinê.
**d-** Pêşiya axaftina kesekî.

**6- Kîjan ji danasînên jêr, ji bo cûre nivîsînek şanoyî dibe?**

**a-** Ji wan nivîsîn û berhemên ku bûyeran pêşberî hev şîrove dikin û piranî li ser dikê tê lîstin.
**b-** Danasîna jiyana kesekî.
**c-** Xwendina gotarekî ji bo gel.
**d-** Axaftinek taybet di warê ramyarî de.

**7- "Sorgul a xwendekar rojnameyan belav dike." Kîjan endamê vê hevokê dibe pêkir?**

**a-** Xwendekar **b-** Rojnameyan **c-** Belav dike **d-** Sorgul

**8- Kîjan ji têgehên li jêr ji bo rêzkirina endamên serekê yên hevokê di zimanê Kurdî de rast e?**

**a-** Pêkir her tim li dawiya hevokê ye.
**b-** Kar li destpêka hevokê ye.
**c-** Kar carna dawî, carna li nav hevokê cih digire.
**d-** Pêkir her tim li nîva hevokê ye.

**9-Di vê hevoka "Gel, bi coşek mezin Newroz a xwe pîroz kir." de peyva "gel" kîjan endamên hevokê ye?**
**a-** Kirek **b-** Hevalkar **c-** Pêkir **d-** Kar

**10- Hevwateya peyva "serhildan" kîjan ji yên jêr e?**
**a-** Welatparêz **b-** Raperîn **c-** Zanista civakî **d-** Wêjevanî

**11-Dijwateya peyva "pirjimar" kîjan e?**
**a-** Gelek **b-** Hindik **c-** Pir **d-** Yekjimar

**12-Di vê hevoka "Gul a sor bişkivî." de Peyva "sor" çi ye û li gel raveberê xwe, dibe kîjan endamê hevokê?**
**a-** Hevalkar – Kirek **b-**Hevalnav – Kirek **c-** Nav –Pêkir **d-**Alav - Kar

**13- Ji wî cihê pişt dikê mirov xwe lê amade dikin re çi tê gotin?**
**a-** Kostûm **b-** Kulîs **c-** Dîksiyon **d-** Perde

**14- Kîjan peyvên li jêr tûrdayî (darişţî) ye?**
**a-** Hinart **b-** Sorgul **c-** Hatiye **d-** Guhdar

**15- Ji wan cûre nivîsînên cihê geryayî û dîtî, agahiyên komkirî, tiştê pêhesiyayî, radighînê re çi tê gotin.**
**a-** Ramanî **b-** Serpêhatî **c-** Geryaname **d-** Gotar

**16- Helbesta bi navê "Bêriya Botan" ya kîjan nivîskariye?**
**a-** Sebrî Botanî. **b-** Cegerxwîn. **c-** Hezîn Kurdî. **d-** Celadet Bedirxan.

**17-Ji van bire peyvên li jêr kîjan palvedariya navan e?**
**a-** Di mal de **b-** Egîd û Hogir **c-** Gol a Wanê **d-** Bejna bilind

**18- Leyla Qasim li kîjan parçeyê Kurdistanê de hatiye dinê û ji aliyê kîjan rejimê ve hatiye darvekirin?**

**a-** Li Bakur, ji aliyê rejima Turk ve.
**b-** Li Rojava, ji aliyê rejima Surî ve.
**c-** Li Başûrê, ji aliyê rejima Baas ve.
**d-** Li Rojhilat ji aliyê rejima Şahê Îranê ve.

**19- Hevok li gor çêbûna xwe dibin çend beş?**

**a-** 3 **b-** 4 **c-** 2 **d-** 5

**20- Ji van cihê li jêr tîpa mezin li kûderê nayê bikaranîn?**

**a-** Destpêka navê taybet.
**b-** Destpêka navê giştî.
**c-** Destpêka hevokê.
**d-** Destpêka navê rojnameyan.

**21- Dema kar pêkanîna karekî bûyî, yan wê bibe, radigihîne, yan salox, rewşa tiştekê radigihîne, dibe kîjan hevok?**

**a-** Hevoka pirsyarî. **b-** Hevoka saloxî.
**c-** Hevoka erênî. **d-** Hevoka nerênî.

**22- Kîjan ji van hevokên li jêr bê destûre?**

**a-** Hat gulek ciwan. **b-** Pir xwendekar hatin.
**c-** Mamoste name nivîsî. **d-**Nêrgizê çalekî pêkanî.


Derya Res
Gurcistan
Rusya
Ermenistan
Azerbeycan
Tirkiye
KURDISTAN
Nahcevan
Iran
Derya Sipi
Suriye
Lubnan
Iraq
Idir
Qers
Sewas
Erzerom
Bazid
Agri
Mako
Caldiran
Dersim
Cewlik
Eleziz
Mus
Tetwan
Wan
Qotur
Xoy
Elbistan
Meleti
Farqin
Bitlis
Basqale
Semsur
AMED
Batman
Sert
Gever
Meras
Besni
Siverek
Merdin
Sirnex
Clemerg
Zaxo
Urmiye
Entap
Riha
Veransehir
Nisebin
Qamislo
Dihok
Nexede
Mihabad
Hasakeh
Musil
Hewler
Bokan
Seqiz
Bicar
Kerkuk
Silemani
Merivan
Sine
Helebce
Qesri-Sirin
Kirmansah
Xaniqen
Ilam